



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 6 Hejmar - 28
Rezber - Kewçer 2009

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtor
Azad ZAL - Elîxan LORAN

Sererastkirin
Serwet DENİZ - Semra OZBEY

Mizanpaj û Berg
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wênayê Berga Pêşin
Serhad BAPİR

Şêwirmendê Hiqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane
Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32 / 4 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR

Tlf/ Faks
(0412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB
www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 25 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesab
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır
YTL: 8300 211 48 89
EURO: 8300 073 70 70
USD: 8300 073 70 84

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Hevpeyvîna bi Bavê Nazê re: **Serwet DENİZ** / 3
- Li ser xanî - **Şevger ÇIYA** / 11
- Wextên keserbar - **Bargiran ŞANAZ** / 16
- Evîna Peykertiraş Pygmalion - **Şivan AR** / 17
- Virhewle - **Meyman B. STÊRK** / 18
- Xewn - **Kendal MÎREK** / 24
- Çend gotin berev HEWARÎ'yê de - **Yunus EROGLU** / 26
- Ji jîyanê re çend gotin - **Yûsiv BIYANÎ** / 28
- Ax hestiyê min ax! - **Omer DILSOZ** / 29
- Li ser mijangê hinekirî - **Jan ZIRYAN** / 31
- Giliyek bo kulîlkan- **Îlhan Samî ÇOMAK** / 32
- Mêrga kurdî - **Dilşêr BÊWAR** / 33
- Di Mem û Zînê de şopên hunerên şewekarî - **Fewzî BÎLGE** / 34
- Dosye - **CEGERXWÎN** / 36
- Di şîira Cegerxwîn de sedema kurdînivîsînê - **Arjen ARÎ** / 37
- Best helbest û şoreş - **Mem BAWER** / 41
- Kurtejiyênîgariya Cegerxwîn - **Derwêşê XALIB** / 44
- Hevdîtina min û Cegerxwîn - **Têmûrê XELÎL** / 47
- Jin li ba Cegerxwîn - **Îkram BALEKANÎ** / 50
- Du halên helbesta Cegerxwîn - **Remezan ALAN** / 52
- Temaya helbestên Cegerxwîn - **Rezoyê OSÊ** / 56
- 'Ez dilgêşê can im' - **Feratê DENGİZÎ** / 60
- Cegerxwîn û Qanatê Kurdo - **Tosinê REŞÎD** / 62
- Romansiyet di helbesta Cegerxwîn de - **Xalis MISEWER** / 64
- Aramê Tigran: 'Muzîk giyanê min e' - **Azad ZAL** / 67
- Çend name ji Milenayê re - **Franz KAFKA** / 69
- Xewzê - **Elîxan LORAN** / 71
- Pêlpelûk - **Racêr Dîn KAYZÊR** / 72
- Mirina dayikê - **Elî DEŞTÎ** / 73
- Şerbeta ji êgir - **Berken BEREH** / 76
- Li şiveriyên çiyayekî - **Arjen ARÎ** / 77
- Du helbest - **Çiya MAZÎ** / 78
- Mirêk - **Sylvia PLATH** / 79
- Xêz - **Ahmet BÎLGE** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji edîtor

Subcomandante (alîkarê fermanîdar) Marcosê ku berdevkê Artêşa Rizgariya Neteweyî ya Zapatistayan e dibêje ku “Me biryar wergirt ku em rûyê xwe binixumînin, ji ber ku berê kesî em nedidîtin. Bi awayekî paradoksîk piştî ku me rûyê xwe nixumand wan em ditin û em berceste bûn.”

Ê me em kurd jî, ji xas û aman heta mêrxas û xulaman em bi ber çavên “hinek”an neketin, ên ku em li ber çavên wan ketin jî em ji bo wan çavên elem û kelem bûn. Hinek Çavreşên me fehm kirin ku kurd jî bo ku berceste bibin divê mobilîze bibin da ku ava golên kurdan zû genî nebin û bi vê destmijê dan nav mijê, rûyê xwe bi “berxwedan jiyan e” re nixumandin. Îro bi navê “açilim”ê (gavavêtinê) li me kurdan dinihêrin û hêviya me jî Xwedayê şev û rojê heye ku ev “açilim”a wan nebe “çalim”. Wekî me got vêga tenê li me dinihêrin lê dê rojekê me bibînin jî!

Mohandas Karamçand Gandiyê ku ji bo serî li hemberî baca xwê ya ku Brîtanyayê ji Hindîstanê distend rake di sala 1930’yî de pêşengiya meşa xwê kir û piştî meşa 400 kîlometreyan kir ku êdî welatê wî bacê nede Brîtanyayê, dibêje ku “riya aştiyê tune ye, ji ber ku aşti bixwe rê ye”. Îro roj bila li ser navê “gavavêtin”an jî xwe re li riyên teng û asê û şiveriyên negerin. Riya dilsozbûn û jidilbûnê têra xwe fireh û eyan û beyan e, tenê ev e ku kumê xwe derxin deynin ber xwe û li xwe mikur werin. Heta ku ew bibêjin divê serê keçel di bin kum de be dê ev gavavêtin nikaribe bo bedewî û aşbûn û aramiyê ke-virekî jî deyne ser ke-virekî.

Her çiqas em kovareke wêjeyî û çandî û hunerî jî bin di heman katê de em wijdanê ziman û gelê xwe ne jî. Ji ber vê yekê jî me bi gotinên “polîtîk” dest pê kir. Îro roj Kovara W û romana Erebe Şemo ya ku 75 sal beriya niha hatiye nivîsîn û gelek berhemên bi kurdî jî lijnaya girtîgehên tîpa Dyê nikarin derbas bibin, Mamoste Medya jî ber ku li mala xwe zarokên taxa xwe hînî kurdî dike di der barê wê de lêpirsîn tê destpêkirin, karkerên kurd ên ku Marcos jî bo wan di sala 1990’î de di daxuyaneke xwe de dibêje “ez li behra reş karkerekî fîndiqan ê kurd im” jî ber ku bi kurdî distrên rastî êrîşan tên, sebr û arama me, roniya çavên kurdan hunermend Aram Tigran ligel ku di wesiyeta xwe de gotiye “min li Amedê veşêrin” jî daxwaza wî ya dawîn jî ber burokrasiya “açil-imciyan” pêk nehat.

Tiştên baş jî diqewimin di nav van xirûcîran de. Va ye Kovara W kete 6 saliya xwe. 28 hejmarên qut û gilower diyarî pirtûkxaneya kurdî kir, bi dehan pêûsên ciwan û bi sedan xwendevan li wêjeya kurdî zêde kir. Ji îro pê ve jî Kovara W dê her û her guh bide dengê wêje û hunerê û ligel vê yekê barê zemînên avakirin û kemilandina wêjeya kurdî ya ku tê dîlan jî deyne ser milên xwe.

Me di vê hejmarê de dosyeyek li ser Cegerxwîn amade kir. Helbet hemû aliyên Cegerxwîn ên wekî evîndarî, gulperestî, pêşverûtî, hozanî, sosyalistî û neteweperwerî bi dosyeyeke kovaran nikare bê analîzkirin. Lê em dixwazin qet nebe were rojevê û tevdanek çêbibe.

Mijara dosyeya me ya Sermawez-Berfanbarê jî “Feqiyê Teyran” e em ji niha ve li benda nivîsên li ser Feqiyê Teyran in.

Heta hejmareke nû bimînin di xweşiyê de

Govenda li ber mirinê

Hevpeyvîn: Serwet DENÎZ

Ji ber rojeva polîtîk hinek nakokiyên me yên civakî zêde nayên nîqaşkirin. Ji van nakokiyan hinek jê ev çend nifş in tîn jiyîn, êdî bûne perçeyek ji derûniya me ya civakî.



Wek tîkiliya kurdên welêt û yên li derveyî welêt. Ji ber ku di şert û mercên cihê de dijîn, derûniya wan bi awayekî cihê teşe gşrtiye. Der barê kurd û kurdewariyê de xwedî heman hestan in lê dema ku ji bo xebatê tîn gel hev ev cihê bi awayekî zelal dertê holê. Bavê Nazê di çîroka xwe ya bi navê "Govenda Li Ber Mirinê" de ev rewş pir xweş daye xuyakirin. Gava ku me bihîst Bavê Nazê hatiye Amedê me xwest em vê pirsgirêkê pê re biaxivin û me hevpeyvînek çêkir. Em vê hevpeyvînê li jêr ji we re pêşkêş dikin lê derûniya kurdan a civakî divê bi awayekî dorfireh bê nîqaşkirin.

W: Mamoste tu bi xêr hatî. Em dixwazin der heqê "Govenda Li Ber Mirinê" de hevpeyvînekê bi te re çêkin. Pêşiyê ez dixwazim "govenda li ber mirinê" bipirsim. Ev gotin an jî biwêj di çanda me de heye û di jiyana rojane de jî tê bikaranîn. Ev bingeha xwe ji ku, ji rewşeke çawa digire. Te çima wek nav li berhema xwe kir?

Bavê Nazê: Di berhemên edebî de tiştê herî dijwar navlêkirina berhemê ye. Îcar bi çi şeweyî navê berhemê tê danîn? Berî her tiştî navê berhemê destnîşanek e ji bo naveroka wê lê ne ravekirin e. Divê ji aliyê xwendevan ve balkêşiyê xwe hebe. Pêwîst e ji bo wê hizra nehênî ya hundirê berhemê destnîşanek be. Ev hemû pêk ve dihêlin ku nivîskar têkeve geryanê. Gava ku navekî munasîb ji vê berhemê re bibîne wê çaxê cihê serkeftinê ye. Lê ku nav ne di cihê xwe de be, dê gava berhemê ya pêşîn tîkçûyî be. Çawa ku dayik û bav dikevin geryanê ji bo ku navekî li zarokên xwe bikin, çi berhemên ku hene zarokên nivîskar in. Her tim dixwaze ku ew berhem bi navekî serkeftî be.

Ne derew be nivîskarekî sovyetê yê berê gava ku "Geryana Li Ser Êşê" nivîsand wî got "tiştê herî hêsan ma li paş min, ma tiştê herî dijwar ew jî navê berhemê ye". Navê wê kir "Geryana Li Ser Êşê"

"Govenda li ber mirinê", bêguman kesê ku vê çîrokê bixwîne wê bibîne du alî di meseleyê de hene. Bi rastî qehremanê min beriya ku xwe bikuje dikeve vê govendê. Ev rastiyek e. Em dikarin bibêjin ev bûye destnîşanek ji bo naveroka çîrokê. Sedî sed ji bo naverokê ye. Di eynî katê de aya vî qehremanî ji bo çi biryar stendiye ku xwe bikuje û bikeve vê govendê? Ev ji riyek ji riyên protestoyê yên li hemberî xwe û li hemberî yên hawîrdora xwe ye. Her wiha em dikarin bibêjin dema beriya xwekuştina wî baranhatina li serê çiyê, di nav pêşmergeyan de ew govenda ku wî kiriye, rengê ji wan rengan bû ku bi gotinê nedihat ziman. Ango ket wê baweriyê ku gotina wî bêmefa ye. Ji ber wê çendê xwest bi wê govenda xwe tiştêkî bide xuyakirin. Bila xwendevan hizra xwe bikin. Van tiştan hemûyan bi hev re hiştin ku ez vî navî li çîroka xwe bikim. Tu dikarî bibêji

di pirtûkê de sêzdeh çîrok hene, te çima wek navê pirtûkê ev çîrok hîlbijart? Ku te bala xwe dabe di kurteçîrokên din jî her mirin heye. Şêweyekî mirinê, govendê nediyar tê de heye. Min xwest ev nav bibe navê hemû çîrokan ango berhemê. Îcar divê ez jî te bipirsim aya ev nav jî bo berhemê serkeftî ye yan na?

W: Bi ya min serkeftî ye, çîrokê mayinde û nemir dike.

Bavê Nazê: Ku çîrokê nemir dike wisa be ev xerabî ye. Dikarî bibêjî beramberî çîrokên din bêtir xweştir be, bêtir baştir be. Ez ne di wê hizrê de me ku nemir dike.

W: Ez tişteki din jî bibêjim, bi min "Govenda li ber mirinê" derûniya kurdan, dîroka kurdan an jî pêvajoyên ku jiyane, rewşa ku niha tê de ne, van tiştan tevan jî min re dibêje.

Bavê Nazê: Jixwe jî wan mezinahiyan yek ew e ku her xwendevan li gora xwe berhemê rave bike, xwe tê de bibîne yan jî helwestekê bistîne. Dema nivîskar berhema xwe dinivîse gotina xwe dibêje. Lê gotina dawîn ne ya wî ye, ya xwendevan e. Ji ber vê yekê jî piştî ku min gotina xwe got, gotin a xwendevan e, piştî ku xwendevan berhem xwend ew ê hukmê xwe bide. Carna xwendevan li ser berhemê tiştên wisa dibêje ku qet di hizra nivîskar de derbas nabe. Yanî hizra nivîskar tişteki din bûye, xwendevan tişteki din dibîne. Ev jî hêzekê dide berhemê, her wiha jî kûrbûnekê dide wateya wê.

W: "Govend" û "mirin" du diyardeyên dijberî hev in. Kenê beriya girî jî heye di çanda me de. Ev derûniya me (derûniya kurdan a civakî) derûniyeke çawa ye ku van tiştên ev qas dijberî hev diafirîne, tîne ba hev?

Bavê Nazê: Ez ê di sa vegirim ser pirsê xwendevan berhemê çawa dibîne. Tu dikarî hizreke wiha bi derûniya civakê ve girêbidî. Ew mafê te ye. Lê ev tişt heye, di edebê jê re dibêjin gotinên antagonî. Gava nivîskar van gotinên dijber bi kar tîne di deqên edebî de du tişt

xuya dikin. Ji aliyekî ve kûrbûnekê dide wateya berhemê, ji aliyekî din ve dihêlin ku ew deqa edebî ciwaniya xwe hebe. Wek nimûne çend nivîskarên sovyetê jî hebûn navê berhema xwe datanîn "Berfa Germ", "Termê Zindî" Di edebiyatê de rûniştinek heye ku nivîskar pirî caran berê xwe dide van gotinên dijberî hev. Mînak govend jî bo şahiyê ye, dijberî mirinê ye. Gava em dibêjin "govenda li ber mirinê" wateyeke din digire. Ev jî bo bi awayekî ciwan bikaranîna ziman riyek e, kûrbûnê dide wateyê.

W: Ji bo ravekirina wê rewşê te çima gîska pezkoviyê hîlbijart, ne tişteki din? Dibe ku jî bo te zêde watedar nebe lê ez pêdiviyê pê dibînim ku bipirsim.

Bavê Nazê: Pezkovî yek jî wan lawiran e ku her tim di sirûştê kurdan de hebûye û hîna jî heye. Wek Siyabend û Xecê, pezkovî qedera wan diyar dike. Pezkovî di civaka kurd de xwediyê roleke wiha ye. Ev aliyek e. Aliyê din jî ew mîtolojiya ku tê gotin di wê derê de bikar hatiye. Ji bo çi di pêşeka çîrokê de min gîska pezkoviyê bi kar aniyê? Beriya her tiştî têkiliyek di navbera jiyana heywan û mirovên ku li çiyê dijîn de heye. Keça çiyayî azad e di hundirê xwe de. Bi qeydên civakî hatiye girêdan. Ez dixwazim beriya her tiştî ew bêbextiya ku li hemberî van giyanên azad çêdibe ne bi derewan dema ku ew bîstika herî dawîn ku xweşiyê bistîne, dîtina stêrka gelawêjê jî bo ku pezkovî gonên xwe bistîne, xweşhaliyek pê re çêbibe û bigihîje nêriyê pezkovî, dergistiyê xwe bibîne di wê bîstikê de tê kuştin. Ew-



rûpiyo gava vê şeweyê dibîne, -kalemêrê nê-çîrvan wê çîrokê jê re dibêje – dibêje “Ev bêbextî ye” çawa ev bêbextî lê tê kirin. Bistika herî lazim e jiyana dest pê bibe behsa kuştinê dike. Ev çîroka pezkoviyê a di hundirê vê çîrokê de hemû ji bo rista pêşeka çîrokê ye. Çi ku kurteçîroka ku heye divê pêşekeke xwe hebe. Ew gotina pêşîn danasînek e, pêşekê e ku derbasî hundirê naverokê dibe. Min xwest bi jiyana heywanan an jî bi pezkoviyê derbasî naveroka kurteçîroka xwe bibim ku ew jî beriya her tiştî girêdayî bêbextiyê ye. Yan jî ew cihê ku divê bibe cihê ewlehî û baweriyê dibe cihê kuştinê. Em vê yekê jî bi taybetî di qehreman de, qehremanê ku xwe kuştîye de dibînin.

W: Ewrûpiyo kî ye? Kesayetîya wî kesayetîyeke çawa ye?

Bavê Nazê: Te di destpêkê de got, pîrsa derketina derve. Ew kesên me yên ku derdiketin derve, demekê pêşiyê dihatin nav pêşmergeyan -bi taybetî di salên heştayî de- û jî wê derê jî derbasî Ewrûpayê dibûn. Wan kesan hîzîr nedikir û nedigotin çawa ev birayên me dê şer bikin û ez ê jî herim Ewrûpayê li rihetîya xwe binihêrim. Bi riya wan derdiketin Sûriyeyê, Îranê, Tirkîyeyê û welatên Ewrûpayê. Nedigot ev welatê min e, ez jî wekî van şervanan -çi pêşmerge û çi jî gerîla- ji bo welatê xwe bixebitim û derdiket derve. Ji ber vê çendê jî ew li ber çavê şervanên kurd wek kesên ku tenê li berjewendiyên xwe difikirin bûn. Tişteki jî bo welatê xwe nakin. Bi awayekî giştî nêrîneke wiha rûniştî hebû. Ji ber vê yekê jî ew dibû cihê pêkeniyê. Ewrûpiyo leqebek e û cihê pêkenîyê ye. Her kurd çendî li Ewrûpayê bimîne li wê derê çêbibe jî her nabe ewrûpî, ne bi rabûna xwe, ne bi rûniştina xwe û ne bi tevdira xwe nabe. Ev meseleya leqeba Ewrûpiyo ku navê qehreman bi xwe Ferhad e, wî navî lê dike ku cihê pêkenîyê ye. Yanî qerfên xwe pê dîkin. Lê rastiyeke din heye ku hêzên, şervanên kurd jî bîr dîkin. Gelek kes hebûn ku derketibûn Ewrûpayê, ne ku reviyabûn ji ber xebata mîlet, carna neçar dibûn, rîyên din nedidîtin û diçûn. Carna jî ji bo xwendinê diçûn, carna jî ber ku dê û bavên wan li wê derê bûn ew jî mecbûr diman diçû. Yanî her kesê ku li Ewrûpayê bû navê wî/ê “revok” bû. Lê ev qehremanê

min ne revok bû. Ji ber vê çendê jî gava ku tê welat bi hêviya ku careke din venegere, ji ber vê yekê jî dibêje “kesê ku bê welatê xwe ne mêvanê welatê xwe ye, kesê welatê xwe ye”. Ji ber vê çendê jî pasaporta xwe diçirîne. Ji bo xatirê ku careke din venegere.

W: Têgiha “Ewrûpa” di hişê kurdan de cihekî çawa digire, li gor kurdan “Ewrûpa” çi ye?

Bavê Nazê: Kesên ku li welat rûniştî ne ew jî bo wan riya xelasê ye. Li cem gencên me Ewrûpa xweşali ye. Welatê xweşik, kêçikên xweşik, kêfxweşî, kardîtin... Bi gotîneke din bextewariya xwe di Ewrûpayê de dibînin. Ji ber vê çendê jî gelek caran tu dibînî ji bo ku biçin Ewrûpayê xwe dixin gelek talûkeyan. Yan jî pereyên mezin didin û derdikevin. Di warê din de em bala xwe bidinê bi her awayî dijminê kurdan jî xwestine ku gencên kurdan herin Ewrûpayê. Ji bo ku welat vala bikin. Kî dikare here Ewrûpayê? Ew kesê ku li ser xwe be, bawerîya wan bi wan hebe. Mirovekî hejar û feqîr nikare biçe Ewrûpayê. Roja îro li gor hîzra min derketina Ewrûpayê xisareke mezin e ji bo welat. Divê bi awayekî demokratîk em bidin qebûlkirin ku Ewrûpa ne ew bihuşt e ku gencên me lê digerin. Ev ne rast e. Meseleya lotoyê ye, dibe ku mirovek here wê derê jî xwe re rîyeke baş bibîne. Lê mirov jî heye heta bi hetayê paqîjiya tiwaletan, paqîjiya malan dike. Yanî dereceya wî û hemwelatîyên wî welatî ne weke hev e.

W: “Ewrûpiyo” êdî gelek in. Bi milyonan kurd li Ewrûpayê dijîn, ku nêrîn û psîkolojî ev be ev ji bo civaka kurd ne xetere ye?

Bavê Nazê: Ne min digot derketina îro bi hejmareke pîr, bêguman xisareke mezin, talûkeyek e. Mixabin bi deh hezaran genc li Başûr navê xwe dinivîsin li ba koma mîletan da ku derkevin derve. Û dixwazin derkevin. Ji bo parçeyên din nabêjim, desthilatdar wan tengav dîkin neçar dimînin ku derkevin. Rastiyeke din mumkin e ku min destnîşan nekiribe, temaşe bikin di wan qonaxên ku her tişt li Kurdistanê qedexe bû de; çanda kurd, rojnamevaniya kurd, nivîskariya kurd hemû jî derveyî welat dest pê kiriye. Lewre rê vebûbû ku li wê derê xebateke çandî yan jî xebateke din

bê kirin. Bêguman ew penaberên kurd ku îro li derveyî welat li Ewrûpayê ne, ji welatên xwe dûr in, bes beşek ji wan bi xurtî roleke mezin listine ji bo ziman û edebiyata kurdî. Her wisa jî ji bo hişyarbûna miletê xwe. Îro çî televizyon û rojnameyên ku li Ewrûpayê hene rola xwe listine. Rola wan jî hişyarkirina miletê wan e. Lê ew beşeke hindik in. Ku bi politikayeke rast mirov nêz bibe çî di aliyê giyanî de û çî jî di aliyê aborî de dê bikaribin roleke mezin bilîzin. Wê bi-hêlin gavên mezin ên pêşketinê li welat bîn avêtin. Ji ber wê çendê jî em îro nikarin bi çavekî neyînî li wan kurdên Ewrûpayê binihêrin. Nêzikahî divê bi vî awayî be; yên ku derneketine em nehêlin derên û yên ku derketine jî em nehêlin asimîle bibin. Wek mînak, siyasatmedarekî kurd ku derketiye Ewrûpayê dê her siyaseta xwe bimeşîne. Yanî heta qonaxekê dê kurd bimîne lê wê zarokên wî kurd nemînin. Tê bîra min di sala 1985'an de ez li Swêdê bûm, deh hezar kurd li wir dijiyan. Îro hejmara kurdan li Swêdê sed û bist hezar e. Sed hezar zarok dikarin bi hêsanî asimîle bibin û bêtir xwe swêdî bibînin û kurd nebînin. Ji ber vê yekê jî divê hêzên me yên siyasî bi politikayeke rast nêzî kurdên ku derketine Ewrûpayê bibin da ku em wan wînda nekin. Dijmin dixwaze me di hundirê welat de asimîle bike, wînda bike lê li Ewrûpayê kes nabêje dev ji neteweya xwe berdin. Berevajî wê dixwazin ku tu bi zimanê xwe bixwînî. Lê rabûn û rûniştin, dab û nerîtên Ewrûpayê hene tu bixwazî nexwazî wê bandora xwe li ser mirov bikin. Wê bihêle ku mirov fikr û hizrên xwe li gor civaka ku lê dijî biguhe-rîne. Ne bi derewan e ku helwest û nêrîn li gor cîgehan e. Îro cîgehê te li serê çiya be dê nêrîn û helwesta te jî li wê gorê be. Tu li Ewrûpayê bijî dê helwest û nêrîna te li gora cihê tu lê dijî be. Ji ber wê yekê jî divê em bi cidî nêzî vê pîrsê bibin. Û em lez nekin ku biryareke wiha bigirin; her kesê/a ku li Ewrûpayê ye xayîn e, yan jî welatê xwe firotine, yan jî revok in.

W: Na ne bi wî awayî lê tiştên ku tên dîtîn hene. Carna yên ku ji Ewrûpayê tên bi çavê ewrûpiyekî li civaka xwe mêze dikin. Qure ne, pozbilind in. Ku wiha be em ê çawa têkiliyên rast bi hev re dey-

nin? Dibe ku nivîskarekî/e baş be, dibe ku rewşenbîrekî/e baş be, piştî ku nêrîna wî/ê li kurdên welêt ev be gelo ji hêla derûniyê ve em ê bikaribin têkiliyeke baş bi hev re deynin? Em ê zêdetir ji hev qut nebin? Wê dijberî di navbera me de dernekeve? Yan jî bertekên wekî bertekên Ehmed dê zêdetir nebin?

Bavê Nazê: Ez vêya bibêjim, ev pîrs dualî ye. Gunehên em ên ku li welat in jî hene û gunehên ên ku vegeriyane jî hene. Dîfinbilindî berî her tiştî jî çî tê? Ji nezaniyê tê. Kesê/a ku zana be tu carî dîfinbilindiyê nake. Mesela îro tu li Diyarbekirê yî, lê tu li gundekî Kurdistanê bûyayî û di van salên te de yek ji Diyarbekirê bihata gund wê wek kesekî ku li gund bûya? Na. Bes ew kesê ku ji Ewrûpayê tê, rabûn û rûniştina wî, axaftina wî, geryana wî ne ji ber dîfinbilindiya xwe wisa dike. Ji ber ku jiyana wî wisa ye, wisa tevdiqere. Mîmkun e em hizra vê yekê dikin lê ew nake. Û dibe ku carna wisa jî bibe, wek hinek xortên ku dixwazin bala keçikan bikişînin. Divê em bi du alîyan li vê meseleyê binihêrin. Carna jî em gunehkar in. Tiştêkî xwezayî jî ez dibînim bi taybetî gava ku gênc be yan jî nezan be ev diyardeya dîfinbilindiyê dertê holê. Wek ku dibêjin gava simbilê genim vala be, serê xwe radike. Simbilê dagirtî her tim serê xwe datîne. Kesê/a ku dagirtî be bêguman mute-wazî ye jî. Serê vala jî wek simbilê vala ye. A wiha li ba dikeve.

W: Niha li Başûr çavdêriyên te, nêrî-nên te çêbûne. Yên ku ji Ewrûpayê vedigerin, (çi xwendevan, çi siyasatmedar, çi bazirgan û çî jî ji beşên civakê yên din) veger çiqas pêk hat, yên ku vegeriyan man an na? Dikaribûn têkiliyê bi civakê re deynin an na?

Bavê Nazê: Mixabin ez dikarim bibêjim ku yên heta îro vegeriyane rola ku dihat xwestin nelistine. Ev rastiyeke e. Rastiyeke din jî heye wek berê niha ku te got, dibêje ez her tim di nav şer de bûm, ez di dogehê de bûm tu jî ji xwe re li Ewrûpayê digeriya, tu a niha hatiyî ku bibî wezîrek an jî cihekî mezin ji xwe re bigirî, keçika herî xweşik ji xwe re bixwazî, qesr û qonaxan ji xwe re amade bikî. Tu bixwazî nexwazî çavnebariyên bi vî awayî li cem kesên din çêdibin. Ji

ber vê yekê jî rê li ber wan kesan tên girtin. Wek mînak hinek zanyar dixwazin bîn bibin alîkar, bi rastî jî zana ne lê dibêjin aha vana hatin dê cihên me ji me bistin. Rê li pêşiyê digirin, nahêlin ew tiştên ku pê re heye ji bo pêşketina civakê bi kar bîne. Çi bazirgan be çi mirovekî zanyar be, ne bi hêsanî dikare cihê xwe bigire da ku ji bo civakê xizmetê bike. Ev rastiyeke tahl e lê em bixwazin nexwazin ew kesên ku roja rojîn armanca wan ew bû ku xizmeta miletê xwe, welatê xwe bikin, dibînin ku mesele çî ye. Lez nakin û didin xuyakirin ku ew bi armanca pêşketina welatê xwe hatine. Ne bi armanceke din. Wek leşkerên nenas bêdeng xebata xwe dikin. Ji bo ku ew, ew tiştê ku li cem wan heye bidin welatê xwe û miletê xwe.

W. Rewşa Ehmedo? Di nav civaka me de gelek Ehmedo hene, ew bertekên Ehmedo çiqas di cih de ne?

Bavê Nazê: Carekê Ehmed Huseynî ji min re got “ew dawîya kurteçîrokê te ji ku aniye?”, tê bîra te dawîya çîrokê gava Ewrûpiyo xwe dîkuje, Ehmed dibêje “Ewrûpiyo her wek Ewrûpiyan kir, di şûna ku dijmin bîkuje de xwe kuşt”. Lê di eynî wextê de ji gava ku vedişêrin digirî, li gotinên xwe poşman dibe. Ew têdigihê ku der heqê wî mirovî de şaşitî kiriye. Ev mirov bi rastî hatibû ji bo ku xizmetê bike. Ji bo çi hatibû? Ji bo xizmeta millet û welatê xwe bike. Bi rastî gava ku dît şerê birakujiyê -çi di navbera Yekîtiya Nîştîmanperwerên Kurdistan û Partiya Demokrat a Kurdistanê de û çi jî di navbera PKK’ê û YNK’ê de- ev şerê birakujiyê kesê ku welathez be qebûl nake. Ne mimkun e ku di vir de alîgirî hebe. Şerê birakujiyê çiqas serkeftî be tu ew qas têkçûyî yî. Gava ku tu yekî beramberî xwe dîkuji, tu xwe dîkuji. Romanêke min heye navê wê “Dara pelweşiyayî ” ye. Di romanê de kurê jinikê tê kuştin jinik tê ser tirba kurê xwe jê re dibêje “ji wan re bibêje wan xwe kuşt”. Di şerê birakujiyê de tu kê dîkuji tu xwe dîkuji. Ji ber vê yekê jî ev rengek e ku Ewrûpiyo hatibû û rîyek ji xwe re nedidit û şerê birakujiyê qebûl nekir û protesto kir. Çi dibe bila bibe çi hincet hebin bila dinya jî xera bibe rojek ji rojan gerek hêzên me yên siyasî rê nedin wê yekê ku pêşmerge û ge-

rila yan jî pêşmerge xwe bi xwe, kî dibe bila bibe ne mumkin e şerê birakujiyê bê kirin. Ji bo çî di dirokê de wanî hatiye xuyakirin, dema ew tivinga ku li hemberî hev bê teqandin olana wê carna bi sed salan didome. Şerê birakujiyê di sala 1964'an de li Başûr dest pê kir û olana wê heta roja îro berde-wam e û bandora xwe jî heta demekê li par-çeyên din jî dike. Û ev olan li wê derê jî tê bihistin. Ji ber vê yekê jî ew kesên ku em bibêjin welathez e, hişyarbûneke xwe ya ne-teweyî, siyasî heye gerek tu carî beşdarî vê yekê nebe. Qehremanê min jî nikaribû rê li ber vê yekê bigirta û xwe kust.

W: Ez dixwazim peyva “birakuji”yê bipirsim. Ev peyv ji kîngê ve ketiye nav zimanê me, hişê ku ev têgih afirandiye, hişekî çawa ye?

Bavê Nazê: Ez ne zimanzan im lê li gor zanista etimolojiyê dikarim wiha bibêjim, her peyva heyî rengvedaneke ji diyardeyeke civakî ye. Ew diyarde heye an tune ye? Ew diyarde ku di wê civakê de tune be mumkin e ku di civakeke cîran de hebe û derbasî ferhengê bûbe. Miqabilî wê jî derbasî zimanê me. Şerê birakujiyê di nav Filistîniyan de hebû, di nav Rûsan de hebû li gelek welatan hebû. Gotina “birakuji”yê bixwe ji bo ku şerê birakujiyê pêk neyê hatiye afirandin. Yanî tu birayê xwe dikuji, ne tu dijminê xwe dikuji. Tevî ku gelek caran di nav me de şerê birakujiyê çêdibû jî, hêzên me yên siyasî digotin “na ev ne şerê birakujiyê ye ev kesên hanê yan ajan in yan jî nizanîm çi ne em civaka xwe ji wan rizgar dikin”. Bes çi dibe bila bibe dîrokê da xuyakirin ew şerê di navbera kurdan bixwe de çêbûye şerê birakujiyê ye. Û encamên wê her tim bandoreke neyînî çi li civakê û çi li tevgerê kiriye. Kiriye ku bawerî di navbera beşên civakê, çi siyasî çi jî çandî çênebe. Hemû jî encamên vî şerê birakujiyê ne.

**W: Şerê birakujiyê yan jî şerê navx-
weyî li gelek welatan çêbûye. Lê gelo
peyveke wek “birakuji”yê di zimanê wan
gelan de jî heye yan na?**

Bavê Nazê: Heye. Di rûsî de jê re *bira-tovlîso* tê gotin.

W: Pirsên min ên derbarê “Govenda li ber mirinê” de ev bûn. Di vê beşê de min xwest em qala têtikiliyên navbera beşên

civaka me û pirsgrêkên ku hene bikin. Pirsên min ev bûn. Ji bo vê beşê gotinên te yê wekî din hebin fermo bibêje. Ku tune bin ez dixwazim der heqê Erebe Şemo de çend pirsan bipirsim

Bavê Nazê: Her tim ez dibêjim aya kurteçirok divê bi kêmgotin û pirwate be. Ev va ye demek e em li ser vê çirokê diaxivin, bi qasî ku min fêhm kir di vê çirokê de pirwateyî heye. Vêya jî bala min kişand ser vê yekê ku te wateya çirokê baş fehm kiriye, tu têgihiştîyî. Heta qonaxekê te heqê wê daye ku ez hêvî dikim ku min jî heqê wê daye.

W: Di hejmara 15'emîn a Kovara Wyê de me dosyeyek li ser Erebe Şemo weşand. Hevpeyvîneke te bi Erebe Şemo re heye, te di sala 1972'yan de ev hevpeyvîn kiriye. Heta niha di gelek çavkaniyan de hatiye weşandin me jî di wê dosyeyê de cih dayê. Ez vêya bipirsim, gelo hevpeyvîn tenê ev qas e? We li ku derê hev dît û te jî bo çî ev hevpeyvîn çêkir?

Bavê Nazê: Erebe Şemo dawetî bajarê Lenîngradê kirin wek kesê ku beşdarî Şoreşa Oktobirê bûye. Ew kes û ciwan dianîn ba hev. Min jî di wê qonaxê de li bajarê Lenîngradê zanîngeh dixwend. Çend kurd li bajarê Lenîngradê hebûn di zanîngehê de. Me sê kesan biryar girt me got em ê Erebe Şemo bibînin. Me navê wî bihistibû lê me jî nêzîk ve nas nedikir. Me navê romana wî ya "Şivanê Kurd" bihistibû lê me nexwendibû jî. Ji me re hat gotin ku li cem rehmaiyê Kerîm Eyubî ye. Kerîm Eyubî jî yek ji wan xwendekaran bû ku di wextê Komara Mehabadê de di sala 1946'an de ji bo xwendinê şandibûn Sovyetê, lê piştî têkçûna Komara Mehabadê venegeriyabû welêt. Ew bi xwe jî mijûlî ziman û edebiyata kurdî bû û pîreka wî Zera Yûsiv jî pispora zimanê kurdî bû. Kerîm Eyubî diwana Cizirî wergerandibû zimanê rûsî. Yanî kesekî wisa bû ku di wê qonaxê de bi ziman û edebiyata kurdî mijûl dibû. Ji me re hat gotin ku Erebe Şemo li mala wî ye. Me jê re got "em dixwazin mamoste Erebe bibînin" got "kerem bikin werin malê". Em çûn me li mala wî ligel Erebe Şemo firavîn xwar. Me got "em dixwazin çend pirsan ji te bikin" mamoste got "hûn gênc in lê yê min divê piştî xwa-

rinê ez nîv saetekê rihetiya xwe bistînim, piştî wê hûn çî dixwazin ez ê ji we re bibêjim." Çû, piştî nîv saetê hat.

Wê gavê ez ne rojnamevan bûm, rojnameya me jî tune bû, kovarên me jî tune bûn, radyo jî tune bûn. Tişteki me tune bû heta ku em tê de belav bikin. Lê her tim hizreke wiha li cem min hebû min digot "çî dibe bila bibe" ew kalêmereki emrê wî li dora hefteyî bû û hevdeh salan li Sibiryayê di zindanê de mabû. Yanî diyar bû ku salên wî gelek hindik mane. Min dixwest qewîtiya wî, nesîhetên wî bigihîjin nivîskarên piştî wî. Her wisa jî min dixwest ku tiştên wî yê nehênî hebin ez bizanibim. Ew tiştên ku di wê qonaxê de nivîsibû min xwest îmze bike. Wî bi tipên erebî îmze kir. Min got "te çima bi tipên erebî nivîsî" got "ji bo xatirê ku hûn bizanibin têbînî û îmzeyê bixwînin" Ew tiştên ku wê gavê axivî teyiba min tune bû ku ez tomar bikim. Wî digot min jî dinivîsî, gelek bi bêhnfirehî gotina xwe digot. Li ser girtina xwe axivî, çawa çûye cem Lenîn di sala 1920'an di civîna Komînterê de çawa ew dîtiye, têkiliyên xwe ligel Bakur danîne, evana hemû bi bêhnfirehî gotin.

W: Derheqê têkiliyên xwe yê Bakur de çî digot? Bi kê re têkiliyên wî hebûne?

Bavê Nazê: Tiştê ku tê bîra min got "tiştin hene ez nikarim bibêjim. Partiya bolşewîk jî bo belavkirina fikrên marksîst bi taybetî di nav kurdan de teklîf jî me re anî. Diviyabû em wek kurd biçûna mintiqeya Wanê, ji bo xatirê ku em hizra marksîzmê belav bikin ne ku hizra neteweyî. Bi vê armancê ez hatim Bakur"

W: Derbasî Bakur bûne ne wisa?

Bavê Nazê: Erê, derbas bûne hatine Bakur.

W: Gelo di kîjan salê de?

Bavê Nazê: Li gor axaftina wî wê di salên 1920'î de be. Gava ku diaxivî digot "ez van tiştan tenê ji we re dibêjim, hûn jî tu kesî re nebêjin" Lê îro tu tişteki nehênî nemaye. Me jî jê re digot "na na, ma em ê ji kê re bibêjin, jixwe tişteki veşarî nemaye." 70, 80 sal berê ev tişt pêk hatine, diyar e ku biryareke wan a bi vî awayî hebûye. Yek ji wan kesên ku ji bo vê xebatê hatine şandin, li gor gotina wî Erebe Şemo ye.

W: Gelo li van deran bi kê re têkilî da-nîne?

Bavê Nazê: Heger nav gotibe jî niha nayê bîra min.

W: Têkiliya wî ligel Serhildana Agiriyê hebûye, qala wan deman dikir yan na?

Bavê Nazê: Na, di wê çaxê de di hepsê de bûye.

W: Serhildana Agiriyê di navbera salên 1927-1931'an de ye. Wê demê ne girtî ye.

Bavê Nazê: Bibore di dema Serhildana Dêrsimê de girtî bûye. Ez dîsa bibêjim ew bi armanca belavkirina hizra marksîzmê bû, ne ku hişyarbûna neteweyî.

W: Na, gelo têkiliyek hebû yan tune bû? Mesela ev agahî tişteki nû ye, derbasbûna wî ya li Bakur nedihat zanîn. Te ev hevpeyvîn cara pêşîn di kîjan weşanê de belav kir?

Bavê Nazê: Di Axîna Welat de li Mosko-vayê cara pêşîn hat belavkirin. Carekê ez wisa li nivîsên xwe digeriyam. Nivîsên min hinekî bêserûber bûn, destnivîsên min tevlihev bûn. Carekê min ew hevpeyvîna bi Erebe Şemo re ya ku îmzeya wî li binî ye min dît. Min anî di Axîna Welat de belav kir.

W: Mamoste wekî din tiştên ku tu di derheqê Erebe Şemo de dizanî û heta niha nehatine gotin, wan jî bibêjî dê baş be.

Bavê Nazê: Erebe Şemo wê çaxê jî min xwest ku ez çend malûmatan derheqê Kela Dîmdimê de jê re binim.

W: Wê demê roman nivîsîbû yan na?

Bavê Nazê: Na, xelas nekiribû. Got "ez romanekê dinivîsim, ez dixwazim hûn malûmatan ji min re binin". Min jî bi riya nameyê jî bavê xwe pirsî, lê wê gavê bavê min çûbû rehmetê û jî min re negotibûn, bersiv jî min re şandin gotin "malûmat li cem me tune ne" Erebe Şemo yek ji wan kesan e gava ku nivîskarên me dijîn û li ber çavên me ne em zêde nîrxê nadinê lê gava ku diçe, wê valahiyê li şûna xwe dihêle, em bi xwe dihesin "weyyy me çi kir". Pîrî caran wiha bûye, ez dikarim bibêjim ku ev jî durûtiyeke civaka me ye li hemberî kesên ku ji bo civaka xwe xebitîne. Di nêrîna min de ew pîremêrên ku di qonaxên wiha dijwar de tiştin wiha li edeb û çanda me zêde kirine,

divê em li hemberî wan ne xemsar bin. Mi-qayetiye li wan bikin, ew tiştên ku bi wan re hene em nehêlin ku bi xwe re bibin tirbê. Gelek tişt hene rehmetiyê Seydayê Namî di çend şîrên xwe de qala seydayekî dike, niha navê wî nayê bîra min. Şîrên wî pîr xweş bûn heta demekê ji ser hişê xwe çûbû kesî guh nedidayê. Ev jî dihêle ku em gelek gelek muesîr bibin di vê pîrsê de. Erebe Şemo piştî ku ji Sîbiryayê vegeriya, hikumeta Sovyetê guh dayê û Xelata Sor pê ve kirin, heta dereceyekê alîkariya madî pê re kirin û miaşek danê. Lê tevî vêya jî ji aliyê civakê ve bi çavekî din lê dihat nihêrîn. Ji ber ku Erebe Şemo şêx bû û wek tê zanîn di nav kurdên me yên êzîdî de dereceyên wek şêx, mirîd hwd. hene ev jî di têkiliyên wî de dibû arîşe. Mesela têkiliya wî û Qanatê Kurdo ne xweş bû. Tê bîra min di nav zan-yarên din de axaftinên ne xweş dihatin kirin.

W: Pîrsgirêk çi bû di navbera wî û Qanatê Kurdo de?

Bavê Nazê: Erebe Şemo digot di sala 1929'an de min û Maragulov alfabeya latînî ya kurdî daniye. Sal baş nayê bîra min dibe ku saleke din be. Wî çirokeke din ji min re got, çirokeke wiha balkêş bû. Got "min



xwest ez biçim ba Stalîn bo xatirê ku em pirsê alfabe û zimanê kurdî deynin meydane. Çi cara ku ez diçûm min digot ka ez heval Stalîn bibînim lê rê nedidan min. Rojekê yekî cihû ji min re got, kuro tu kî yî? Min got “weleh ez kurd im”, yê cihû jî got, “çi hişê te tune tu hatiya dibêjî ez ê heval Stalîn bibînim”. Bibêje “ez nûnerê gelê kurd im ez dixwazim Stalîn bibînim, wê çaxê dê rê bidin te”. Ez hatim min got “ez filankes, ez nûnerê gelê kurd im dixwazim heval Stalîn bibînim.” Ez derbasî hundirê kirim lê kes tune, min dît ji nişkê ve deriyek vebû û Stalîn derbas bû, ez rabûm ser xwe wilo bi heybet bû ez li hemberî wî sekinim. Got, “rûnê tu çi dixwazî?” Min kir û nekir devê min negeriya. Got ku tu yê bi axivî ka bi axive. Min got “heval Stalîn rewşa me kurdan wiha ye alfabeya me...” Got baş e. Û piştî wê jî em hatin me dest bi xebata xwe kir” Ev gotina Erebe Şemo ye. Lê Qanatê Kurdo û Heciyê Cindî dibêjin me ev pêşevanî kiriye.

Erebê Şemo digot gava ez şivan bûm têkiliya min bi bolşevîkên veşarî re hebû. Lê min nizanibû kî kî ye. Di kongreya Komînternê ya di sala 1920’an de ji wan kesên ku wê gavê têkiliyên min pê re hebû min yek dît –kesî nizanibû ez çi me, tişt didan min dişandin deran, kesî hewm nedikir digotin ka ev şivanek e çi eleqeya wî bi bolşevîkan re heye, ez diçûm dihatim min gelek xebat dikir, cihê baweriyê bûm li cem wan bolşevîkan, lê di çavên polisan de şivanekî nezan bûm- got “weyyy heval tu yî”, me hevdu hembêz kir, hîna me li hev dipirsî bang kirin, gotin bila “filankes bê cem Lenîn”, hema ew çû min jî da dû em her du bi hev re derbas bûn. Yê ku ez pê re çûme nedît ku ez jî derbasî hundir bûme. Lenîn got “ev heval kî ye” wiha nihêrî got “ev heval Erebe”. Min got “heval Lenîn mîletê me kurd mîletekî birçî ye, rewşa wî wiha, wiha, wiha ye.” Sala 1954’an piştî ew qas sal di cilda 37’emîn a berhemên Lenîn de yan jî cilda 13’emîn, nema baş tê hişê min, birûskê (*telgrafek*), belgeyek heye Lenîn şandîye gotiye “bibin alîkar ji birçiyên kurdan û kesên birçî re” ku ew jî encama axaftina wê odeyê ye. Got “hûn bawer nakin herin li wê cildê li filan rûpelî binihêrin ew birûsk wa

ye di wir de ye, bixwînin” Bi rastî jî em çûn pirtûkxaneyê me ew pirtûk vekir, tiştê ku Erebe digot tê de hebû.

W: Mamoste gotina te ya dawîn ji bo xwendevanên Kovara Wyê û kesên têkildarî ziman û edebiyata kurdî çi ye?

Bavê Nazê: Gotina dawîn her tim gotina herî dijwar e. Gotina dawîn di berhemê de jî di jwariya xwe heye. Xala dawîn dema ku tu datîni girîngiya xwe û di jwariya xwe heye. Di hevpeyvînê de jî gotina dawîn di jwariya xwe heye. Ê min ne wek wan kesên ku dibêjin pîrbûna tiştan, berî 25 salan li cem me nîqaşek çêbû digot “hebûn ji tunebûnê çêtir e yan tunebûn ji hebûnê çêtir e”, li cem min tunebûn ji hebûna xerab çêtir e. Çimkî hebûna xerab wê bibe nîmûne ku yekî din jî bi wî şeweyî binivîse. Daxwaza min ew e ku wan tiştên ku hûn biweşînin cidi li ser wan rawestin. Pîrbûna berhemên ne nîşana xebata baş e. Mîmkun e ku nivîskar di tevahiya jiyana xwe de tenê pirtûkekê binivîse û di wejêya cihanê de cihê xwe bigire. Wek Cervantesê nivîskarê Don Kîşot, Ehmed Arîf ew 12 helbestên wî yên ku hene beramberî 12 diwanan e. Hêviya min ew e ku Kovara W bi cidî miqate be li pîrsên ziman û bi taybetî yên rastnivîsê. Di warê rastnivîsê de standardek tune. Wek mînak ku di zimanê rûsî de bêhnokek ji nivîsê kême be, ji dereceya 5’an dadikeve dereceya 4’an. Îcar ê me nebûna bêhnokê dikare wateya pîrsê jî biguherîne. Gava ku we xwest hevpeyvînê bi min re bikin min got “belkî dema me hebe em bi berfirehî li ser rêzimanê bisekinin. Dîsa jî dibêjim rastnivîs, rastnivîs, rastnivîs”.

Amed bajarekî ku şaristaniya xwe heye, bajarekî ku çiqas ewrûpî ye wiha jî kurdî ye. Ev jî di hêla ku bawerîya mirov bi paşerojê bê. Lê tenê bajarek na, divê tevahiya mîlet û welatê me. Tevî tengasiyên ku em tê re derbas dibin jî hêdî hêdî gavên xwe biavêjin û pes nekin. Çimkî jiyan û ev xebata ku ji bo vê jiyanê dibin di jwariyên xwe hene. Û di jwarî jî bi hêsanî nayên bindestkirin. Ez sipasiyên xwe pêşkêş dikim ku we derfet da min, min gotina xwe got. Ew gotina min a ku dibe bi dilê we be yan jî ne bi dilê we be. Lê di dawiyê de min gotina dilê xwe got. Sipas.

W: Zor sipas. Malava.

Li ser xanî

Şevger ÇIYA

Min plana xwe çêkiribû, min dê pêşiyê saxî bikira ku mala wan hemû vala bû, dawiyê piştî şîvê min dê bi bahaneya çûyîna tuwaletê keys li sêniyên mala Silo baniya, ez niha di nêçîrê de bûm

Ez dê ji we re qala xwe bikim. Beriya ku ez dest pê bikim divê ez ji we re bibêjim ku ez di sekeratê de me. Ev xeberdanên min hemû di nava çend kêliyên beriya mirinê de di hişê min de derbas bûn.

Min boyaxçîtî dikir, min û Hejar me bi hev re dikir. Mala me li taxa jor bû, taxa herî dûr a ji bajêr. Qedera nîv saetê her serê sibê min û Hejar me dida dû hev em diçûn çarşiyê. Xaniyên me yektebeq in, hemû xanî jî wiha ne. Taxa me ji dûr ve sor dike lewre hemû mal ji pîrketên sor hatine çêkirin. Hê wexta ez di hembêza diya xwe de bûme, li ber şîr bûme, me mala xwe bar kiriye em hatine vê derê. Ez qet ji vê derê hez nakim, serê sibê radi-bim diçim ber mala apê xwe, Hejar digirim û em berê xwe didin çarşiyê. Heta êvarê weke segê ber tenûran geh li ber vê qehweyê geh li ber qehweya din, em solên xelkê boyax dikin. Li ber qehweya Siloyê pozqelûn karê me pir baş bû lê Silo em qewirandin çû gundiyeke xwe anî. Ji me re hatina qehweyê qedexe kir. Em jî man li kuçeyan. Îcar boyaxçiyên kuçeyan qet kar nakin. Xelkê li me dixist, çêrî me dikirin, pereyên me nedidan, tif li me dibarandin. Êvarê jî li mal qiyamet radibû, bavê min ê ku min ew dîtiye nedîtiye karek ji nekiriye, dê û jina me dibir diyarê darê û daniya xwarê, çend caran jî li min xist çima ku ez weke berê pere kar nakim. Ev hemû sûcê Silo bû, min hezar carî di diya Silo niyayoooo. Ax Silo ax, kurê dêlikê Silo.

Mala wan jî li hemberî mala me bû. Çend caran ez çûm min xwe avêt lingê Silo, diya min çû ber diya Silo lê Silo qet

tişteke negot, bû orim û devê xwe da ser hev. Êdî min fêhm kir ku xêr ji Silo nayê min jî dest pê kir ku xera bikim. Wexta salçeya firingiyan bû, li ser xaniyê mala Silo çend sêniyên sifir hebûn, her roj wexta ez di ber malê re dibihurim min digot ez dê kîngê karibim wan sêniyan bidizim. Lewre êdî Silo dijminê min bû. Zerradayîna dijmin kêfxweşiya mirov e, xerakirin û çêkirin yek in. Çêkirina ji bo xwe û xerakirina dijminan yek e. Min nikaribû çêkira min dixwest xera bikim. Min dizanibû dê çend roj şûnde êdî ew sêni ne li wir bin, ango wextê min hindik mabû. Çûyîna ser xanî ne karekî zor bû lê heke yekê/î ez biditima dê hingê qiyamet rabûya. Divê ez di şeveke tarî û xewle de biçûma ser banî. Divê wê şevê kes li mala Silo wan tune bûya. Xwedê alî min kir, di wan rojan de carekê min bihîst ku lawê xaltiya Silo dizewice û Siloyê me, tevî hemû malbata xwe dê biçûya dilanê. Ji kêfan min dikir ku bifirim. Aliyê esrê ez ji boyaxê hatim malê, ez li taldeya dîwarê mala me sekinim, li hêviyê bûm ku mala Silo wan biçûna dilanê. Min plana xwe çêkiribû, min dê pêşiyê saxî bikira ku mala wan hemû vala bû, dawiyê piştî şîvê min dê bi bahaneya çûyîna tuwaletê keys li sêniyên mala Silo baniya. Ez niha di nêçîrê de bûm. Nêçîrvan pêşiyê nêçîra xwe raçav dike, min jî wisa dikir. Qelebalixek ji mala Silo tê, di amadekariya çûyînê de ne herhal, diya wî disa nifir li zarokên xwe dibarand, xwişka Silo ya biçûk digirî, bavê Silo çêran dike. Siloyê pozqelûn bi dengê perdeya guhê mirov diteqîne dibêje “haydê, bi Quran ez êdî naçim ha! Ez dizanim hûn ê her dem wiha bikin, do min ji we re negot kîngê ez bêm bila hûn

amade bin, he? Min got negot?” Silo wiha ye mirov tiştêkî ji devê wî fêm nake. Car heye bîlasebep sond dixwe, car heye hinek tiştên biçûk mezin dike, car heye dixeyide, carna ji ber xwe ve dikene, Silo bi rastî nanê sêlê ye. Kes putê pê nade. Min jî pute pê nedida, carekê gelek tişt stendibû ji keçîkekê re, keçîk yeke çavekiribû, dizanibû ku Silo yekî aqilsivik e. Bi devê Silo re dikeniya digot Silêman û Silo dîn dibû girêz ji devê wî dihat xwarê, lotik li xwe dixist. Silêman carekê gelek tişt stendin, goşt, firingî, îsot, bacan, kartol, pirinc, hêk, tirî, zebeş, xox, qawin hemû dan min got bibe mala keçîkê, min jî hemû bir mala me û tenê hinek tirî û xox bir mala keçîkê. Qet tiştêk jî nebû, got “te bir?” min got “erê.” Got keçîk li wê bû min jî got “ji te re pir sipas kir û pir kêfa wê hat”. Ev agahî besî Silo bûn. Ew jî wiha çû. Lê wî Siloyê aqilsivik ez û Hejar ji karê me kir. Xelkê pêçî dida Silo, Silo jî dawîya dawîn pêçî da me. *Neyse* roj roja tolhildanê bû. Xwişka Silo ya mezin ji gund hatibû, qasî ku ji dengê wan dihat fêmkirin nedixwest here dîlanê. Digot “ez nexweş im. Ez û kurê xwe em li malê bin.” Diya wê jî li ber digeriya digot “eyb e, dê dilê wan bimîne, hema were dawiyê dîsa vegere.” Keçîkê qebûl nedikir. Dawiyê keçîk bi ser ket, got “ez nexweş im ha. Qey ez bimirim hew. Gava ez zewicim ew jî nehatin dîlana min.” Diya keçîkê got “keça min hingê şîna wan hebû ew dê çawa bihatina daweta te?” Keçîkê jî got “temam ez jî nexweş im wîîîîîî.” Keçîk jî gund ji bo dawetê hatibû û niha nedixwest here dawetê. Di wê navberê de min dît diya min ji tenûrê dihat, çawa çav bi min ket got “kuro ew çi ye, nola pîrê heftê salî te xwe daye ber diwar û gunê xwe difirikinî, çima tu îro zu hati malê?” Min got “yadê, dilê min xeliya, ji pozê min xwîn hat mêrikekî ji min re got here malê. Ez jî hatim.” “Mêrik pere da te?” “Mêrikê xerîb çima pere bide min?” hingê tu çima bi xebera mêrikê xerîb dikî bextereş, aniha bavê te ji qehweyê bê û te di vî halî de bîbîne dê te bikuje. Qet nebe were hundir

xwe dirêj bike.” Diya min a dilovan, dilê wê bi min şewitibû, min jî diya xwe pir hez dikir. Min dizanibû diya min weke bavê min zalim nîn e. Diya min tu carî li min nexistiye, gava bavê min li min dixê jî dibêje bavê te ye, li ber nekeve, tê min radimûse, dil dide min. Dê hemû wisan in, minak diya Hejar ji wiha ye, Hejar jî pir ji diya xwe hez dike. Carekê tew digot ez dê bavê xwe bikujim lewre bavê wî li diya wî xistibû. Hejar pereyê xwe hemû dibe dide diya xwe, yê min jî aniha bavê min ji birçinan bimire jî dilê min pê naşewite, gava li min xistibû min digot xwezî carekê ciwamêrek biketa ser heta jê bihata lêxista dev û pozê wî belav bikira. Min çend roj dua kir, lê nebû. Aniha jî ez û wî em bi hev re xeber nadin. Ez ji wî hez nakim, ew jî min hez nake.

Min ji diya xwe re got na, ez nikarim xwe bilebitînim jî, ez dê hinekî li vir bêhna xwe vedim dawîkê ez dê bêm hundir. Ez li hêviya mala Silo sekinim. Êdî wext ber bi êvarê ve diçû, siya min bibû qasî hewrekî, di wê hingura êvarê de malbata wan bêtî xwişka wî ya mezin derket. Xwişka wî ya mezin li malê ma. Ev yek ji bo min xirab bû, divê min plan biguherta lê min kir nekir tiştêkî din nehat hişê min. Min got çi dibe bila bibe divê êz biçim. Min xwe qanih dikir ku talûke tune lewre xwişka Silo nexweş bû bi ihtîmaleke mezin dê raket heke ranekeve ji pitika wê hebû, nikaribû li malê miqate be encax li pitika xwe miqate be, jixwe xwişka Silo ez nas jî nedikirim. Heke têbigihîşt ku yek li ser banî ye dê bi ihtîmaleke mezin newêribûya bihata ser banî, rûyê min nedîta bes bû. Ji bo wê jî çareya min hebû, min dê rûyê xwe bipêça. Rast e, min dê wiha bikira. Xwezî Hejar jî li ba min bûya. Belê belê rasterast divê Hejar li ba min bûya, divê Hejar nobet bigirta ku kes nayê û naçe û heke yek bihata divê haya min pê bixista. Min berê xwe da mala wan, Hejar li mal li ber derî dilîst çawa ez dîtîm leyîstîk berda hat ba min. Min ew bir ber diwar û min ji wî re behsa plana xwe kir. Hê Hejar bersîvek nedabû diya wî jî weke

diya min got “çi we xwe weke pîrên heftê salî daye ber diwar.” Min jî got qey ev pîr jî planan çêdikin çi dikin. Min jî diya wî re got “amojin, hinek spartekên Hejar hene. Divê sibê bide mamoste. Bila bê mala me, ez ê alikariyê pê re bikim bila biqedîne.” Amojin heywaneke Xwedê ye, amojin tiştê tekî qebûl dike! Got na bila ew jî xwe re çêke. Çi karê te pê heye. Min û amojinê û Hejar me di ber hev da. Werhasil got tamam. Min Hejar girt em çûn mala me. Êdî tavê xatir jî dinyayê xwestibû lê hê nebûbû tarî.

Hejar plana min eciband, ez û Hejar em du felqên sêvekê ne. Ji birayê min pêşdetir e. Her dem min jê re digot xwezî ez û tu em bira bûna. Rojekê em bûn destbirak, min û wî me xwîna xwe tevlihev kir. Hejar nivê min ê din e.

Divê wê şevê min û Hejar, me karibûya biçûna derve bêtî kesî/ê şik bibira. Min fikir nedikir min nikaribû çareseriyek jê re bidîta. Divê qasî saetekê kesî bangî me nekira, em meraq nekirina. Dawiyê em li ser sifreyê rêz bûn, her roj di van çaxan de min û bavê xwe me li hev dixist. Wî ez jî ser sifrê diqewirandim. Divê îro jî wiha bikira, lê ji ber ku îro Hejar jî hatibû ev yek ne hêsan bû. Pêşiyê ez dereng hatim li ser sifreyê rûniştim, dawîkê min bi qestî dewê xwe rijand, piştê min dewê xwişka xwe vexwar, gava min pariya ku di devê xwe de dicût derxist, kir ser sifreyê û min got ez vê şivê naxwim êdî kêr gihîşt hestî, bavê min bi yek derbê ez jî ser sifrê rakirim, qiyametê çêr û nifir li min barandin, ez avêtim derve. Hejar tavilê jî ser sifreyê rabû da dû min. Em derketin kuçeyê, kuçe weke her rojê tarî bû, me xwe xûz kir û me xwe gihand ber mala Silo. Ez hilkişiyam ser diwar, Hejar li serê kuçeyê ma. Gava yek bihata dê Hejar bifikanda û haya min pê bixista. Ji ser diwar min xwe çeng kir, beriya ku ez bikevim min xwe gihand ser banî. Mala Silo wan dutebeq bû, li qata jor du ode û peşiya wan odeyan eliyekî fireh hebû. Bi gelemperî havînan malbat gişt li terasê û li her du odeyan ra-

diketin. Ew sêniyên ku ava firingiyan tê de hişk kiribûn, niha li ber destên min bûn. Lembeya malê girtî bû, min got qey xwişka Silo raketiye. Min rahişt sêniyê xwe ku ez dakevim min nihêrt deriyê mala Silo lê ket. Dest û lingên min li hev lefiyan, bû qirçe-qirça diranên min, hindik mabû ez jî ser hişê xwe biçim. Tavilê min xwe bi erdê ve veziland, min her du çavên xwe hişk girtin. Êdî ez mabûm li ber rehma Xwedê, wî Hejarê bênamûs çawa neditibû ku malbat vegeriyaye, hê saet jî zû bû. Vê carê bavê Silo û Silo tiştêk bi min nekirina dê teqez bavê min, ez bikuştima. Van fikiran fikir ku ez jî cihê xwe bipekim û hey biçim, heta jî min bê bazdim, biçim û biçim lê di rewşên wiha de derman jî di çongên mirov de namîne. Derî vebû, lampe pê ket. Pêjna lingên du kesan hat, carekê min dît helkehelkê jî malê tê, ez hinekî din jî di cihê xwe de bêpejn sekinim, helkehelkê dewam dikir, min xwe li ser zik bi aliyê pacê ve kir, ji paceya ku bayê lê dixist û perde dida alî ez çi bibînim. Xwişka Silo û mêrikek, nola du maran firiyane hev, min digot dê yek ê din dabelihîne, mêrik piştê xwişka Silo dabû diwar, bi her du destan cilên wê jê dikirin, wê jî bi her teqla mêrik dikir nale-nal, geh porê mêrik dikişand geh her deh neynûkên xwe di nava piştê mêrik de diçikand. Hê min dernexist ku ev çi dikin min carekê dît lampe hat vemirandin lê hê jî helkehelkê dewam dikir. Min sêniyên xwe girtin û berepaşkî ez vedikişiyam, bêpejn, bêdeng. Haya min jî piştê min tune bû, ji nişkê ve, ez û yekî li hev leqitîn. Bi vegerandina xwe awirên min di çavê Silo de aliqîn. Dinya li dora min tarî bû bû bû, her kes, lawir, alav, bajar li dinyayê hilweşiyam. Ez bûm cemed, ez bûm dar, ez mat bûm, ez bûm miriyê jî gorê derketî ne hîs, ne liv bi min çenedibû. Silo tavilê sêni jî destê min derxist, ji min re got “ez dê sibê pereyên wan bidim te. Ji kesî re qala îro neke haaaa.” Ez li cihê xwe bûbûm dareke çandî, min xwe tev nedida, bi awirên vala min li Silo dimeyzand. Silo dewam dikir “ Sibê were ber qehweyê, boyaxê

bike. Jixwe ji zû ve ye min dil dikir ku bangî te bikim.” Ez hê jî wiha sekinandî bûm. Min tiştek fêhm nedikir. Silo destê xwe kir berika xwe, hinek pere derxist, kir nava destê min û got “De haydê here. Kurê kûçik tu çi ji min dixwazî, temam sibê were ez dê hinêkî din jî bidim te. Ji kesî re qala îro neke ha. Tu yê ji vê bazarê hê pir pereyan kar bikî lê divê tu ji bîr nekî ku divê tu ji tu kesî re qal nekî. Tek û yek şertê vê bazara me ev e”

Roja din, em dîsa vejeriyan cihê xwe yê berê lê vê carê êdî em bihêztir bûn. Em şîrikê Silo bûn. Roja din dîsa malbata wan hemû çûn dawetê tenê xwişka Silo li malê ma. Tarî çawa ket erdê min xwe da serê vî goşeyê mala Silo, Hejar jî xwe da aliyê din. Me nahtorî dikir ku Silo neyê girtin. Silo dizanibû ku xwişka wî bi vî merikî re bi hev şa dibe. Wî jî temaşe dikir. Ji bo em nobetê bigirin, qasî qezenca me ya hefteyekê pere didan me. Ev pere pereyên min û Hejar bû, me pere nedida kesekî û jixwe haya kesî ji vê yekê tune bû. Pereyên ku me ji boyaxê kar dikir me dida mal, qarewara bavê min hatibû birin. Ez dîlşad, Hejar dîlşad, Silo dîlşad, xwişka Silo dîlşad, mêrik dîlşad, bavê min dîlşad, min digot qey dinya hemû dîlşad e. Silo êdî ji me re bigota çi me dikir. Em êdî bûbûn leşkerê Silo. Silo ne tenê xwişka xwe temaşe dikir, êvaran em dibirin ber malên xelkê dikir nobetê, wî temaşeya xelkê dikir. Yên nûzewicandî, keçikên serê xwe dişon, destgirtiyên hev, kes ji ber Silo xilas nedibû. Me berikên xwe tije pere dikir, Silo piştî her karê me, diket quncikekê destê xwe dikir navrana xwe dibir û dianî. Em dikeniyên. Carekê şemaqek li min û Hejar xist, gef li me xwar got “Careke din hûn wiha bike-nin, ez dê we biqewirînim. Me dengê xwe nekir.” Silo pir ditirsiya ku kes pê bihese, her tim li me tembîh dikir “Ji kesî re nebêjin ha, ji diya xwe re, ji bavê xwe re, ji xwişk û birayên xwe re. Ji kesî re nebêjin.” Me jî wiha dikir, me ji kesî re nedigot.

Payîz qediya, sar û sermayê nedihîşt

ku mirov pozê xwe derxe derve. Êdî em nedîçûn nobetê, zivistanan her kes mala xwe baş dinixumîne, her kes dikişe qalikê xwe. Em, yanî ez û Hejar em li hêviya biharê bûn. Serê meha sibatê, Xwedê karê me li hev anî. Xaltiya Silo mir. Xwişka Silo dîsa hat bajêr, çawa çavên min li kolanê bi xwişka Silo ket min dikir ku bifirim. Min şerm nekira min dê biçûya destên wê ramûsa, ew hembêz bikira. Malbata wan hemû diçû şînê. Kes li mala Silo nedima. Em hêviya Silo bûn ku bi-bêje “De haydê”. Lê Silo deng ji xwe nedianî, xwişka Silo tenê li malê nedima. Ez di tatêla vî karî de bûm. Hema hema bû sê meh, min qet qala vî karî nekiriye ji Silo re. Silo jî wisa. Nola tiştek nebûye em tevdigerin, hem em hem jî Silo. Piştî sê-rojê malbata wan vejeriya malê. Êdî tu derfet tunebû. Min êdî hêviya xwe biribû. Şeva îne malbat hemû dîsa çû ser gorê, tenê xwişka Silo ma li malê. Haya min ji tiştekî tune bû, Silo hat bangî min kir. Em çûn. Hingura êvarê bû, hê tam tarî neketibû erdê. Hejar wê rojê nexweş bû haya wî ji tiştekî tune bû, axirê ku tune bû. Hebûya niha ew jî dê di sekeratê de bûya. Min xwe li ser dîwarê mala Silo wan vezeland. Silo derket ser xanî. Mêrikê me hat, derî jê re vebû. Ketin hundir. Niv saet paşê, mêrik ji mal derket. Silo pereyê min da, ez çûm malê.

Çaxa ku karê min qediya ez vejeriyam malê, sobeya me pêketî, li ser sobê beroşa şorbeyê, malbat hemû li ber sobeyê rûniştibûn. Bavê min qala tiştekî dikir, her kesî/ê ew bi baldarî guhdar dikir. Bi ketina hundir re bavê min bi qîrînî got “Tu ji ku têyî?” Min bi şaşwazî lê nihêrt, min xwest ku fêhm bikim gelo xeletiyêke min çêbûye, roja bihurî bi temamî li ber çavên min bihurî. Tenê min alî Silo kiribû, ew jî bi min ne ihtîmaleke mezin bû ku haya bavê min ji vê yekê hebe. Min ji bi yekcarê got “Ez li ba Hejar bûm.” Min xwe kişand quncikekê û min jî guhdariya bavê xwe kir “Ev Silo bênamûs e. Bênamûsekî ne ji rêzê ye haaa. Di tarîxa dinyayê de hatiye dîtin ku mirov here xwişka xwe temaşe

bike. Temam, xwişka te qehpik e lê tu ji qebraxê qehpikê yî. Wa ye niha zarokên xwişka wî tune ne? Hene. Mêrê xwişka wî tune ye? Heye. Qehpik qîza qehpikê tu çima têyî li mala bavê xwe, orispîtiyê dikî, kirê hezar keran min di te kirê. Her tişt cîsn e, cîsnê mirov bi namûs be mirov ji binamûs e, cîsnê mirov bê namûs be mirov jî bê namûs e. Siloyê devgirêz ha, Siloyê devgirêz mêrik tê xirabiyê bi xwişka wî dike ew jî diçe temaşe dike, lawoooo, lawooooo. Qey bêhna namûsê nayê pozê te, qey tu nabêjî yên ku ji bo namûsa xwe tîn kuştin ji bo çi tîn kuştin, yên ji bo namûsa xwe xwişkên xwe dikujin ji bo çi dikujin? Namûs bi peretî tê kirîn, namûs tê şûştin? Welehî min xwe bi zorê girt ku ez mêrik nekujim. Di taxa me de tiştêkî wiha bibe, bila orispîyek ji gundê xwe rabe bê şîna xaltiya xwe, bila bi mêrê xelkê re bênamûsiyê bike, bila bênamûsê birayê wê wê temaşe bike. Dê çi bibe, dê êdî qiyamet rabe. Min tu carî tiştêkî wiha nebihistiye, ne jî dîtiye, ne jî hew. Ez wa ye ji we hemûyan re dibêjim, êdî weke cîran çûyîn û hatina mala wan tune, bi wan re xeberdan tune, ne tenê bi mezinan re bi biçûkan re jî xeberdan tune. Lewre orispîti cîsn e, yên biçûk jî mezin bibin dê bibin orispî. Û tu?” Bi vê peyvê canê min tevîzî, nola aveke kelandî bi serê min de bikin, ez qediyam, ez heliyam, bêhna min çikiya, xwîn ji laşê min kişiya, deng ji min derneket, dewam kir “Êdî divê tu neçî ba qehweya Silo.” Heta paşiya şevê bavê min qal kir, diya min nifir kirin, mezinan mezinahiya xwe peyitandin, xwişka min ji xwe tirsîya, birayê min bi mêrbûna xwe serfiraz bû, ez di tatêlê de bûm. Ji bo min talûkeyek tune bû lê dê çi bibûya? Silo, bavê Silo, qehwe, boyax, pereyê ku Silo dabû me, heke Silo ji bavê min re bigota “Tu çima ew qas fortên xwe dikî, xwe dikî binamûs kurê te jî nobeta min digirt, hingê dê bavê min ez bikuştima. Ax eman, axxx. Silo yekî kêmaqil e, kêmaqil nebûya dê biçûya xwişka xwe temaşe bikira? Yaw ji min re çi Silo yekî çawa ye, bila qala hevpariya me neke bes e. Çima

bike? Bike dê çi bikeve destên wî? Heke ew qala hevpariya me bike ez ê ji ez qala her tiştî bikim, em çûbûn ber kîjan malê, Silo kîjan mal raçav kiribû, ez dê her tiştî bibêjim hingê dê her kes bibe dijminê Silo. Na na Silo me nade dest. Jixwe di wê geremoleyê de nayê bîra Silo ku me bide dest, lê heke bê? Hingê me gûyê xwe xwar. Teqez dê bavê min min bikuje. Divê serê sibê beriya her kesî ez Silo zeft bikim û jê re qala her tiştî bikim, bila bizanibe ku ez li aliyê wî me, gava bizanibe ku ez li aliyê wî me dê min nede dest.

Roja din saet dehan de rabûm, min berê xwe da çarşiyê. Bavê min her roj saet duwanzdeh yan jî di yekê de ji mal derdikeve. Îro di saet nehan de ji mal derketiye. Ez heta gihiştim çarşiyê, min dît ku qehweya Silo vikîvala ye, gelemperî di van saetan de qehwe vala ye, lê Silo jî nexuya ye. Min got hela ez li çarşiyê bigerim belkî leqayî Silo bêm. Hê ez gihiştibûm ber dîkana hecî Hiso, min mêze kir ku Silo ji jor ve tê. Wî jî ez dîtîm û bangî min kir.

“Te ji bavê xwe re got?” “Min got çi?” “Ez di diya te nim, lawê qehpikê, xeynî te kê bi meseleyê dizanibû he?” “Bi navê Xwedê min negot, ez nizanim kê gotiye.” “Min negotiye, te negotiye, kê gotiye lawê wê qûzdayê?” “Bi Quran, haya min jê tune ye kê gotiye, ma ez çima bibêjim?” “Tu çi lawê orispîyê yî, te gotiye; ji xeynî te kes bi vê meseleyê nizane.” “Çi dixwazî bibêje ez li ser sond bixwim, min negotiye û ez nabêjim jî” “Divê ez xwe bikujim encax ez wiha ji vê meseleyê xelas bibim. Her kes pê hesiya ye, her kes li min digere niha. Ez birevim biçim cihên dîr, dîsa çare nîn e dê bavê min bê min bikuje. Te ji kesî re negota niha em hemû mesûd, me dê ji xwe re li karê xwe binihêrta, ez dê dîsa Silêmanê bavê xwe bûma, dê te boyaxa xwe bikira, belkî ez bizewiciyama, zarokên min çêbibûna, dê diya min, xwişk û birayên min di daweta min de govend bigirtina, dê her kesî bigota kî zava kî zava Silêman zava. Te çima kir he, bibêje lawê qehpikê te çima

kir, te çima serê min û xwe tev de xwar he? Qey dilê te bi min neşewitî, min ew qas pere dan te qey tu şikir nakî, qey pere li ba we bi kêrî tiştêkî nayê lawê delikê he?” Bi vê xebirdanê ve hêşir ji çavên Silo dibarin, pozê wî tê, ji aliyekî ve fişefîşa pozê Silo ye, ji aliyê din ve Silo dilerize, çavên wî sor bûne ez dibêjim “Weleh, bîleh û tileh haya min jê tune ye, ez nizanîm kê gotiye, ez çima bibêjim?” Silo bi hemû dengê xwe diqîre “Kê gotiye?” teqînek tê ez li erdê dirêjketî me, guleya Silo li nava min ketiye, ez diperpitim, xwîn ji nava min diherike, bi şaşwazî li xwîna

xwe dinihêrim, çawa ew qas xwîn di laşê min de hebû. Xwîneke sor û germ ji min diçe, ez diricifim, dilerizim. Teqîneke din tê Silo berdide serê xwe û di wê kêlikê de dimire. Ez hê jî di ber giyanê xwe de didim, nûzenûza min e, ez digirîm, xwîna min diherike. Silo min di diya te niyayo. Te ez kuştim.

Bavê min li ber qehweyê rûniştîye û dibêje “Do antêna mala me xera bûbû, min got ez biçim diyarê xanî antênê rast bikim, hê tarî neketibû erdê, ez çi bibînim.....”

Wextên keserbar

Bargiran ŞANAZ

Dilopeke tarî li min bû mêvan
Ji welatê reşistanê
Ji cesta wê bêhnna bédengiyê dihat
Tenê ew bêhnna bêhnvedanê bû digeriya ji serî û heta pêyan
Tune bû hevalekî hemcinsê wê
Bêkesiya xwe ji xwe re kiribû mêhl û hatibû...

Zimanê herzimanî û hîczimanî bûbûn zimanê zikmakî
Peyvan diwelidand hemanrengî
Ew cihêreng bû
Di tarîtiya xwe de her tişt bû
Hem hebûn bû hem jî tunebûn bû

Ew li min mêvan bû
Dilopeke tarî bû
Demê li ser singa xwe dineqîşand hunera wê
Bi yek awayî, bi yek rengî dikişand neqşa wê

Ka çi nebû dilopeke tarî
Ji hestên dilmayî re hêvî
Ji wextên keserbar re şahî

Di dilê min de axîneke tarî
Di hişê min de birîneke tarî

Diafirand min li ser nîgaşê dilopeke tarî

31.05.09

Evîna Peykertiraş Pygmalîon

Şivan AR

Peykertiraşê Cyprûsê (Qibris) Pygmalîon, îleta wî ji jinan diçû. Sond jî xwaribû; heta jiyana xwe biqedîne, dê bi kesekê re nezewiciya.

Digot - 'Ji xwe huner di jiyana min de têrî xwe cih girtiye, jin jî tamsar in..'

Rojekê xwest ku peykerekî jinê çêbike. Ji ber çî biryareke welê girt em jî teneği-hîştin. An hestên xwe yên mêraniyê gelekî guvaştibûn, an jî dixwest jina ku nayê peydakirin; jina ku di xeyala wî de diçû û dihat ji nav kevirê diranfil derxe.

Li ser gelekî ponijî, xebitî û disa ponijî. Gelek dem bihurand li ser. Bi hostahiya hunerên tiliyên xwe çend caran sererast kir. Taliyê peykerekî heta vê çaxê jî ne hatiye dîtin; peykerekî wek periyeke sihrî, peykerekî bi bedewbûna xwe bê mînak ji nav tiliyên wî derket. Navê wê jî kir Galatea (Evîna razayî). Êdî nikaribû dûrî wê bikeve, her çavên xwe dida ser. Fehm nedikir ku çî bi wî qewimiye, hiş jî serî çûbû.

Demekê; zarok çawa bi listoka xwe şa dibe, wisa pê şa bû. Jê re kullîkên rengereng dianî, cilê wê diguhart, bi şev dixist nav nivînên xwe û digot;

- Bi germiya laşê xwe ez ê te bikim zindî.

Çengê xwe li navtenga wê digerand, destê xwe dibir paqên stûn û her maçî dikir lêvên xonçe, memikên sêvok.

- Dê! Nerm be, bi pêta canê min germ be.. Bedena bê qisûr!

Xwe her dipêça li peykerê..

Heta di xewna xwe de jî ewa didît: - Keçê! Laşê te dilebite. Were... Were bikeve hemêza min. Delala min..

Lê dawiya dawîn fehm kir ku ew ne zindî ye û nabe zindî. Yareke derewîn e, ya ku di paşila wî de raketî.

Helbet Xwedawenda Evîne (Afrodît) jî ew giş didîtin, jî nêz ve li vî curê evîne temaşê dikir. Dilê wê pê şewitibû, bîskêkê fikirî û biryara alîkariya jî bo xortê delal da.

Cejna Afrodîtê hatibû. Gel jî bo Xwedawenda Evîne qurban serjê dikir, şahî û dîlan digirt, aşiq jî ji bo mirazê dilê xwe lava dikir ji Xwedawendê.

Pygmalîon jî çûbû mabedê. Ji Xwedawenda Evîne lava kir ku; keçeke mîna peykerê bi destê xwe afirandî derxe hemberî wî. Her lava kir, giriya jî bo evîna xwe ya ku nedigihîştê.

Dûre jî mabedê derket ser rê. Rêya bi kevir hatiye tijekirî, bi fetlonekî diçû li pişt girdika ku bajarê Cyprûsê (Qibris) dibîne.

Vegeriyabû malê. Li hember peyker rûnişt. Hinekî li rûyê wê nihêrt û xwe tewand ji bo maça lêvên bê ruh. Ji nişka ve

veciniqî!.. Pygmalîon xwe paş ve kişand. Lêvên ku maç kiribû ne wek her car sar bûn. Saregerm û nîvnerm bû!

Cardin maç kir ew lêvên saregerm; gav bi gav nermtir û germtir bûn. Bi kêfeke mezin ew hemêz kir. Afrodîtê nehiştibû ku ev evîna dişwar yekalî bimîne. Ruh kiribû dergistiya wî. Û bi ser de jî emrekî dirêj û bextewar, rêyeke vekirî li ber wan danî. (03. 2009)



Virhewle

Meyman B. STÊRK

Di serê koça zozan de li ser du firxûnan muxtarê gund, kal, pîr û çend mirovên sereke rê hildidan, di nav wan de jî Sertîf, lê jê re digotin ‘Virhewle’ jî rûniştibû; mîna gelek deman dîsa henek dikirin û çîrok digotin

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, komara nû ew gelên kevnare û rengên herêma Serhedê pêk dianîn; ên qir kir, kir, yên mayî jî sirgûn dikir. Ên mabûn jî di nav dêrisên navçe û bajarên herêmê de, di navbera wê dijîtiya hatibû afirandin de bi zehmeteke mezin debar dibûn. Piraniya gelê rûs û ermenî; hemû avahî, erd, zevî û hebûna xwe bê xwedî hiştibûn û çûbûn. Komara nû bi demê re bi politikayeke zanebûn, ev cihên vala mabûn ecem û tirken Azerbaijan û Nexşîwanê dianîn bi cih dikirin. Bi vî awayî ev avahî, erd, zevî, dikan û sûkên bê xwedî mabûn; bê bedel, bê ked diketin destên ecem û xerîban. Eceman jî pişt bicihbûnê çav dibeliqandin derdora bajarê Qersê. Roj bi roj dest didan ser zevî û erdên welatîyekî. Hêza dewletê dabûn pişt xwe; navbera xwe û wezîfedarên komarê yên fermî û leşkerî baş dikirin û her diçû hebûna xwe fireh dikirin.

Di dawiya 1940’an de, di demeke biharê de gundiyên navçeya Dîgorê mîna her sal, dixwestin tevli pez û dewarên xwe, xwe bigihînin zozanên xwe yê Tapê Qersê. Niha li ser wî tapê şîn kulîlk bi heft rengan bişkuvîbûn, kereng dirêj bûbûn, spîngê şîr dabû û giya gihiştibû. Zozan mîna bûkeke nû siwar dibe xwe xemilandibû, hawirdor di nava rengên hêşinahiyê de bûbû cineteke derewîn, mîna hemû zozanên welêt di nav rindbûn û biyanîbûna xwe de dirijîya.

Gundî, ev fikir di hişê wan de, di nav coşêke mezin de, li ser piştê hesp, ker, ga

û firxûnan ber bi zozanan dimeşîyan. Pez û dewarê wan jî di ber şivan û gavanan de çêre bi çêre diherikin. Kalekala berx û karan tevli dengê zarokan mîna newayeke pirdeng hawirdor li ser gir û baniyan belav dibû, li pel û şkeftan diket, vedigeriya. Di nav şaxên çiyayê Kûr û çend girên bilind de hê jî teqalên berfê hebûn.

Di serê koça zozan de li ser du firxûnan muxtarê gund, kal, pîr û çend mirovên sereke rê hildidan. Di nav wan de jî gundiyeke navê wî Sertîf, lê jê re digotin ‘Virhewle’ jî rûniştibû; mîna gelek deman dîsa henek dikirin, çîrok digotin. Ew bi dengê xwe yê zîz diaxivî û metelok digotin. Dixwest hemû balê bikişîne ser xwe. Sertîfê Virhewle, wekî mirovekî ecêb di hate zanîn, di nav gund de, bi her kesî re eleqedar dibû û xwe dida hezkirin. Piştî qedandina leşkeriya xwe her dem qala tiştên ecêb dikir, gundî an metel dihişt an jî bêzar. Zimanê fermî jî piçeki fêr bûbû, li ser hemû mijarên jîyanê agahî dida û dinirxand. Li ser wê piraxaftin, xwînşîrînbûn û ecêbûna wî, van gundiyên dûrî cîhanê nivê van axaftinên wî vir dihesibandin. Lewma gundiyan ev nav bi wî mirovê sî û sê salî ve zeliqandibûn. Lê tenê têkiliya wî û muxtêr baş nîn bûn. Ev jî bê sedem nîn bû. Piçekî ji hevdu didexisîn. Sertîf dixwest bibe muxtar. Lê çawa?

Virhewle, niha jî li ser firxûnê dest pê kiribû, bi dengê bilind stranek difirand:

“Min Qersê dikan vekir

Xezalê yêlî yêlî,

Bazarê min kir, te kir

Delalê yêlî can.”

Muxtêr dengêkî bi kûr niçandê:

“Sertif, ca piçekî bisekine.”

Sertif tu yê bibêjî qet nabihîze, dom dikir:

“Wey wey bavo kêçê ez geztim, wî wî dayê ez geveztim”

Muxtêr îcar dengê xwe bilind kir û qê-riya:

“Sertif, qey guhên te ker bûne!”

“Pî! Çi bû?”

Êdî nêzî zozanan bûbûn. Muxtêr ji dûr ve tiştin nîşanî wan dida. Li nava zozanên wan çend kon û naxireke sivik kifş dibû. Destê wan li ser eniyên wan li qeratiyan mêze kirin. Niqlên hemûyan sist bûn. Ev kêf û coşa wan a gava din mîna binê kasikek avê bikeve ji nişka ve winda bû. Kesên li nav konan jî ew dîtîn. Lewma nêzî çardeh, panzdeh mirov ji konan qetiyan, hatin li sînorên zozanan sekinîn. Piçekî şûnde gundî jî gihîştibûn sînor, nav şaşî û meteliyekê de bédeng disekinîn.

Muxtêr devê xwe çêdikir, dikir bi wê tirkiya xwe ya nîvco hevokekê sererast bike. Lê kambaxê hê jî tu peyv ji devê wî derneketibû.

Eceman zozan zeft kiribûn, ji rehê xwe îşk dikirin, nêrinên xwe ji dûr ve li ser tiştên nayên zanîn çik kiribûn. Destên çend kesan ji wan jî li ser qirmeyê di ber şalên wan de disekinîn. Dûre ecemekî çavzelal û dirankerxot bi wî dengê xwe yî vix got:

“Qardaşlar xoşgelifsınız. Bilirem eskide bu laylayî siz otariftiniz. Lakin yerimiz dardı. inehlerimiz aç kalıftı. Biz de istedik, vali beg indi burayı bize verifti.”

Muxtêr, bi hêrsa xwe beşevêhat, dawiyê çend hevok tevli tûka devê xwe firandin:

“Ev cêc çî dibêje!? Bız geçen yıl da gelmiş, her yıl da gelmiş. Kim kime vermiş?”

Gundî û xortan xwe rakişandin ece-man, şivdarê xwe bilind kirin ber bi ece-

man ve çûn. Lê muxtar û kalan çepilên wan digirtin. Wan jî nikaribûn li dijî wan tişteki bikin. Ecem çend gavan dûr ketibûn, qirmeyên xwe jî tazî kiribûn. Lê Virhewle û çend xort nedisekinîn. Virhewle di dawiyê de teqiya:

“Ola sizin de ineklerinizin de val, vall... va.”

Lê ev peyva dawîn di devê wî de neqediya. Di bin awirên mezinan de dîsa xwe girtin û sekinîn. Muxtêr û kalan Virhewle û xort piçekî dûr xistin, dan rûniştandin. Niha bi hev dişewirîn. Zozan ê wan bû; walî jî dizanibû, eceman jî, her kesî jî. Lê tu kaxiz û ewraqekî fermî yê ku zozan li ser wan îspat bike jî tune bû. A kesekî jî tune bû.

Bicîhbûna eceman her roj pêşve diçû. Gundîyan ev baş dizanibûn. Komara nû, kesên nêzî xwe bi cih dikirin, li kirinên wan nedinihêrî, destê xwe li piştê wan dida, li dû neheqiyên wan disekinî. Lê gorî fikra piraniya gundîyan jî muxtarê wan piçekî genefis bû. Zû sist dibû.

Bêguman, dikaribûn li wê derê tiran ji qûna eceman berdin, çêlekên wan ji xwe re bikin qelî. Lê miratê ew tîrsa leşkerî û wezîfedarên fermî tevli nezanîna zimanê fermî dest û lingên wan girêdidan, dikirin nav dudiliyê û neçar dihiştin. Gelek cêrbên tîrsnak hatibûn serê bav û kalên wan û wan. Yek bi yek jiyabûn. Ji ber sedemên biçûk, carnan jî bê sedem lêdan û heqaret xwaribûn. Heta qala derdê xwe kiribûn, êş û rewşa xwe îfade kiribûn; cendekên wan ji aliyê cendirmeyên her dem amadeyî lêdanê ve dihatin reş û şîn kirin. Di bin van şertan de muxtar û kalan rewş dinirxandin, şewra xwe xilas kirin. Gihîştibûn biryarekê dê eşkere bi- kirana.

Niha, êdî dawîya koçê gihîştibû serê koçê. Kal, pîr, jin, xort, zarok û ajalan di sînorê zozan de xileportekte mezin çêkiribû. Her yekî ji aliyekî ve pêgermokek digeland, reh û cendek her diçûn dişidiyan.

Muxtêr rewş didît, lewma heta ji destê wî hat dengê xwe bilind kir û bangî gun-

diyan kir:

“Min û kalan me biryar da em ê vege-
rin gund. Lê ev wiha namîne. Hûn niha
tiştêkî nepirsîn. Tapoya me tune, em bi
zimanê wan nizanin, kesek jî li piştê me
nîn e. Dibêjin walî destûr daye. De kerem
bikin.”

Serê hemû gundiyan berjêr bû. Mux-
têr di dawîya axaftina xwe de bi dengêkî
nizim û kelegirî di ber xwe de got:

“Serê keçel xweş e di bin kûm de!”

Virhewle û çend xortan di ber xwe de
dikirin pilepil:

“Genefis!, genefis... Tenê xurtê me ye.
Te dît, zozanê mîna xelatekê dide wan.”

Gundiyeke dinê digot:

“Na lo! Bi vî awayî nahêle, wê sererast
bike.”

Virhewle, bi hêrs bersiv digihandê :

“Ê bikê! Min xweliya sar li serê wî kiro!
Ê neke!”

Koçwanan neçar berê koça xwe zivî-
randin. Hemû gundî di bin giraniya ne-
heqiyê û şikestina xeyalan de şûnde
dikişyan. Ew dengê ecem ê vix careke din
hat bihîstin:

“Bu torpaxlar hemsimize yeter. Digorin
her yeri layladir, gedin oralara! Qardaş,
qardaş yaşayax!!

Virhewle li dû koç e, di destê wî de ba-
çîkek hebû. Bêhneke kûr kişand û serê
xwe zivirand eceman:

“Qardaş, qardaş ha! Hûnê bibînin, qar-
daş!”

Roj êdî ber bi êvarê ve diçû. Koç di hev-
razekî de hildikişiya. Tirojên rojê yê
xwar û xurt xwe digihandin cendekên van
gundiyan xemgîn û westiyayî. Kortikê
wan spîsor bûbûn, wan jî car caran dixu-
randin û dûr diketin.

Muxtar û gundiyan di rê de biryara
xwe guherandin. Wê biçûna zozanê gun-
diyên cîran ê li ser rêya wan. Xwe bi xwe
digotin: “Em şerpeze bûn. Pez û dewarên

me wê qir bibin. Ma cîranî, pismamî çima
miriye? Em bi wan bawer in. Ne wisa?
Wisa jî bû. Gundiyan cîranê wan, ew bi
mêvanperweriyeke mezin qebûl kirin. Di
kêleka xwe de bicih kirin. Gundiyan, bi
alîkariya pismamên xwe konê xwe zûtirkê
vegirtin.

Niha li kêleka konekî rûniştibûn, dewê
bizinan ê sar û bikef jî destê qîzikan di-
girtin. Gundiyan dinê jî ev dilşikestin û
xemgîniya cîranê xwe parve dikirin û li
dijî wê neheqiyê jî, jî wan re digotin: “Em
dixwazin tevli we êrîşekê bibin ser wan.
Roj, roja xîretê ye. Îro hat serê we, dê sibê
bê serê me. Kî dizane, dibe ku sibê yan jî
dusib dest bavêjin zozanên me, wan jî zêft
bikin”

Yekî din digot:

“Na lo! Ew qas jî na!”

“Na?”

“Na, Na”

“De rabin, em rakevin. Xew çêtir e ji
rûniştinê”

“Rast e!”

“Kerem kin”

“Şevbaş!”

Rojên pey re, zozaniyan jiyana xwe ya
rojane berdewam dikirin. Her du gund di
vî zozanî de bi zehmetî debar dibûn.
Zozan têra wan nedikir, çêreyan têra pez
û dewarên wan nedikir. Şivan û gavanan
pez û dewarên xwe diçêrandin, ew çêreya
Tapê Qersê di nav guhanê ajalan de dibû
şîr, ew şîr jî bi keda destê jin, bûk û bêrî-
vanan dibû xasil.

Ji zozanên cîran çend kesên sereke û
muxtarên wan dihatin zozan, derbasî
didan wan. Li nik hev diponijîn, di dawiyê
de digotin: “Xwedê alîkariya we bike!” Ev
kar jî mîna gelek karan bi hêviya Xwedê
dihîştin û diçûn. Xêncî wan jî tû kesî zêde
qala zozanên jidestçûyî nedikir. Zozan,
mîna şermekê dihate hesibandin û bincil
dibû.

Lê çend ciwanan tevli Virhewle, hemû

êvaran li konekî xalî qala zozanê jidest-çûyî dikirin, li ser şûndestendina wî mijûl dibûn. Bi piranî li ser êrîşekê disekinin. Bi vî awayî dê ecem şûnde bikirana, zozanê xwe dîsa bistendina. Çend caran ev fikra xwe ji kalan re gotin. Lê her carê jî bersivên mîna hev dibihîstin. “Bi sebir bin, Xwedê mezin e! Dê alikariya me bike!”

Şevêkê dîsa ciwan di konekî de civiya-bûn, qala zozan dikirin. Virhewle, ev demek bû kûr difikirî. Ji nişka ve bi dengê bilind bangî kesên rûniştî kir:

“Min dît, em ê çî bikin! Hewce ye ku em serî li dadê bidin. Gundiyên başûr jî bi vî awayî erdên xwe bi dest xistine. Lê ger em parêzerekî bigirin, bila me biparêze.

Dengên xortan bi ken û qerf tevlihev bûn. Agahî û baweriya kesî bi dadê tune bû. Ne tenê bi dadê; bi tu tişteki komara ku jê re digotin ‘roma xayîn’ jî tune bû. Lewma Virhewle ecêbandin. Mîna hinek gotinên wî yên dinê ev jî diavêtin tayê vala. Niçeniçên wan dihatin bihîstin: “Parêzer çî ye, kî ye? Dê çima me biparêze? Lê Virhewle, vê fikra xwe ya nû pir xurt didît, li dijî hemû gotinan hê jî xwedî li fikra xwe derdiket. Bi coşekê rabû pê: “Em herin nik mezinan, ka dê îcar çî bibêjin?”

Virhewle li pêşiya wan, ciwan tevli çend gundî li dû wan derê konê muxtêr vekirin. Civateke biçûk rûniştibû, bûkên panzdeh salî çay amade dikirin, qizikên çardeh salî jî belav dikirin. Kalan jî mîna her car ev çaya zelal û di wan îskanên derdorên wan bi rengekî zêrîn boyaxkirî de li ser hev dadiqultandin.

Virhewle, bi dengê xwe yê geş: “Ger hûn mezin destûrê bidin, min rêyek dît bo şûndehildana zozan, ez ê bibêjim”. Rûyê muxtar û kalan piçekî bêreng bû. Yekî bi dengêkî nîvco “Bibêje Sertîf, tu yê dîsa çî bibêjî?”

Virhewle berdewam kir: “Min bihîst, gundiyên başûr bi rêya dadê erdên xwe şûnde stendine, em çima nestînin? Hûn

dizanin; tu çareya me jî tune, em ê heta kîngê vala bisekinin? Tişteki ku êdî em wînda bikin jî tune”

Vê fikra nû serê wan piçekî tevlihev kir. Dengê çend kesên din jî hat bihîstin. Muxtar qet jî Virhewle hez nedikir, lê ji bo zozanên xwe zêdetir, neçar hîs dikir. Rûmeta wî jî wînda dibû. Wekî hemû gundiyan zozan di hundirê wî de dibû kedereke mezin. Vê fikrê, yek jî minaka gundiyên başûr hişê wî zêdetir tevlihev kir. Piştî şêwrê muxtêr got: “Rastî ev fikir di hişê min de jî rûnişt, lê ka çawa, bi çî tehrî? Em ê çî bikin?”

Virhewle, bersiva xwe ya amade da: “Hûn li hêviya min bihêlin û bi min bawer bin; em carekê dest pê bikin dê mîna go-reyeke rîs verîse. Em herin bajêr, tu kes jî me bi dar ve nake, em ê rê û rêzanên vî karî fêr bibin. Hûn ê bibînin em ê di dawiyê de zozanê xwe hildin, ew ê me ye, her kes dizanin. Lê dê piçek mesref li me bikeve.”

“Ew hêsan e, em ê bêşê biavejin. Çî hewce be em ê bikin, de oxira me ya xêrê be!” got, muxtêr bi dengê xwe yê geş. Hemû rûken bûn, baweriyek hat hemûyan. Virhewle piçekî sor bû, girîngiya vî karî dizanibû, lê ew jî geş bû.

Du roj pey re Virhewle, muxtar û çend gundî li ser piştî hespên kumêt, berê xwe dan bajarê Qersê. Hespên xwe bi çargavî ajotin, di wan kuçeyên fireh û dirêj de derbas bûn, bêhna xwe li çayxaneyê ku çeya 29’an stendin. Ev çayxane yeka navdar bû.

Bajarî û gundiyên hawirdorê li vir dici-viyan. Kesên kurd, terekeme, yêrlî, melegan, rûs û ermeniyên hê jî mabûn, li vir diaxivîn; çay vedixwarin, leystik dileystin û bazirganî dikirin.

Sertîf, piştî vexwarina îskana çayê rabû; mase bi mase digeriya, ji hinek kesan tiştin dipirsî, bersiv didan, cardin dipirsî. Di dawiyê de xwe gihand xwediyê çayxaneyê. Dûre vegeziya nik gundiyan: “De rabin, min navê parêzerekî girt.”

Bi lez didu, sê kuçeyan de derbas bûn, li wir ji yekî pirsîn. Cardin çûn, ketin kuçeyeke çewt, vegeyriyan. Dîsa ji yekî din pirsîn. Di dawiyê de li deriyê avahiyeke bi kevirên reş hatibû çekirin xistin. Yekî derî vekir, kêfxweşî da wan, bi hev re derbasî hundir bûn. Cihê parêzer biçûk bû, hinek gundî li derve man. Parêzerê ciwan lê porgewr, piştî axaftinê doz hilda. Li ser bihayê dozê jî li hev kirin. Ev parêzerê terekeme, bi wan re zêde eleqedar bû.

Mehekê şûnde gundî bi xemeke mezin di diwana mehkemeyê de, li hemberî dozger Elî Riza Beg rûniştibûn. Parêzer û hinek kesên din jî cihê xwe girtibûn. Çend ecem jî li aliyê din diponijîn. Virhewle û gundiyan pergala xwe çekiribûn. Virhewle jî simbelên xwe şeh kiribûn, di nav kincên nû de bi baleke mezin li derdora xwe dinihêrî, car caran jî xwar dibû li wan pêlavên xwe yên nû dinihêrî, bi wan şa dibû. Vê rewşa wî bala dozger û kesên din jî dikişand.

Dozger Elî Beg, nû hatibû bajêr. Kesekî pêncî salî bû. Bi xwe Dêrsimî bû, mirovekî birûmet û hişk dihat zanîn. Lê xwe zêde bajarî dihesiband. Berçavkeke mezin li ser pozê wî disekinî. Çavên wî yên mezin di nav rûyê wî yê piçekî hêrs de li ser hinek kaxiz û ewraqan de digeriyan û disekinîn. Parêzer axivî, dozger jî eceman pirsî. Eceman gunehê xwe anîn û qala bêerdûna xwe dikirin. Sertîf jî destûr hilda, qala wê rojê dikir:

“Silahî olmayana silah çekilir hiç? Sa-dece ineklerimiz korktu, sütleri azalmış!”

Dozger û parêzer di bin simbelan de kenîyan. Şahid û çend ewraq jî parêzer hatin xwestin. Doz hat taloqkirin. Di navbera sê mehan de doz gelek cara dubare bû. Sertîf, her diçû, pergala xwe baş dikir, tirkîya xwe pêş ve dibir rê û rêzikên nû fêr dibû. Eceman bi demê re dev ji dozê berdan, xuya nedikirin. Gundiyan jî êdî dixwestin zozanên xwe bi awayekî fermî li ser xwe bidin qeydkirin. Lewma doz vegeyriya navbera gundiyan û komarê. Berdevkê komarê Dozger Elî Beg bû, yê gundiyan jî

parêzer. Lê ji serî û vir ve di nav gundiyan de kesekî bala dozger dikişand; bi tirkîya xwe ya debar, doza xwe bi oleke mezin diparast. Ev yek bêguman Sertîfê Virhewle bû. Dozger lewma ew gundiye xwînşêrîn û balkêş jî parêzer zêdetir dida axaftin, ji ber bersivên wî ew rûyê wî yê hişk dikenand. Virhewle, li vê derê jî hemû bal kişandibû ser xwe. Virhewle êdî bûbû berdevkê doza gundiyan. Gundî li ser hev dihatin diçûn bajêr, ji xwe re şahid diditin. Banknotên wan xilas dibûn, bêşeke nû diavêtin ser gundiyan, vê jî têr nekira çend mih diavêtin bazara firotinê. Pez difirotin, dê ji xwe re piçek dad bistendina.

Doz hêsan bû. Di hemû nivîsên nîv-resmî de ev zozan li ser vî gundî bi nav dibû, hemû şahidan jî bi vî awayî sond dixwarin. Dozgerê hêrs doz hinekî belesebeb dirêj dikir, lê doz jî li ser heqiyê çedikir. Sertîf dida axaftin; bi gotinên wî kêfxweş dibû, bêhtengiya xwe ji bîr dikir. Rojekê dîsa ji Virhewle pirsî:

“Sertîf, tû hê jî dikarî bibêjî alîgiri heye?”

Sertîf êdî tirsaxwe avêtibû, dengê xwe bilind kir:

“Na dozger beg, baweriya min bi te heye. Lê ez tişteki meraq dikim; Ev zevî û zozanên me gundiyan ên mezin çawa li ser wan maseyên araqê yên biçûk tên parvekirin. Ez nabêjim, lê tê gotin ku walî beg, serleşker û ecem li nik hev vedixwin.”

Dozger bi dengê xwe yê bihêrs û nîv-kenî digot: “Sertîf ez dikarim te aniha bavêjim hundir.”

Carinan jî li ser paşnavê Sertîf, mijareke bê eleqe vedikir: “Sertîf Kazma; ev paşnavê te hinekî ji min re balkêş tê, we çima ji xwe re paşnavêkî mîna çi bibêjim; das, ewr, beran nebijartiye. Virhewle dîsa bersiva xwe dizeliqand:

“Dozger beg biborîne, heta mezinên me fehm kirine ku Kazma ‘kuling’ e wezîfedarên we zû de ew kuling dabûn destên

wan. Ê kuling jî yê komarê ye, mirov nikare wisa bigire bavêje. Lê em hîni kulingê xwe bûne, di navbera me de tu pirsîrêk tune ne.”

Di navbera dozger û Virhewle de jî têkiliyeke piçekî taybet çêbûbû. Dozger hîni vî gundiye ecêb bûbû. Ji ber xwînşîrîniya wî, girêdana doza wî û xîreta wî ew rûyê wî yê hişk beşevêdihat. Doz êdî bi dawî dibû. Dora biryareşkerekirinê hatibû. Gorî ewraqên fermî, kirinên eceman û sondên şahidan, dozger gihîştibû biryarekê.

Dozger, beriya ku biryarê eşkere bike, çavên xwe gerandin, nêrinên xwe li ser Virhewle dan sekinandin. Bi ken got: “Sertif ger tu nexeyîdî, ez ê tişteki dawîn ji te bipirsim. Lê tu nexeyîdî.”

Sertif bi coş: “Na begê min, çawa ji te bixeyîdim”

Dozger dîsa kenîya: “Lo Sertif, biborîne. Lê ew jinên we pir qilêrî xuya dîkin, gelekî jî bêd in, ez bawer im bêhn jî ji wan tê. Hûn çawa debar dibin, bi şev dikevin hembêzên wan, iii, de fem bike!”

Sertif hêrsa xwe veşart, lê piçekî sor bû. Qirika xwe paqij kir û got: “Dibe ku wisa be jî. Carinan zehmetî çêdibe. Lê ger hûn jî nexeyîdin, ez jî dixwazim tişteki bibêjim. Bibêjim?”

“Çawa nebêjî Sertif” got dozger, bi xemekê.

Sertif dom kir: “Ger hûn qebûl bikin; rojekê, rojeke ku baran bibare hûn jinên xwe binin, em ê jî jinên xwe werînin. Em ê hemûyan bidin ber baranê, bila baran li wan bike û bişo. Di dawiyê de qilêra jinên me û boyaxa jinên we here. Em ê wê çaxê bi çavên xwe bibînin, bi kîjanê re debar dibel!”

Dengê kenê dozger, parêzer û gundiyan jî dûr ve dihate bihîstin.

Dozger heta demekê xwe sererast nekir, di dawiyê de bi aramiyekê biryara

xwe eşkere kir: “Di ronîya hemû şanî, ewraq û sondên şahidan de biryar hat wergirtin ku zozan ê gundiyan e û dê li ser wan fermî bê qeydkirin.

Biryar ne tenê di nav gundiyan de, li hawirdorê jî bû sedema coşeke mezin û hêvi xurt kirin. Virhewle û gundî jî aliyê kesên nas û nenas ve hatin pîrozkirin. Navê Virhewle êdî bûbû Sertif Beg. Navdarî û rûmeta Sertif Beg her diçû zêdetir dibû. Mîna şewirmendekî li hawirdorê ji bo gelek mijaran pê dişewirîn. Gundiyan jî du sal şûnde, di hîlbijartinên muxtarîyê de Sertif ji xwe re hîlbijartin muxtar, kesek jî li dijî wî nebûbû namzet.

Ecem, li benda dawîya dozê nemabûn. Şevêkê hemû kon û dewarên xwe berhev kiribûn û çûbûn. Payîz nêz bû. Êdî dema vegera gund hatibû. Lê Sertif û gundî, heta saleke dinê li ber xwe nedidan, dixwestin herin zozan. Ev zozan ji destê wan çûbû û ji nû ve hildabûn, niha mîna axeke pîroz dihatê çavê wan.

Sertif, muxtar û çend gundî, beriya ku vegerin gund, rojekê berê êvarê bi siwarî hatin zozanan. Li tevahiya zozan geriyan. Kavîrek serjê kirin, qeliyek çêkirin û xwarin. Agîrek dadabûn, li derdora êgir rûniştibûn û li benda kela çayê sekinibûn.

Sertifê Virhewle, ev demek bû ku ji gundiyan qetiyabû. Hespê wî li kêlekê wî diçêriya. Li ser wî girê dawîya zozanan jî dûr ve li wî bajarê mîna kumekî li serê axa welêt disekinî, dinihêrî. Sertif ji xwe re bacîkek vexist, düyê wê firand derdora xwe, nêrinên xwe li ser bajêr çik kiribûn û xwe bi xwe digot: “Ez ê li wê sûka navendê ji xwe re dikanekê pêlavan vekim.” Dîsa dest pê dîkir ew strana xwe digot: “Min Qersê dikan vekir, Xezalê...”

Dengê gundiyeke jî dûr ve li nik êgir dihat bihîstin: “Sertif Beg, de vegere çay amade ye, em dereng man.”

Li hespê xwe siwar bû, mîna brûskeke pekiya, ji ber çavan winda bû, çû.

Xewn

Kendal MÎREK

Gundê Zinar ne li ser rêya navçeyê bû. Li hemberî gundê Ginyanis ê girêdayî bajarê Sêrtê Dihê bû û navê gundê wan Îfaça bû.

Ji nişka ve ji xewê rabû. Heyvê hêj ro-niya xwe nekişandibû jor. Çavên xwe mizda û li dora xwe nihêrî. Dengê saetê hêj dihat guhê wî. Bêdengiyê wek şûrekî şev dixist bin sîwana xwe, Zinar hinek bi tîrs û hinek jî bi zorê ji nav cî û livînan derket. Bi gavên hûrik û sist berê xwe da derî.

Hêdî hêdî dimeşiya, dema hat ber derî çend deng bihistin. Dengê kûçikê wan Beşo û nawenawa pisikê û dengê kund tevlihev bûbûn. Piştê derî vekir û dîsa bi gavên xwe yên nerm ber bi govikê ve meşiya. Dema hat ber govikê ewtîna Beşo û dengê pisikê wek melodyeke nexweş di-domiyan. Deriyê govikê vekir û ket hundir. Golika wan li ber dayika xwe, xwe dirêj kiribû û şîr dimijiya dûre şalê xwe ji xwe kir, dikir ku mîza xwe bikira. Zinar êvarê pir av vexwaribû, ji ber wê yekê zike wî wek jinên ducanî xuya dikir. Hêdî hêdî û bêdeng karê xwe bi cih dianî. Piştê xişînyek ji quncikê govikê bihist. Dema berê xwe da wî aliyî, dît ku du çav di tariyê de xuya dikin. Piştî awirên wan ketin hev bi qasî çend saniyeyên din tiqetiqa jinekê bihist û bi ser de jî da qîran û bi lez û bez ji govikê derket. Dema hat ber deriyê malê Beşo li ber derî sekinîbû û kefeke spî ji devê wî dihat xwarê, çavên wî xwîngirtî bûn. Hema dikir ewtîni, piştê devê xwe vekir û xwe avêt ser Zinar.

Zinar bi qîrîn û hawar ji xewê rabû. Bê sekin digiriya û diricifi. Qîrîn û hawara Zinar jina xalê wî ji xewê rakiribû. Hema bi lez û bez xwe gihand odeya Zinar û Reşo. Reşoyê kurê xalê Zinar, ew jî bi qîrîna Zinar ji xewê rabûbû li ber Zinar sekinîbû û ew jî digiriya. Jina xalê wî dema ku dît ew her du wek koroyekê bi hev re digirîn, kenek li ser lêvên wê miselif bû.

Piştê ew dan ber singê xwe û her du teselî kirin. Piştî giriyê wan sekinî, jina xalê Zinar rabû da ku limêja xwe ya sibehê bike, dema ji nav cî û livînên Zinar rabû dît ku Zinar bi şalê xwe de mîz kiriye. Cî û livînên Zinar guherandin û şalekî Reşo li Zinar kir.

Piştî di ser vê bûyerê de çend saet derbas bûn bavê Zinar ji kar hat. Bavê wî no-bedarê şaredariyê yê şevê bû. Hema du yan jî sê meh hebûn ku dest bi kar kiribû û mala wan hê jî li gund bû. Zinar ji bo çend rojan hatibû ba bavê xwe û li mala xalê xwe dima. Wê rojê bavê Zinar wê Zinar bişanda gund ba dayika wî. Mala xalê wî li ber rawestgeha gund bû. Dema wextê rabûna erebeya gundê wan hat bavê wî xatir ji malîyên xalê wî xwest û ber bi rawestgehê ve meşiyên.

Bavê wî wê Zinar bi tena serê xwe neşanda gund. Lê mixabin rasterast erebeya gundê wan tune bû, ji ber vê yekê wê Zinar bi erebeya navçeyê bişanda gund.

Ajokerê erebeyê Hesên amadekariyên xwe yên dawîn dikir ji ber ku dema çûyîna wan hatibû. Bavê Zinar hat ba Hesên û jê re got: Hesên tu yê Zinar li gundê Ginyanis peya biki. Hema te kî dît jê re bêje bila ji avê derbas bikin ew ê here ba dayika xwe. Gundê Zinar ne li ser rêya navçeyê bû. Li hemberî gundê Ginyanis ê girêdayî bajarê Sêrtê Dihê bû û navê gundê wan Îfaça bû. Ajokerê erebeyê Hesên got temam û rêwiyên xwe li erebeyê siwar kirin û berê xwe da rêya Dihê.

Zinar dema li erebeyê siwar bû li kêleka jinikekê rûnişt û xewna wî ya ku bi şev ditibû hat bîra wî û tevzînekan laşê wî girt. Navbera bajêr û gundê wan nêzî sî

km hebû yan tune bû lê ev rê her tim ji Zinar re pir dirêj dihat dîsa ji dema di ber Çemê Botanê re derbas dibûn ew dîmenên xweşik û çiyayên bilind Zinar pir kêfxweş dikirin. Dîsa hatibûn ber Çemê Botanê û Zinar ji dîmen temaşe dikirin. Piştî çend deqeyên din hatin ser pira Çemê Botanê. Zinar ji vê avê pir ditirsiya ji ber ku jê re digotin aveke xayîn û bêbext e.

Dayika Zinar rojekê meseleya Çemê Botanê û Ava Sîtikê (ev rûbar di navbera gundê Zinar Îfaça û gundê Ginyanisê re derbas dibû.) ji Zinar re gotibû.

“Rojekê ji rojan Çemê Botanê gotiye: Bila ehd û eman li canê min ketibe ez ê her sal pêncî bûk û zavayan bixeniqînim.

Ava Sîtikê jî: Ma çima tu yê wan bixeniqîni ma wan çi ji te kirine?

Çemê Botanê: Ma çima mirov bi gemariya xwe her tim min qirêjî dikin. Ez ê ji tola xwe ji wan hilînim...”

Çiqas ev meseleya mîtosî dihat bîra Zinar ditirsiya. Dema ji pirê derbas bûn Zinar bêhneke fireh kişand û dîsa temaşekirina dîmenan dom kir. Li ser rê rastî gundê Bilorîs, Kelhok û gundê Hedîtê, hatin. Li wan gundan ji bilî çend pîrejin û kalemêran tu kes nemabû. Zinar hîna fam nedikir ku çima ev gund vala bûne. Dema nêzî gundê Ginyanisê bûn Zinar kelecani bû. Pir bêriya diya xwe kiribû. Piştî çend deqeyên din hatin gund û ajoker Hesên li ber malekê sekinî û bang li xwediyê malê kir: “Malîno kes li malê tune ye?” Xortekî nave wî Elî derket ber derî û got: Kerem ke xalê Hesên.

Hesên: Elî ka xêra de û bavê xwe tu Zinar ji avê derbas bikî, zarok e nikare here Îfaçayê, wê here ba dayika xwe.

Elî xortekî bîst û pênc salî bû. Ji lingê xwe yê çepê qop bû, ji ber wê yekê jê re digotin Eliyê Qop. Zinar ji erebeyê Hesên peya bû û bi destê Elî girt, ber bi bexçeyan ve meşyan, navbera her du gundan nêzî pêncsed mitroyî bû û Ava Sîtikê di navbera wan de derbas dibû. Elî û Zinar

bêdeng di nav baxçeyan re derbas dibûn. Zinar hê jî di bin bandora xewna xwe ya ku bi şev ditibû de bû. Zinar bi destê Elî girtibû û ji ber lingê wî yê qop hinekî ji Elî ditirsiya. Piştî çend deqeyên din hatin nav bîstanekî ku tê de darên spîndar, hilo, xox, mişmiş û hêjîr hene. Zinar hêdî hêdî dimeşiya û li dora xwe mêze dikir. Dengê çivikan, xuşexuşa avê û çend dengên din ên xwezayî bihîstin. Çend gavên din avêtin, Elî sekinî û li Zinar temaşe kir. Zinar fam nekir ku ka çima Elî sekinî û li wî temaşe dike. Elî li dora xwe nihêrî û dît ku dengê tu kesî nayê, ji Zinar re got şalê xwe daxe... Zinar fam nekir ku Elî çima dibêje şalê xwe daxe. Hema dîsa kir qîrîn û dest bi girî kir. Zinar bi îskeiskeke bêsekin digiriya. Elî got: Lawo negirî, temam ez ê te derbas bikim, Xwedê bela xwe bide te tu yê me bihetikînî...

Piştî Eliyê Qop bi destê Zinar girt û ber bi rûbar ve meşyan. Zinar digot qey wê Elî tecawizî wî bike û wî bikuje. Lê Elî qop bû, nikaribû Zinar deyne ser milên xwe û wî ji avê derbas bike. Wî jî şalê xwe ji xwe nekir û bi wî halî Zinar derbas kir. Êdî ji gundê Ginyanisê hatibûn gundê Îfaçayê. Hema Zinar xwe ji nav destê Elî xilas kir û bazda. Elî jî serê xwe hejand û çû ser karê xwe yê rojane.

Zinar çawa çivîkek ji nû ve azad bibe dikir ku bifiriya bi bazdana xwe ya gavên hûrik û sist ve ber bi malê ve diçû. Ji nav baxçeyan derbas bû û ket ser rêya gund. Dema hat ber hewşa malê dît ku tu kes li ber derî tune ye û devê xwe tijî kir da ku bang li dayika xwe bike. Di wê navberê de çavên wî li Beşo ketin û got qey hê jî di xewna xwe ya nexweş de ye, dîsa da ber qîran, dayika wî hema ji malê derket û ew da ber singê xwe û ew teselî kir. Piştî ketin hundirê malê. Zinar serpêhatiyên xwe yê şevê û rêwitiya xwe giş ji dayika xwe re got. Qala pîrhevoka di xewna xwe de dîtî kir, dîmenên Çemê Botanê û gundên tê de derbas bûyî kir. Lê tenê qala meseleya xwe û Elî nekir.

Çend gotin berev HEWARÎ'yê de

Yunus EROGLU

Nabokov di destpêka dersên xwe yên li ser Don Kîşotî yên li Harvardê de radigihîne me ku diyardeyên dahênanê tune bin dê diyardeyên rasteqîniyê jî nebin, piştî ku qal dike ku divê çu carî ev her du cure diyarde bi hev neyên guhestin

Wê çi bibûya ger ku Tolstoyî Anna Karenîna nenivîsandibûya? Yaşar Kemal dibêje ku “min çil pirtûk nivîsandine, li derdora çil zimanî hatine wergerandin, sih salan berendamê xelata nobelê bûme lê ku cardin bihatima dinê, min dixwest ku ajokarê trektoran bûma”. Xwene Yaşar Kemal ew çil pirtûk nenivîsanda, ji xwe re ajokariya trektoran bikira dê çi bibûya? Ma piştî vî qasî jî, hîna ew êş û kulên ku wî dikişandin û tîrî serê mirovahiye, li cîhanê roj bi roj dijiwartir nabin? Van her du hostayên mezin nenivîsandinbûna, nebûna dê çi kêma bibûya ji cîhana me û cîhana wêjeyê? Dibe ku em ji kartêkeriya wêjeyê ya li jiyana rojane û rasteqîniyê ne xweş û ne qayil bin, hebûna qiyametê nexweşî, çewtî û êşan weke bîfêdeyî û betalbûna wêjeyê bibînin û bibêjin Anna Karenîna, çil pirtûkên Yaşar Kemalî hebûn çi ye tune bin çi ye? Mîlan Kundera di romaneke xwe ya navdar, *Sivikiya Hêzşikîn-Zordest a Bûyînê*, de, nîşanî me dide ku heke careke din û jiyanêke din hebûya, mirov dikaribû bersivê ji pirsên wiha re bibîne. Ev e wêje, cihê ku wê jiyanêke din a ku pêkan bû ku bibûya lê nebûye em bibiranê, em bixistanê jî nîşeyî mirovan dike. Loma Turgenyev di nameyeke xwe ya ji Parîsê de tika dike ji hostayê mezin, “ji kerema xwe re vegere wêjeyê,” piştî ku hosta dest ji wêjeyê dikêşe. Yaşar Kemal jî pêlekê paye, lê nihêriye ku bîyî wê nabe, ji cihê ku maye li vî rîya ber xwe kudandiye. Cîhana nivîskar bixwe jî heye û tixûbên vêya jî tu kes diyar nake. Ne li vêya ne li

ya ku dibû ku bibûya.

Û wêje, hûn çiqas havilkar, fêdeparêz û civakperest bin jî tenê bi pîvana gihaştina wê ya armancên derberhemî yên li cîhana rojane û rasteqîniyê nayê hêlengandin. Lê ev naye wê wateyê ku wêje karekî wiha jî nake. Her çiqas ev ne helwesta sereke ya her nivîskarî be jî. Helbet ji dêvla rastiye, bijartina pîvanên weke “xweşîkî” yan “watedarî”yê jî helwesta nivîskarekî diyar dikin.

Nabokov di destpêka dersên xwe yên li ser Don Kîşotî yên li Harvardê de radigihîne me ku diyardeyên dahênanê tune bin dê diyardeyên rasteqîniyê jî nebin, piştî ku qal dike ku divê çu carî ev her du cure diyarde bi hev neyên guhestin. Vêya bi heman awayî li ser ramana Nietzscheyî ya mêjûyî ku dibêje “rastî dahênan e,” rûdinê. Lêbelê, berevajiyê gumana demildest, ev diyarde ne rastiye dike tişteki bîhîm û çors ne ji biha dahênanê ya di xuyakirin û nêzîkirina rastiye de betal dike. Dahênan jî rastiye dîr nake, me digihîne wê, wê bi me dide fehmîkirin. Loma Anna Karenîna, kesayeteke dahênanî, dikare me ji jîneke li derdorê bêhtir nêzîkî rastiya jînekê bike û xwezaya Yaşar Kemal qet ne kêma ya me dorpêç dike ye. Carina, ya ku mirovekî dike nivîskar jî bersiva ku ji bo pîrsa, “kîjan Anna Karenîna rastir e, ya li derve yan a di nava pirtûkan de?” hildibijêre ye.

Evê destpêka ji bo dabaş û şabaşa romaneke kurdî ye. Navê wê *Hewarî*, nivîskarê wê Heciyê Cindî ye, ji qewla

gotinbêjan. Vê romana di koç, rêbiwarî û cîwarbûna êleke êzdî de êş û kulên civaka kurdan vedibêje, li gorî gelekên. Lê ya cihê metelmayîn û cihêwaziyê ew e ku ev roman weke gelekên bi angaştê vegotina êş û kulên kurdan hatine nivîsandin bi ramanekê, bîr û baweriyekê nehatiye çarçovekirin û dariştin. Şabloneke wê ya pesendkirî tune ku ristek bi qarekterina ve were kirin, kirasek li çînekê were kirin. Ne dibêje axa xerab e û xelas, ne jî dibêje xulam baş e û xelas. Ne jî dibêje Rom reş-tir e jî Ūrisetê. Rastiya cîhana serpêhatiya di pirtûkê de dirêse û diparêze. Di rewşa herî asê de jî li gor raman û darazan naçe, di belengaziya êla ku ji baranê reviya li terezê qewimî de vegotina ometek bûyer û qewaman nahêle ku xwendevan ji bo kesekî di romanê de fikreke sabît xwedî bike. Ev, di heman demê de, li gel dubendiyên kesayetan ên cur bi cur dihêle ku xwendevan ji li rûberî wan gelşan bersiv û bertekên amade peyde neke, ew xwe bi xwe jî têkeve dubendiyan. Bo nimûne, tevî ku bûyer û mijara wê hema bê jî heman demê ye lê di hîneke pêştir, di germ û gorana şoreşa Sovyetê de hatiye nivîsandin, *Şivanê Kurmanca* (1935) di hilgirtina xwe ya qerekeran de rijî û hişk-tir e. Herçî Egîd-axayê ku şîmaq û pihênê li şivanê Kurmanca, Erebe Şemo dixê (ew û Egîdê Axê yê *Hewarîyê* heman kes in an na, ez jî vê ne serwest im), di hikayeyê de çiqas kêr derbas bûbe jî xwendevan amade ye ku bi yek derbê re weke kesekî nekes ser wî xêz bike, lê tevî ku qîzikekê bê dilê wê direvîne û pê re xweha wê di-kuje û bertildayîna bavê wê ya ji bo ku qîzîk di dadgehê de devê xwe biguhere û ji doza xwe bikeve erê dike Egîdê Axê yê *Hewarîyê* bi dilketina xwe, hêsiya xwe ya li sirgûniya Sîbirê, kesîretî û şerpeze-tiya tê de, zewaca ku li dijî rê û rismên êz-dîtiyê dike, fedikariya wî ya li pêşberî êl û civata xwe weke wêneyekî pireng di romanê de cî digire. Heciyê Cindî bi fehm û feraseta xwe negotiye hema ez axayekî biafirînim bila ew wiha be, bila êlek bi vî rengî be, bila çandek û kêmarek bi rê û

rismên xwe, neçarî û bêpiştiya xwe her û her li gor hêmana şablonekê be. Heger werê bûya mebesta wî, ew ê di nav wê “êş û kulan” de tenê mirovên mexdûr biseri-diyanan, çewtiyek, hesûdiyek, berberiyek, neqenciyeke, fexr û fuqriyek, an başî, pakî û duristiyeke hol nedibû. Di “xêzik”ê de hûn pêsiirtengî û êş û zora li dora êzdiyan tê jidandin dibînin, ji aliyê din ve jî bi qedexeya nivîsîn û zewaca “şiletê”, derci-maetê re êş, azar, kêmanî û tengayiya ku ev rê û risma olî di jiyana mirovên xwe de pêk tîne. Van xisletên dijber di kesayetekî de, di civatekê de, baweriyekê de rû dane ji ber ku nivîskar ji bo vedîtin û vegotina rastiyeke dehf daye pênûsa xwe, ne ji bo pesendkirina rastiyeke. Ji ber ku dahênan tenê rastiyan nabêje, wekî me got, rastiyeke nû jî diafirîne. Ya ku di goraniya jiyane de tiştêkî ji me re dike rastî, bal û dêhna hunerî û dahênanîya nivîskêr e ku di ser diyardeyan re dipele. Ji lew re ev ne romaneke ji rêza qalibên wêjeya Sovyetî ya wê demê hatî dariştin e. Ji ber ku ev roman, bi dengêkî nizm an hêlî, bi newayeke zelal ji wêjekarên me re bang dike ku romaneke “ji bo vegotina kîjan rastiye hatibe nivîsîn bila, ancax dema ku karibe rastiya xwe vebêje hêja ye.”

Hêleke din a hêjayî gotinê jî, dewlemendiya ferhenga wê ye ku Heciyê Cindî ew nexistiye pêşiya ristina bûyer û salox û şayes û lehengan, lê pê hêz daye vegotinê. Ji bo hezkerên kurdî, nexasim ferhengvan û zargotinzan, di gelek waran de bêje, biwêj û gotinên “am û tam” ên rûyên kaxetan nealastî tê de hene ku berhevoeke berfireh pêk tînin.

Hewarî di 1965'an de temam bû û di 1967'an de li Yêrîvanê çap bû. Lê piştî 42 salan, di sedsalîya bûyîna nivîskarê xwe de li Bakur hat weşandin. Vêca Heciyê Cindî nêzikî sed, sedûpêncî xebat û berhemên xwe pêk neanibûya, romana *Hewarîyê* nehatibûya nivîsîn wê çî ji me kêr bibûya?.. Di heftê û çar salên ku ji bo çapkirina resen a yekemîn romana vî zimanî, *Şivanê Kurmanca*, hewce kirin de

her çi ji me kêr bû bêhtirî wê. Ne ji bo çepikdan û lilandina ji berhemekê re weke abîdeyeke serfirazî û şanaziya me, ne ji ji bo pesn û pesendkirina nav û berheman a weke di tariyê de xwe kilkirinê dibêjim vêya. Her berhema ku derfeta hilbijartineke wêjeyî dide xwendevên, asta rexneyê ji bilindtir dike.

Kî dizane, roja ku berhemên wî yên mayîn ji ketin civata me belkî em çêtir bi ser ve bibin ku heta wê gavê çi ji me kêr

bûye. Lewra piştî ew qas salan û ew qas kedê hîna berxaneyê mezin a wan berheman li vî perçeyê mezin belav nebûye. Vêca Heciyê Cindî ji nû ve bihata dinyayê, jiyanekê wî ya dîtir çêbibûya, îcar wî yê bixwesta ku bibe çi? Tabî mirov dikare werê jî lê binihêre: Ger ku piştî heftê û çar salan romana yekemîn a bi kurdî bi halê xwe yê resen û piştî çil û du salan romana yekta ya Heciyê Cindî li vî hêlê hatibin çap kirin, nexwe tiştên xweş ji dibin.

Ji jiyanê re çend gotin

Yûsiv BIYANÎ

jiyana tewşomewşo
di dilê min î reben de
payîzên sar ava dike

seqemê li min girtiye
sergomekî serhişk im êdî
nêrînan li deman siwar dikim
winda dibim di xwe de
kes li min nagere
di bin qeşayê de dirizim

venagerim ji çûyînê
bêhêz im
li ser riyên bêdawî
di fikran de dikulêm
bi guman in carnan
di xewên xwe de diherimim
xwe ji xwe pirs dikim
di bersivên xwe de dinalim

ji ber tirsan
hin caran pirsan dikujim
bi tariyê xwe dipêçim
jehra marê kor dialêsim
dîsa jî namirim

hemû şahiyên xwe berhev dikim
dîsa jî nikarim şoreşan pêk bînim

devê min bi xwîn e
gotinên min nexweş ketine
hemû bi pêncşerê mirine

destê min kêr e
li ku dera laşê min dikeve
xwîneke reş dipeke

nizanim
jiyanê ji jiyanê dişêwirim
pîrsên çewt dikim
nezan im
şikestinên nû pêk tînim

boçûnên topal diwelidînim
li xwe venagerim hîna jî
dikim xwe bi xwe bidim kuştin!

Ax hestiyê min ax!

Omer DILSOZ

Ji bo sêseriyan Bestan çiyayê herî pîroz bû... Sêserî bi Bestanê radibûn û bi wê dinivistin, her tiştê wan ew çiyayê berz û bilind bû, Bestanê çarmendorên Sêserê pêçabû; ew rêzeçiya bû, ji rojhilatê gund dest pê dikir milekî wê ji başûr yek ji bakurê gundî ve digihîştin hev

Dîmena gundekî...

Li ber pala çiyayekî bilind, di nav dehl û daristaneke keskeşîn de. Gundekî beral; xanî ji hev dûr û kitî kitî... li ser sê girên miqabilî hev di nav hêşînahiya darên hewr û spîndar, sêv û gûzan de warêkî xwedan spehîtiyeke bêhempa, Sêserê... Gava mirovî ji çiyê ve li gund dinihêrt mirovî digot qey rêl û bîşiyêke tarî ye. Malan xuya nedikir. Bi qasî çil malî li tevahiya gundî hebûn; lê xanî di nav dehl û daran de ewende kitî kitî bûn, heke agir bi malekê biketa cîranê wî pê nedihesiya.

Sêseriyan jiyara xwe bi ser çandinî û ajaldariyê dikir; li derveyî gundî, li bintara çiyayê Bestanê govên wan hebûn. Navê vê derê Bergovan bû. Her roj danê tavgermk û berêvarî dihatine vê derê pez û çêlên xwe didotin. Ev warê wan ê bêrê bû. Navrojê jî, şivan û gavanan pez û gareşê gundiyan dibire ser mêrg û çerwarên têrxwerên li panav û qûntarên çiyayê Bestanê...

Ji bo sêseriyan Bestan çiyayê herî pîroz bû... Sêserî bi Bestanê radibûn û bi wê dinivistin, her tiştê wan ew çiyayê berz û bilind bû. Bestanê çarmendorên Sêserê pêçabû; ew rêzeçiya bû, ji rojhilatê gund dest pê dikir milekî wê ji başûr yek ji bakurê gundî ve digihîştin hev. Lê gir û koxên mezin, zinar û hisarên asê, berken û berehên mezin li rojhilatê Sêserê bûn, li wir, li sertara Bestanê çu carê keviyên befrê nediheliyan. Li dol û berdolên wê her demsalê befr hebû, ligel bi sedan celebên kulilkan ên wekî nêrgiz, sosin, alal, beybûn û gulnixwînan her weha ajalên

kovî yên wekî pezkovî, rûvî û kûje, hircên boz, gur û keftar, kew û kewderî rewş û xemla vî çiyayê berz û bilind bûn. Lê rojavayê gundî çiya tune bûn, ew der heta çavên mirovî qeder dikir bi deşt û leylan bû, ji wê derê re Geverok jî dihat gotin ku beralên wê xwerû gund bûn, gundê herî nêzî Bestanê bi piyan riya saetekê bû...

Bûyerek li vî gundî...

"Hêdî bikole" jê re got Emre,

"Gelek kûr nîn e"

Hemû awir bi meraq bi ser wî de şikes-tin.

"Gava binax kirin ez li hindava serî bûm" got Emre û xûso serê xwe di ber xwe de xwar kir.

Hestî... Ji nav axê komikên hestiyan derketin: Du kulox, lûlikên dest û piyan, parsû, kerikên milan, yên destan...

Ji bilî dengê tûka ku ji latan deng vedida ew der ker û lal bûbû. Wisa heke te derziyek biavêta dê tingîniya wê mirov veciniqanda...

Sînemê xwe daqul kir ser hestiyan, hêdî hêdî ew vedidan... Hestî ji axê derdike-tin; axê hestî diza. Hestiyên her duyan têkel hev bûbûn; mirovî tê dernedixist kîjan yê kê ye; ancax bi biçûkî û meziniya wan bizaniya. Çi ku, hûrik hûrik hestî di nav hev de winda bûbûn...

"Ax dayê"ya Gulê, kirasê bédengiyê çirand,

"Wey mala minê; wey ez bo we nemamo, wey konemêro, wey li minê pe-

pûkê, wey li minê xwelîserê!” got û her ku çû hawar û zêmara wê zêde bû. Serê xwe kir paxila Zînê û hûrik hûrik giriya.

Dûre kir qîjînî,

“Ax dayê, ez nemînim bo van xerîban...”

Awirên xwe har kirin û bi ser Emre de dageriya û lê heyitand,

“Emre, ma we çi ji wan xwelîseran dixwest, ka bêje ma van rebenan çi li we kiribû?”

Serê Emre di ber de xwarî erdê bû; bi kizgirî bû û rast çavên xwe kutane nav çavên Gulê û bi kelogirî lê vegerand,

“Metê, bêje... Kerba dilê xwe gişî bi ser min de birêje. Ez ê xwe neparêzim; ma biparêzim jî bê fêde ye. Erê, ez jî wê rojê li vê derê bûm. Ez jî şahidê wan rojan im û her tişt li ber van çavên min qewimî. Min her tişt dît. Ka çi dek û dolap hate gerandin... Ez şahidê wê bêbextiyê bûm. Bêje ezgorî, rika xwe gişî bi ser min de bişikêne û hez dikî were çavên min yên bûne şahidê wan rojan, wê bêbextiyê li vê derê birijîne lê bê mifa ye; agirî cihê lê ketî sotî ye. Çû!... Û va ye ez li vê derê me. Li ser koma hestiyên. Min dikaribû qet nehata û min jî wekî bi bîstan şahidên vê û bi sedan bûyerên weha serê xwe bixista xîzê û wekî hêştirmeyê xwe li bédengiyê daniya. Bawer bike, agirê hinavên min dê ez bişewitandima lê min ê xwe lê bigirta û deng nekira... Metê, ez qurban; bêje, erê ez çi bêjim jî ez ê nikaribim sotiniya dilê te hênik bikim û bayekî hûnik bi ser dilê te de binim. Lê va ye ez li vê derê me... Wek gunehkarê wê bêbextiyê... Va ye ez li ser koma hestiyên im... Ka em çi bikin bi van hestiyên... Bi wan hestiyên ku niha ruhên wan li jor li me temaşe dikin û belkî li hindava serê me hewarê ji me dixwazin û bûne xewnerêşkên şevên me û em anîne vê derê: Pişti salan be jî, hiştibe ku em qe nebe hestiyên wan jî nav hev derxin û binin di goristanekê de binivînin... Erê metê, ez Emre; komandoyê bi-jarte; şahidê wan rojan... Şahidê herî

dawîn yê hawara van bêhawaran bihîstî. Şahidê herî dawîn ê bêhna xwîna van bêgunehan herikî nav vê axê. Min ew tirs, ew êş bi çavên xwe dît, bi dilê xwe seh kir û va ye ez li vê derê me.”

Gulê xwe negirt. Ripo ji cihê xwe rabû, kulma xwe ya tijî ax bi nav çavên Emre de dakir û destê xwe xistin qirika wî û ew çend caran vehejand. Piştî heçohîç giriya û dîsa serê xwe danî ser paxila Zînê û got,

“Zînê, keça min! Ka qurtek av bide meta xwe”

Sinemê peta xwe ya avê avêt ber û serê xwe ji nav koma hestiyên rakir û bi ser wan ve zivirî: Porê Sinemê gijgijî bû û bi nav çavan de şorî ser rûyê wê bûbû. Dîlopên xunavê hûrik hûrik avêtibûn ser rûyê wê û çavên wê yên belekî repî hişk sar sar li valahiyê dinihêrt. Bayekî tîrş î bêtêrif ji awirên wê dişûjiya.

Çavên wê wekî xwînê sor bûbûn.

Nefeseke kûr berda. Hema dîsa xwe xwarî ser koma hestiyên kir; kulma xwe tijî ax kir û bir ber bêvila xwe: “Bêhna hestiyên, off çî bêhneke cuda ye” got û bi dengêkî bilind kir qîjîn:

“Ey Bestan! Bestana min... Çiyayê welatê min; çiyayê zaroktiya min... Va ye ez bi hestiyên te re me... Bêhna hestiyên ji te tê, bêhna hestiyên rizî... Hestiyên genî... Hestiyên min! Va ye ez li ser bedena te me ey Bestan! Ey warê qertelên asî, bazê nêçîrvan, kewa ribat, heyloyê hestîxur! Ey Bestan; ca çavên xwe veke û bibîne van hestiyên... Van hestiyên têkel hev yên dihevreçûyî, yên têkre berzebûyî, yên du nîfşan; du nîfşên bi yek derbê ji holê rakirî; du çirayên bêden tefiyayî, du stêrkên bêwext rijiyayî... Ey hestiyên min; va ye ez li vir im, êdî ji xewna min derkevin, va ye li gaziya we hatim. Va ye ez li nik we me; de kerem kin, li goştê min hilwerin; de kerem kin, li ruhê min werbên; de kerem kin, li dilê min hilwerin!... Ey Bestan! Palpišta Sêsera min, bi tîrêjen ji pişt te dihatin ronahî dihat ser jiyana min; çî gava bêhna min teng dibû, min li

balayên te dinihêrt û xewan koç dikir ji ser xeşîmedilê min. Çi gava rika min radibû, ez ber te ve dizivîrim wekî dayikekê te bi xwe re dibirin hemû êş û janên min... Ji roja ez ji te bi dûr ketime heta îro her tim bi xweziya dîtina te min xeyal mezin kirine di hişê xwe de û bi hizra te rabûme nivistî me... de bide min hestiyên min!”

Sînemê xwe çengî axa ser hestiyên kir, veda; piçekî dîtir veda, heçko li tişteki bigere, piştîre dîsa veda... Ew çi bû? Erê erê, tişteki bi ber destê wê ket... Aha dişibe berbiskekê. Di gavekê de hilgirt, girt nav lepên xwe; erê erê, wê ew nas kir, ew berbisk... eynî dişibiya berbiska zarokekê; keçikeye çardehsalî ya terotol...

Berbiskeke zer!

Sînem û berbiska zer; berbiska zer û Sînama Sêserî ya çardehsalî wekî pêleke har bi ser dilê Sînama parêzer de hatin xwarê. Berê ji çavên xwe bawer nekir; ew çend caran vemalî, lê rast bû, berbiska wê, ew berbiska ku bi berdêla maçeke dildemayî... Kûpê ava tijî hestî maç kir...

Dilê kuloxê serê miriyekî; girte ber hem-bêza xwe û maç kir. Bila bi hezaran berbisk gorî te bin... Ax xwezî min ew keser li ser dilê te nehişt! Bêjo! Çardehsalîya min a zer! Çardehsalîya min a winda! Berbiska min a keçkaniya bi xewnên sorgevez xemilî. Ax Bêjo! Ax ronahiya her du çavên min!...

Kela dilê Sînemê rabû; êşan govenda xwe li ser dilê wê girêda û janan dest bi lêdana bilûra bîranînan kir: Berbiska min!

Bestan zer zer digiriya bi Sînemê re... Ji wê rojê ve ye, min berbisk nexistine ber bisk û keziyên xwe Bêjo, ji wê rojê ve ye, min berbisk nedane ber guliyên xwe dilo! Piştî wê berbiska zer min çu dest negerandine ser biskên xwe êşa dilê min a berpenî, kula dilê min a vedizî!

Sînem sîn bi sîn giriya... Hestî bi hestî rondik barandin.

Sînemê berbiska zer di ber biska xwe re kir!...

(Hilmek ji Romana Berbiska Zer)

Li ser mijangê hinekirî

Jan ZIRYAN

gava ku canê min bigihê canê te
wê xwîn bibe rûyê erdê tevde

wê ji qîzanî bikeve dinya
tav, ew ê bibe bav
stêrk, zarok
heyv, dê
ew ê bigirî ji kêfa, Xwedê

bidestdana min î dilê te
ew ê bimirin kevok
ku lêvên min î kilkirî
bigihê mijangên te yî hinekirî
wê her der bibe lehî û erdhejok

Giliyek bo kulîlkan

Îlhan Samî ÇOMAK

Lêva yarê sor e û dengê min nizanim çi, de were em ê li bin dara tûyê, tevî siwarên gerdûna eniya min çarmêrkî rûnên

(...)

Laleyên min ji ber jenga diranên hespan avis bûne.

Şêrên xwîna çonga min ezmanan dialêsin.

Li ber neynûka lingê xwe guran dizûrînim. Meyên mêrgên çeqer bi tûka min dimeyên. Ba li min dixê û kumika min di kaşên serê derziyê de gêr dibe

Di-rê-se. (Ev teşîya dapîra min e)

Li ber êvaran ku di hevoka min de kirde ne, agir dadidim. Dar û daristanan digurêm. Kêrên min ji ber xwîna kîrê Xwedê sor in.

Westiyam. (- Çima te ker dîxesand. Ev gotina bavê min e)

Ez bi sihûd im. (- Qûzê dêlegurê pê ve ye.) Rehma Xwedê li giyana apê min be.

Min bi daxan bedena xwe kizirandiye. Peyvên min ên hesinî layî lehengên lepên xwe dadiçikînin dîrokê. Tasek av vedixwim û bi kêranqên tavê, ezmanan berhev dikim. Li daristanan, li bêdirên bê gam li qûntara rûyê yara xwe siya birûskan gez dikim. Ewr disewisin.

(Ji sibehên zêrîn re me hespên xwe bi zîn fikir. Bajar dût bû. Me ji kolanan û ji bircên dahatûyê, me ji ferhenga beravêtî hez fikir. Ta ku li ser lêva yarê rahêja cîhanê lê dixist û bêhna pûng û rîhanan xwe li henasa min dipêçand. Bedena min ava xwe şêlû fikir û ranên min lehî radikir.)

Çiqên min ji şaneşîna ewran re daholê lê dixê. Jixwe zendên min heft perên qeraxên dîroka nenivisandî ne. Ê îro di devê min de tahma zerdalî... Çepl diavêjim, bi peşkên avê rûyê xwe zimpere dikim. Çi-

rûskên kulma xwe didim ber rindeyê. Evîna min jî hilû ye. (Siya min ket ber bayê hilperandinê. Dîrok pincik diavêt. Lê di devê me de "Ya Star!" Em bûn qeşengên deşt û zozanan. Bila çiya dexesiyê nekin!) Di bin perçemên min de avjeniya pîşîngan kevz digire. Di niftikên bihuştên min de heyv û heyvînek dikemile. Paniya xwe li erdê dixim û hêza min berzî ezman dibe.

2.

Bi dengê fitika xwe mêraniya çivîkan diceribînim

Derdikevim der, gavên fereh diavêjim

Di kendalên pancika xwe de şîrqîniya pêlên deryayê vediçirînim

Kumberfên newqa min di azmûna avê de serê xwe ditewîne

Roj û barana tenêtiya yarê

Hemû şîretan piştguh dikin

Di dîwarên deryayê de zîngîniya gavên gêrikan...

Min hesinên derdê xwe bi şûrên newalan nerm kir

Ava Xwedê di bin çengê min de sar dibe

Bizmarên ronahiyê dadiçikînim qoqa serê nezanan

Lêva yarê sor e û dengê min nizanim çi

De were em ê li bin dara tûyê

Tevî siwarên gerdûna eniya min çarmêrkî rûnên

-Îcar ji te re vebêjim. Sonda min

Bayê sayî ye. Çengek av vedixwim û

navek didim agirê hinava xwe; sor. Serê
xwe dixurînim û bi masiyên gundê me
rengê kûrahiyê didim dengê xwe-

Kils

Kilsss a dilê min dikele di bin siya
çavên te de

Ji dût ve dengê kezextina keskesora
devê yarê tê. Erd diqelişe, per û baskên
çivîkan dişikê, di rahêja min de gûzanek
tehma xwîna min vedixwe. Îro bi qasî çî-
yayan westiyame, nizanim çima. Rûyê
min di hênika hiya êvaran de winda dibe.
Ez şev û rojên we di jenga çavê xwe de kin
dikim, bi lepên tavê tariya gotinên we di-
rûçikînim.

Ez ê paşê ji we re vebêjim, lê min giliyê
kulilkan kir. Ji ber ku ba nedigobilî. Di
pelgên razên min de sebra dîrokê hatibû
xêzandin. Di dilê min de jana şaristaniyê.
Heçko xofa xwe dibêjim. Ez ê giliyê kulil-
kan dikim. Ji ber ku baran nabare û bê-
xewî rik û gir kiriye. Wa ye silaveke ji dil
didim, wa ye hêrsa min radibe.

Tu bi xêr hatî xortaniya min

-Nizanim ez di kîjan çîrokê de winda
bûme-

Dixwazim bala we bikişînim ser te-

menê xwe. Ji ber ku siya min diricife di
bin pelgên dara çinarê de. Merxên textan
ji eyloyan re dibin hêlin. Erê, carna ez di-
biriqim, hişê min serûbin dibe. Êvar ji
min dût in. Ba kesp û kospên e û di qur-
tik av de di darek kor de di vingîniya
beran de vedipere dilê xwe

-Kespik.

Ji kevirên me kûsî neman li gundê me.
Ax razên zarokatiya min. Tika ye deriyê
xwe negirin. Tika ye di şaneşîna xwe de li
cem heyvê, li cem sêniyek zîvîn li cem pa-
yîzê li cem çokeke nûxwîndayî şûn vekin
ji min re.

(Yara! Çavê te zarokekê kil dike

-Ew ê ku xwe kil dike, tevî hêlekana
tevî stûn û kêrangên tevî werîsan û kaşo-
vanên gewre ku di xewna min de bi go-
geke ku qasî gurzê Ristemê Zal dilîst,
dûriyên ku li dilê min kon li dar dixistin û
ava me şêlû dikirin û ji ser zimanê min
bêjeyên min didiziyan û zûzûka ji min hez
dikirin û di destê min de dibûn bazin, di
lingê min de dibûn xilxal û gul gul gul di-
gotin ji min re...tu yî can)

Ez giliyê kulilkan dikim; Bîn vedidin!!!

30.09.2008

Mêrga kurdî

Dilşêr BÊWAR

Di bédengiyeke helbestî de
Li mêrga kurdî diçêriyam
Di bin siya bîst û heşt sêdaran de
peyvên serijêkirî diperpitin

Ey Xwedêyo
Ji paşîla ezman bêhna sêvan difûre
Lek bi lek diçilmisin gulên çiya
Ruhistîn teşîya kurdî dirêse

Min di kevçiyê felekê de av vexwar
Lê tibûna dil netemirî
13.06.2009

Di Mem û Zînê de şopên hunerên şêwekarî

Fewzî BÎLGE

Mem û Zîna Xanî angî kîtêba kurdan xuya ye wê demeke pir dirêj kîtêba kurdan be. Wê hîn di gelek dem û dewran de roniya xwe bide civaka kurdan, bêhtir jî huner û hunermendan

Ehmedê Xanî û berhemên wî ji aliyê gelek nivîskarên kurd û biyanî ve û ji gelek hêlan ve hatine nixandî lê xuya ye ku wê hîn gelek dem û kesên din û ji gelek hêlan ve jî bîr vekolandin, şîrovekirin, nixandî û peyitandin.

Ev nivîskar û lêkolînan di berhemên wî de heta niha bêhtir li ser hêla wan î felsefî, ziman, wêje, muzîk, sembolîzm, civak, fikir û raman, dîrok, neteweperwerî, evîn û hwd. rawestiyane. Ehmedê Xanî di nava nivîskarên -wêjevanên kurd ên klasîk de li gorî din û a niha yê herî bi sîhûd e.

Ez bawer im di demeke herî kurt de wê gelek kes û lêkolînan dest bavêjin klasîkên kurdan ên din jî û ez di vê baweriyê de me ku kesên mîna Feqiyê Teyran, Meleyê Cizîrî, Elî Herîrî û bi dehan kesên din hema hema ji gelek hêlan ve bi taybetî jî di hêla helbestê de ger ne jê xurtir bin jê ne hejartir in.

Mem û Zîna E. Xanî angî kîtêba kurdan xuya ye wê demeke pir dirêj kîtêba kurdan be. Wê hîn di gelek dem û dewran de roniya xwe bide civaka kurdan, bêhtir jî huner û hunermendan.

Di Mem û Zîna E. Xanî de ji bilî hêla wê ya felsefîk, neteweyî, civakî, dîrokî, evînî, wêjeyî welatperwerî, hwd. bêhtir ya ku herî pir bala min dikişîne û min dilşad dike di berhema wî -Mem û Zîn- de şopên hunerên şêwekarî ne.

Di berhemê de pir eşkere xuya ye ku E.

Xanî hîn di wê demê de hay ji hunerên şêwekarî heye û di derbarê hunerên şêwekarî de xwedî fikir, raman û sirûştî ye ku bi hêz e.

Di Mem û Zînê de di rûpela 483'yan de qala wênesaz Manî û tabloya wî ya bi navê "Erjeng" dike. -Erjeng tabloya wênesaz Manî ya herî pir tê zanîn e.-

"Fehhasî te kir pir rengê Xanî

Neqqaşî te kir misalê Manî"

Di rûpela 281'an de:

"Goya bi edep edîbê tencîm

Cedwel kiribû bi hellê şîmab"

Di rûpela 281'an de:

"Elwan jî xitû tê sebz û mişkîn

Her yek dikirin beyanê ehkam"

Di rûpela 342'an de qala peykeran dike:

"Ew heykelê metleba mecazî

Bû melebê metleba mecazî"

Di rûpela 269'an de:

"Rûyêd-i wî ger çî her di têr bûn

Manen dê xizamê, lekî zer bûn

Ariz qewimî li neynikê jeng

Rewnaq çû nema li neqşê Erjeng"

Di rûpela 483'an de dîsa:

"Ji kola desen û desîna toran dike.

Ey Xame! Te jî gelek dirêj kir

Ev name, bes e te pir qirêj kir"

Dîsa di rûpela 18'an de:

*"Te yê lewhê nemaye îşq
Îsmê te yê neqşê xemeya îşq"*

Di rûpela 482'an de:

*"Ey xameyê serteraşê bedreng
Bes nemayê xweşqumaşê xweşreng"*

Di rûpela 20'an de:

"Herfa ku me qûtî neqşê hûre"

Di rûpela 21'an de:

*"Esbah-i miressemîn ji nasût
Erwah-i miwessemîn bi tahût"*

Di rûpela 81'an de qala tabloyan dike:

*"Neqqaşê sehîfeyê hikayet
Neqqadê sebikeye riwayet
Keşa bi vî terhî resm û ayîn
Lê da bi wî terzî derp û tezyîn"*

Dîsa rûpela 229'an de:

"Serlevheyê dêm bibît mizehheb"

Ji bilî wênesaziyê; tablo, desen, desî-natoran û peykeran hema hema di her şaneyê berhemê de qala rengan dike; bo mînak di rûpelê 135'an de:

"Rengê semenê bi coyê xaze

349'an de:

"Xweşereng û letîfe sibhê sorgul"

359'an de:

"Ew qatê zemanê qûne qûne"

Dîsa di 359'an de:

"Tixê xwe yê zerfêşan ku danî"

393'an de:

"Tabûteke zernîgar û rengîn

Sindoqeke xûrdekarê zerrîn"

Ehmedê Xanî di berhema xwe ya "Mem û Zîn"ê de rengê ku herî pir qal dike û yê hez dike ev in;

Qanî: Pirsor

Gulnar: Sorê kulîlka hinarê

Al: Sor

Xumrî: Sor

Xaz: Sor

Ehmer:

Sor

Gûlgun:

Sorê xwînê

Erxwanî:

Sorê hinaran

Rengê sorgûl:

Sorê gulan

Exder:

Kesk

Reşbûn:

Reş

Zertar:Rengê

Zêr

Rengsema:

Rengê Ezmanî

Qîr-qetran:

Reşê qetranî

Zerfêşan:

Zer

Zerrîn:

Ber bi zer ve diçe

Feyrûz:

Şîn

Zemîn têla:

Rengê axê

Rengê semenê:

Rengê sosinan

Lê çiqas qala gelek rengan dike jî herî pir qala rengê(n) sor dike û xuya ye E. Xanî herî pir jî rengê sor hez kiriye.

Ger Mirov bi tevahî lê binêre ihtîmaleke pir xurt heye ku E. Xanî wêne jî wênan-dibin ango wênesazek be jî.

Ji ber ku gava qala wêneyê Manî kiriye di rûpela 483'an de nivîsandiye:

"Fehhasî te kir pir rengê Xanî

Neqqaşî te kir misalê Manî"

Bi tevahî zanebûn, jêhatîbûn û kûr-bûna wî û di berhemên wî de hebanoka wî, nêzikdayîn û ditinên wî yên weke wênesazekî fikra mirovan di derbarê wî de zelaltir dike ku bibêje E. Xanî di dema jiyaye de wêne jî wêrandiye. Ango wênesaz bûye.

Di nava berhemên nivîskarên me yên klasîk de ku ez kêr zêde zanîm bo mînak ne di berhemên Feqiyê Teyran de ne di yên Melayê Cizirî ne di yên Elî Herîrî û ne jî di yên din de hebanokek hunerî (hunerên şêwekarî) ew qasa dewlemend tune ye.

Di dema me de jî berhemeke klasîk an nûjen gava mirov dixwîne kêr zêde di hebanoka wan nivîskaran de pê dihesê û dibîne ku ev nivîskar di dema jiyane de bi beşên hunerê re çiqas têkildar bûne, çiqas şopandine, nas kirine, hez kirine û hezimandine bi awayekî eşkere xuya dibe.

Dosye: CEGERXWÎN



Amadekar: Elîxan LORAN

Di şîîra Cegerxwîn de sedema kur-
dînivîsînê û zaravayê soranî
Arjen ARÎ

Best helbest û şoreş
Mem BAWER

Kurtejiînenîgariya Cegerxwîn
Derwêşê XALIB

Hevdîtina min û Cegerxwîn
Têmuêr XELÎL

Jin li ba Cegerxwîn
Îkram BALEKANÎ

Du halên helbesta Cegerxwîn
Remezan ALAN

Temaya helbestên Cegerxwîn
Rezoyê OSÊ

'Ez dilgeşê can im'
Feratê DENGIZÎ

Cegerxwîn û Qanatê Kurdo
Tosinê REŞÎD

Romansiyet di helbesta Cegerxwîn de
Xalis MISEWER

Xwendevanên hêja

Me di vê dosyeyê de xwest ku em Cegerxwîn bikin mêvanê we. Ji bo vê yekê gelek sedem hene. Cegerxwîn di nav kurdan de hîna mijareke aktuel e. Bi awayekî rojane tê nîqaşkirin. Li aliyê dinê helbestên wî bi awayê herî zindî li ser zar û zimanê mirovan in. Em bi rihetî dikarin bibêjin ku Cegerxwîn di nav me de dijî û bi hestên me re hevaliyê dike. Xem û kulan ji nav dilan difirîne. Ku mirov bibêje ew hest û helwesta kurdan a sedsala bîstan bû dê ne çewt be. Hem jî ne li perçeyekî kurdistanê li her dera ku kurd lê dijîn.

Wek ku me li jorê jî got Cegerxwîn ji gelek hêlan ve tê nîqaşkirin. Gelek kes der barê wî de bîr û boçûnên xwe tînin ziman. Ev bîr û boçûn çiqas rast in an di cî de ne wê dem bide xuyakirin. Dibe ku hinek helwestên wî neyên ecibandin an jî ji aliyê wê-jeyî ve bê rexnekirin. Ev asayî ne û divê bîrê kirin jî. Lê tiştêk pir zelal e. Cegerxwîn bi her awayî bûye yê gel û di dilê mirovan de cih girtiye. Divê em bizanibin ku ev jî ji ber xwe ve pêk nayê. Û her mirov ber û berhema dema xwe ye.

Di şîra Cegerxwîn de sedema kurdînivîsînê û zaravayê soranî

Arjen ARÎ

Cegerxwîn yek ji wan şairên kurmanc e ku ji bilî kurmancî, bi zaravayê sorî helbest lê kirine: Ev helbest bi jimarî 10 in, di sê dîwanên Seyda de; 'Agir û Pirûsk' 'Sewra Azadî' û 'Kîme Ez' de ne

Seydayê Seydayan Ehmedê Xanî, di Mem û Zîn, Beşa VI'emîn de sebêbê bi kurmancînivîsîna berhemê weha rêz dike:

*Xanî ji kemalê bê kemalî
Meydana kemalê dîtî xalî
Yanî ne ji qabil û xebirî
Belkî bi teessib û eşirî
Hasil: ji înad eger ji bê dad
Ev bid'etê kir xîlafê mu'tad
Safî şemirand ve xwarî durdî
Manende durê lîsanê Kurdî
Înaye nîzam û întîzamê
Kêşaye cefa ji boyê a'mê
Da xelkî nebêjîtin ku: 'Ekrađ
Bê ma'rîfet in, bê esl û binyad*

.....

.....(1)

Di gel ku hin bêjeyên ne kurdî: Qabil, Xebir, Teessib, Bid'et, Mu'tad, Manende, A'm di ristan de dihevine jî; bi gotina Xanî, dema ku dîtiye meydana hunerî xalî û vala ye; ne ji jîrî, şarezayî û pisporiyê, hebekî ji kevneperezî, hinekî ji hizra eşirî; an jî ji gir û bêdadiya heyî, ji berberî û dijberiya bûyî (ya der barê kurdî de) ziman xistiye qalibekî, bi serûber kiriye, tehmeke dayê; çî ji bo gel/xelkê...û çî ji bo ku hinek ranebin nebêjin 'ekrađ/kurd ne xwedî 'kelam' û huner in, bê esl û fesl... û bê kok û bingeh in...'

Li gorî hin çavkaniyan, kurdan ji wextê salixdayî-dîrokî heta bigihê îro 9 alfebe; bizmarî, avestî, aramî, pehlewîya kon,

masî soratî, xuruc ul sir, erebî, latînî, kirilî bi kar anîne.(2)

Desthelata kurd rojek ji rojan rabe berhemên bi wan alfebeyan veguhêze alfebeya ku îro bi kar dihêt-erebî an latînî- bi min bi dû Kitêbxaneyê Îskenderiyê ya ku di dema desthelata Hz.Omer de hate sotin, dê pirtûkxaneyê herî dewlemend û berhemdar be.

Belê; Xanî bi xwe jî ji 'bêdesthelatî' û 'bêxwedîtîyê' bi gazinc e ku, vê malikê di Memû Zînê de bi cih dike:

*Ger dê hebûya me jî xwedanek
Alîkeremek, latîfedanek...*

Lê... xwediyekî li gel 'alîkeremî' û 'latîfedanî' zanîn, huner, helbest, kîtab, dîwan... li nik wî meqbûl/hêja bûya! Hingê me yê çî bikira? wê gavê me yê:

*A'lema kelama mewzûn
Alî bikira li banê Gerdûn*

û... wê;

*Bîna vê riha Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elî Herîrî*

û...bi ser de;

*Kêfek wê bida Feqîhê Teyran
Hetta bi ebed bimayî heyran*

Kê bi baldarî û heyranî; di hin cihan de bi matmayîn û dilihayî nenêriye/nanêre li berhema li dû xwe ji qewmekî re û pê re ji ciwanîyên mirovahiyê re hiştiye!

Balkeş e; Xanî dema ku vê berhemê dinivîse, xwe dişibîne 'sefarekî', 'mirovekî dîn, ji dest çûyî', û 'dînar/pere/mal bi

dest nexistî’:

.....
Qelbê me nekir qebûlê hîle
Qet bo xerezê nebû wesîle
Dîn çû, û ne ket bi dest me dînar
Paşê ji neçarî bûne seffar
Sifrê xweyê xef me eşkere kir
Qirtasiye bû me li lê dua kir

.....
Kurmancî ye sifr e, bê guman e
Zêr nîn e , bi bên sipî de mane (3)

‘Sefarê’ ku di wexta xwe de osmanî, erebî û farisî ji zimanê bav û kalan bêtir dizane û dikare biçe ‘sefariya’ zimanekî din bike; ji ber ku dilê wî qabil nade/qebûl nake, berê xwe dide ‘sefariya’ zimanê xwe. Ji nefsbîçûkî û ‘alîcenabî’ vî karê ku dike, Xanî çendî bi ‘Sefartiyê’ bi nav bike jî, ya ku kiriye ‘zêringeriyek’ e, ku her ‘mêrxas’ nikare wisa bi hêsanî xwe tê werke!

Jixwe, li Bakur di navbera Bateyî û Cegerxwîn de ‘zêringerekî’ din; ‘zêringerekî’ ku xezîneyeke mişt ‘zêr’ û ‘dur’ û ‘sedef’ û ‘yaqût’ li dû xwe hiştibe, naxuyê. Ev yek, nayê vê maneyê; ku li Bakur kesayetî hêja hin ‘dur’ û ‘mirarî’ li dû navêtine ser ‘xezîneyên’ li ber dest: Bi min, ya rast ev e; bi dû dused salên xitme de, yekî bakurî zend û bend hildane, derdaw li xwe pêçane û daketiye qada hunerbazan. Cegerxwîn e ev, Cegerxwînê ku sê çar salan kême zêde hemtemenê Hejar, Hêmin, Ehmed Namî, Osman Sebrî, Qedrî Can û Seydayê Tîrêj ...

Cegerxwîn jî mîna Seydayê xwe Xanî di destpêka nivîsînê de, sebebê nivîsîn û hîl-bijartina kurdî/kurmancî, weha berpêşî me dike:

.....
Wextê min di qewmê kurdî pîrr delal
Ew di nêv ehlê cihan de bê heval
Ba sexawet ba diyanet ba hiner
Min li goşê lewhê qelbim kir xeter
Ko beyan kim esl û ewsafên di wan
Milk û hikm û padîşah û her zeman

.....
Ez dizanim ehlê çend esrên berê
Bê teesîb guh nade ne vê dirê

.....
Vê ji yaran hêvî sed carî dikim
Zêde sed şukrî ji heqbarî dikim
Ko hezar û sêsed û hem çil û heşt
Bu ji Mûsayê Hesarî ev nivîşt(4)

Weke ji ristên li jor jî diyar e sedemên Cegerxwîn û sersebebên Ehmedê Xanî kem zêde nêzî hev in.

Dişa jî, bo ku îro hinek ranebî û ne-bêjin ‘Xanî ji kurdî pê ve bi zarekî din nizaniyê ku bi farisî an erebî binivîse’, pêşiya vê lomeyê bi yekkirina çarînen çar zimanî, dibire:

Hel lena min nî’metî weslîl min nesîb
Oftadem ber deret bêçare, sergerdan xerîb

Derdîmîn çoqluxu senden ote yok hiç bir tabîb


Ey tabîbê, min dewayê derdê Xanî her wîsal(5)

Cegerxwînê ku Xanî dike Seydayê xwe, di destpêkê de weke gelek kesên ku ‘xame’ di ‘hibirdanka’ zimanên serdestan de kirine, ew jî xwe radikişîne Erebi.

‘Kurmê’ zimanê dagirkeran ne tenê dikeve zimanê mirov; bi demê re dil dikeve, xwe li xewn û xeyalên mirov radipêçe û hêdî hêdî dinizile nava ruh, da kes û kesayetê wegurîne ber bi nasnameyêke din ve û mirovê jêrdest bike kavilekî hiç î pûç. Ji vê yan jî wê, nivîskar û hozanvanê ku di destpêkê de xwe ranekişandibe tirkî, erebî, farisî nîn e. Di vê buwarê de kurdên ferezîman û fereçand (!) yên ku bi zimanê serdestan dinivîsin mînaka Ceza-yîr û Îrlandayê derdixin pêş û hewldanên nivîskarên wan welatan jî xwe re dîkin palpişt.

Ev babet ne mijara vê nivîsê ye û jixwe gelek munaqêşe û guftûgo hatine kirin...

Ku em dagerin ser Cegerxwîn... me got ku Cegerxwîn jî xwe radikişîne zimanê erebî. Lê Seyda xwe zû jî nava pençên vî ‘guri’ xelas dike, tevli kerwanê Seydayê



xwe Xanî dibe.

Digel vêya, Cegerxwîn yek ji wan şai-rên kurmanç e ku ji bilî kurmançî, bi zaravayê sorî helbest lê kirine: Ev helbest bi jimarî 10 in, di sê diwanên Seyda de; 'Agir û Pirûsk' 'Sewra Azadî' û 'Kîme Ez' de ne:

Wezîfey Xom

Nawî Kurdistan pir şewq û taw e
Gencineyî fikrîmaneyî em naw e

.....
Wezîfey xom her teblîxî kurd e
Le mirdû herçî dimîne nawe

Cegerxwîn gerçî seydayê kurd e
Ta êsta pesnî kesêk nedawe(6).

Helbesta 'Wezîfey Xom' pesinnameyek e, bo şexsiyetek 'alîcenêb' û 'kerembala' Elî Kemal -nav di helbestê de jî derbas dibe- bi soraniyeke ku her kurmançîaxêv jê tê bigihîje, hatiye nivîsîn.

Zilmî Bêgane Debînim

Ey welatem pût û latem pîrî xemgînî te me

Rençberî lawanî tû me, peykê mizgînê te me

Ey welatê min pût û latê min pîrê xemgînê te me

Rênckêşê lawê te me, peykê mizgînê te me

Gerçî kurdî pêm delên 'bê dîn û gawir' pêm xweş e

Dîn û îmanî tû wî men dîn û bê dînê te me

Çendî kurd bo min 'bê dîn û gawir' bi min xweş e

Dîn û îmana min tu yî, ez dîn û bê-dînê te me

Em perîşanî û zilet têk le îşqê tû exum
Pêm delên em şat û dîn e, rast e men dînê te me

Vê perîşanî û ziletê tev bo eşqa te dixwim

Li dû min dibêjin şet û dîn e, rast e ku dînê te me

.....
Tamî sebrî tamî sebr e tal û tûjî zor me xwar

Wa bi alem tal û tujî im çunkî şêrînê te me

Tama sebra min sebra te ye tal û tûjî zor me xwar

Weha bi alême tal û tujî im, ji berk u şêrînê te me

.....
Bes yekîtî xweş divêtî da ku têk serbest bibî

Men be qurbanê sera û, ala rengînê te me!

Bes yekitiyek xweş divê, da ku tev-serbest bibî

Ez bi gorî û qurbanê ser û ala rengîne me

Zilmî bêgane dibînim wa li xakî tû dibî
Şuhretî dawê dielêm men Cegerxwînê te me(7)

Zilma bêsedem dibînim, ev li ser axa te dibe

Dawa rûmeta xwe dikim, ez Cegerxwînê te me(8)

Seyda, di helbesta 'Zilmî Bêgane Debînim' de, li hember neheqî û bêdadiya ku lê dibe de, rasterast giliyê xwe digihîne welatê xwe; Kurdistan! û dibêje 'ev zilm û tawanên ku li min dibin, li ser xaka te, ji bal xelkê te ve têt kirin!

Baş têt bîra min, di salên 70'yî de çi li

Bakur çi jî Başûrê Rojava (Binxetê) hin kesan bi navtêdana hin derdoran Seyda mîna mirovekî 'xirbûyî' 'gawir' 'jîdînderketî' bi nav dikirin û bi vê yekê diçûn bi ser Seyda de!

Lê ew Cegerxwîn bû: Şairê welatekî bindest û gelekî jêrdest bû.

Lê wî qet xwe weke mirovekî bindest nedît; digel rewşa heyî ya siyasî, olî û civakî ya kurdan, pênc pere bi nêrîn û gotinên wisa nedan; bêtirs, rasterast bîr û bawerîya xwe bi rêya helbestê radigihand civaka ku hêviya xwe bi welatekî azad û serbixwe ve girêdabû!

Dilêriya Seyda dilêriyeke bêpawan e.

Di dema mirina Faîk Bêkes de zilma ku lê dibe jî bîr dike; li dû Bêkes dibêje, 'Bêkes tu ne Bê kes î!

Şîna Bêkes

Eto Bêkes niye bêkes, kesit ew role û lawin

Kesit ew şox û şang û naz û ew xuşkên belek çavin

.....

.....

Emin wan nakesan nakim be kes bo xwe, heval Bêkes

Kesim wa her de zindanan, dikrin hawar keç û lawin (9)

Ji helbestşînameya li jor zor diyar e, Seyda hewl daye ku bi soraniyeke nêzî kurmançî şîra xwe lê bike. Jixwe heta demê nêz soranî û kurmançî ne di rojeva kurdan de bûn û ji dêvla soranî û kurmançî, ev zarava bi kurmançiya jêr û ya jor bi nav dibûn...

Wek encam, wek peyva dawîn; qelemdarên kurmanç û sorî ketibûna pey liv û tevgera hozanvanên weke Cegerxwîn û Koyî, îro du zarava, du zaravayên sereke yên yekzimanî jî hev (ev çend) dûr nediketin; nedibûn sedema gengeşî û guftûgoyên ku îro tên kirin û dê bêne kirin

28/07/2007/Amed



1. Mem û Zîn, E.Xanî, Wş.Hasad, Rp.60
2. Em Zimanê Kurdî Binasin; Wş.Ens.Kurdî ya Stenbolê, Rp.11-12
3. Mem û Zîn, E.Xanî, Wş.Hasad, Rp.64
4. Kîme Ez, Rp.318-319
5. Kovara war, Jmr.3
6. Agir û Pirûsk, Wş.Avesta, Rp 32
7. Agir û Pirûsk, Wş.Avesta, Rp117
8. A.Arî
9. Kîme Ez, Wş.Avesta, Rp.102

Best helbest û şoreş

Mem BAWER

Ez we dibînim, hûn niha li kolanên bajêr, yên ronîgirînok û di nava geremoleke bêhiş de, xweser, bêserî, bê armanc û şaşomaşo digerin, gerên we yên westiyayî jî êdî ji lingên we aciz bûne, lê niha qet nayê bîra we ku niha helbesvanek li jûra xwe, li ser maseya xwe ya hevrê û hevalbend rûniştiye û bi porên xwe yên gijomîjo, bi çavên xwe yên soromoro, bi mêjiyê xwe yê tevlihev, li ser fikarên xwe yên zêr û zîvîn radiweste. Piçekî bi şûn ve dê ji êş û jana xwe xelas bibe û rêzikê dê mîna pitikên dêmsor ji mêjiyê wî biherikin ser kaxezên çilspî.

Helbestvan şoreşgerên vê cîhanê ne, çekên wan ji pêûs û hubra wan pêk tên. Gava ku em bi awayekî dorfireh li edebiyata cîhanê binihêrin, em ê bibînin ku li her welatekî bindest helbestvanekî di nava wî gelî de serî hildaye û ji bo gelê xwe jiyana xwe ya bêhempa û wext û rojên xwe yên ku tu caran venagere feda kiriye.

Di edebiyata ûrisan de ev xweşmêr Mayakovskî ye, li Şiliyê ev şoreşger Pablo Nerûda ye, ji nava kubarên frensewî ev êşkêş Lûîs Aragon e, li welatê ku qereçî tê de dijîn ev kes Federîko García Lorca ye ku li Spanyayê guleyên tûjîk li ser sînga xwe ya pola kedî kiriye. Li welatê kurdan jî ev şoreşger û rewşenbîr Cegerxwîn bi xwe ye, ku jan û êşa welatê xwe kişandiyê.

Seyda û kurd

Ev rewşenbîrê welatparêz ji kurdan re bûye pêşengekî azadîxwaz, divê ku hûn wî nas bikin. Carnan bi helbestên xwe li ser zîmanan geriyaye, carnan li ser notayên muzîkê libitîne rêzikên wî yên heşt-bend û carnan rêzikên wî li ser awazên muzîkjenên kurd bi rengêkî hevrişim herikîne. Carnan ji helbestên wî bûne rim û

kelem û sinc, li ser sîngê axa, beg û şêxên dewr î zemanan. Cegerxwîn mîna navê xwe jiyan borand li ser rûyê vê dinê. Bi cigerêke xwînî, bi azadiyeke biyanî li xerîbiye, li Stockholma sar çû ser dîlovaniya xwe.

Bi tenê xewn û xeyaleke Cegerxwîn hebû, wî dixwest ku kurd li ser xaka xwe azad bijîn. Di jînenîgariya xwe de qal dike ku gava dewleta Osmaniyan di nava Şerê Cîhanê yê Yekemîn de ye, li gorî pêşniyaza serleşkerên frensî lê dixê ji Sûriyeyê tê xopana Amedê da ku di navbera frensî û kurdan de navbeynkariyê bike û di navbera her du aliyan de li Entaqayê peymanek bê îmzekirin. Tê Amedê ji malbata Cemîlogluyan kes xwe nade ber vî karî, ew jî lê dixê û destvala vedigere. Wê gavê serleşkerên frensî wiha dibêjin; “Jê vegerin, na weleh ev gel azadiya xwe naxwaze.”

Derhênerên Cîhanê

Belê, helbestkar di vê dinê de ji bo Xweda û xwedawendan derhêneriyê dîkin. Helbestkar kesên bijarte ne ku bi hestên xwe yên zirav û mirovhez, ji bo mirovên ji rêzê êşê dikişînin, ji bo ku kesên ji rêzê azad bibin, ew azadiya dil û mêjiyê xwe ji bo gulebaranê jî amade dîkin. Helbestkar ji mirinê natirsîn, ji jiyanê ditirsîn...

Di dîroka cîhanê de û li welatê Bûlgaran jî helbestkarekî wan ê şoreşger heye, ew Nikola Vaptsarov e ku di sî û sê saliya xwe de, di adara 1942'yan de ji hêla hevkarekî Hitler ên rejîma faşîst ve hat kuştin. Ev xortê enîfireh bû ku helbesta xwe ya dawiyê di zindanê de bi xwîna xwe nivîsandibû.

Helbest û cîhanbiratî

Hemû helbestkarên şoreşger li ser rûyê cîhanê dişibin hev, bi nêrînen xwe, bi mî-

rovheziya xwe û bi helbestên xwe ji bo wan hemû mirov wek hev in. Dilê wan ne tenê bi hemwelatîyên wan dişewite. Dixwazin ku di li vê dinyayê çi reşik, çi wîetnamî, çi spanyolî hemû kes azad bijîn, lê belê li ser xaka xwe.

Lewma gava ku şoreşgerê xweşmêr Ernesto Che Guavera lê dixist û diçû ji bo welatekî din serhildanekê li dar bixe, di nameya ku ji bo gedeyên xwe nivîsandibû de wiha digot; "Li ku derê dinyayê dibe bila bibe ger ku çiqileke darekê hat şikes-tin, êşa wê di dilê xwe de his bike keça min." Helbestkarên şoreşger û mirovhez kesên bêwelat in.

Her wiha em dizanin ku helbestkarê tirk Nazim Hikmet jî di vî warî de heman êş kişandîye û her wiha di helbesta ku li pey Hîroşîmayê li ser keçikek japonî nivîsiye de dide xuyakirin ku ew jî mîna hevalên xwe yên helbestvan bi kîjan janê dijiya.

Cegerxwîn û enternasyonalîzm

Cegerxwîn ne tenê bi êşa gelê xwe cîgera xwe êşandîye, bûye şirikê êşa kesên bindest û li ser rewşa wan helbest rêz kirine, em ji helbestên wî minakan bidin ev yek dê bêtir êşkere bibe.

*"ey heval Robson,
derdê min û te ev derdê giran
zordestiya ku hate nav cîhan
fermo em herin
tevde bigerin..."*

*"diyan- biyan- fû, diyan- biyan- fû
lingê koledar li ser te rabû
kurên te gernas xwe dan kuştin
navek pîr bilind ji bo te hiştin"*

Ji helbestên wî jî em fêhm dikin ku bi dilekî enternasyonalîst tevgeriyaye û êşa mirovên hejar di dilê helbestên xwe de his kiriye.

Seyda zimanê şîretê û jin

Gava ku em helbestên Seyda bixwînin em ê bibînin Seyda gava ku xwestiye gelê xwe hişyar bike, bi zimanê şîretê ev yek kiriye.

*"Em tevde rabin, mîl bi mîl
Êrîş bikin dijmin ji dil*

*Destan bi pakî bidne hev
Welat bihêlin bo xwe tev"*

Seyda dîsa di helbesteke xwe de dibîne ku kurd her yek ji hêlekê ve serkêşîye dikin, ji wan re bi zimanekî şîretê wiha dibêje;

*"Weke gernasan serê xwe hildin
Hemî bibin yek; gundî, bajarî
Navên eşîran ji ser xwe rakin
Xwe bighenin hev, perçe û parî"*

Dîsa em di dîwanên wî de dixwînin ku Seyda ji xizanî û nezaniya kurdan aciz bûye, his kiriye ku sedema vê xizanî û nezaniya kurdan bi tevgera şêx, axa û began ve girêdayî ye. bi helbestên xwe xwestiye ku gelê xwe di vî warî de hişyar bike.

*"Şêx û beg û axa ne ku
Em dane bin destê neyar
Li ser me xo bilind dikin
Bê şerm û bê tirs û fedî"*

Gava ku Seyda baş têdighîje ku şêx destên xwe dirêjî piroziya gel, baweriya gel, kevneşopiya gel û çanda gel kirine wiha dibersivîne wan;

"Destê şêx maçî mekin ew şêx ne qutbê razî ye

Tac û şewket tev xebata destê sar û tazî ye

...

Şeyxê min destên te îdî maçî nakim ez bes e

Kavil û wêran te hiştin ev sera û medrese"

Seyda ne tenê tekçûyîna gelekî his kiriye, jihevduketina jiyana keç û jinan jî dîtiye û di vî warî de bi helbestên xwe xwestiye ku vê rewşê nîşanî wan bide. Dîtiye ku keç û jinên kurd ji xeynî peздоşî û nanpêjiyê ji tu karekî fêhm nakin û kesên ku serdestê wan in jî dixwazin di vê rewşê de bimînin, ji bo rizgarkirina wan bi deng û zimanê şîretî wiha diqîre;

"Keçê rabe serî hilde di vê çaxê wiha nabî

Binêre jin çûne ezmana, heta kengî di xwe da bî

Çi ne ev çarîk û pêçî, di rexta de xwe rapêçî

Di edebiyata ûrisan de ev
xweşmêr Mayakovskî ye,
li Şîliyê ev şoreşger Pablo
Nerûda ye, ji nava kuba-
rên frenewî ev êşkêş
Lûîs Aragon e, li welatê
ku qereçî tê de dijîn ev
kes Federîko Garcîa Lorca
ye ku li Spanyayê guleyên
tûjik li ser sînga xwe ya
pola kedî kiriye. Li welatê
kurdan jî ev şoreşger û
rewşenbîr Cegerxwîn bi
xwe ye, ku jan û êşa we-
latê xwe kişandiye.



*Bi destê te kelanşînkof, bera zana û
xwenda bî*

...

*keça zana û jêhatî, bibe partî û demoq-
ratî*

*bila dîsa tu şêrîna dilê xorta û Seyda bî
..."*

Seyda di helbestên xwe de bi awayekî
eşkere û bi zimanekî sivik, li ser rewşa
kurdan sekiniye, mijara helbestên wî we-
latparêzî, kedkarî, partîzanî, şer, xweza û
erdnîgariya vî welatî, zordariya şêx û
began û evîn e, evîneke ku ji kardanka vê
jiyanê dizê. Seyda bi helbestên xwe hêvî
daye gelê bindest da ku ji bo serdestiya
xwe zêdetir bixebite. Lê ne tenê xebateke
di warê şer de, xwestiya ku kurd di warê
xwendinê de jî zana û jîr bin.

Tê qalkirin gava ku Seyda xwendina

xwe ya medresê, li cem Mele Îbêdilahê
Kûlatî dixwîne û paşê derdikeve gereke
mezin, piştî vegerê tê dibîne ku Mele Îbê-
dillah di vê navberê de çûye ser dilova-
niya xwe, îcazeta xwe ji birayê wî, ji Mele
Fetilah distîne. Piştî ku xwendina xwe
kuta dike û îcazeta xwe distîne di vê gera
xwe de fêhm kiriye ku hemû sedemên paş-
demayîna kurdan ol (dîn) e. Wî û hinek
hevalên xwe li ser axa Cizîra Binxetê, du
gund ava kirine, Cegerxwîn riyê xwe kur
dike, cûbe jî ser xwe diavêje, navê gun-
dekî jî wan datîne Cehenem û têde rû-
dinê. Di gelek helbestan de jî qala vî
gundî dike. Cegerxwîn mirovekî zana û rê-
berekî hunermend bû, bi tenê rastî dît û
rastî got.

Kurtejînenîgariya Cegerxwîn

Derwêşê XALIB

Li ser welatparêziya xwe dibêje, “Her wekî tê bîra min, di sala 1924’an de, ku ez li ber destê vî camêrî, li ber destê Şewqî Begê Erxenî şiyar bûme û min bîra kurdperweriyê biriye û bûme welatparêz

Diyarî ji bo Dr. Elî Kiliç kurdê dilsoz û mirovê hêja

Navê wî Şêxmûs e. Li Hesarê, di sala 1903’yan de ji dayik bûye. Navê diya wî Eyşan, navê bavê wî Hesên e. Xwişka wî Asiya û birayê wî Xelîl e. Dundeyên Cegerxwîn 6 in: Sînem, Keyo, Gulperî, Rojîn, Beniye-suad, Azad û Selam. Di hevpeyivînekê de Keyo got: “Neviyên Cegerxwîn 26 in“

Rehên binemala Cegerxwîn:

Navê wî, Şêxmûs, kurê Hesên, kurê Mihemed, kurê Mehmûd, kurê Elî ye. Cegerxwîn di vê babetê de dinivîse; “li gor hatiye zanîn û gotin Elî û Mihemed du bira ne -ji mîrekên Pekendê- seba karekî dijminahiyekê xwînî bûne û hatine cem mîrê mihelmiyan û mîr gundê Hesarê daye wan, yan jî kirine keyxwê Hesarê” - *Jînenîgariya Min, r. 14-*

Li ser destpêka ristên xwe dibêje, “li Dêrikê min rist çêkin, bi kurtî min ji xwe re xweşiya vê hindamê ji Kurdistanê da zanîn” (*Jînenîgariya min r.90*)- Ev li dor sala 1920’an bû.

Li ser welatparêziya xwe dibêje, “Her wekî tê bîra min, di sala 1924’an de, ku ez li ber destê vî camêrî, li ber destê Şewqî Begê Erxenî şiyar bûme û min bîra kurdperweriyê biriye û bûme welatparêz - *Jînenîgariya Min- r. 126-*

Ji Dêrikê vegeriya Amûdê û min ev gotin ji seydayê xwe Mela Ubeydulah¹ re gotin. Lê seyda serê xwe hejand û got: “Xuya ye tiştek di nav mezinên Kurdistanê de heye, her wekî gerek e em ji kara xwe bikin, ku di wê rojê de em karibin tiş-

tekî hêja bikin - *Jînenîgariya Min r. 126-*

Ev amadekariyên şoreşa 1925’an bû. Wek diyar e, tîkiliyên Mele Ubeydulah bi Xalid Beg² re hebûn. Cegerxwîn destpêka xebata xwe di warê kurdîtiyê de, wisa diyar dike:

Min dest bi kurdîyê kir peyda kirin çend mirîd

Bi xweşxwan û reşbelek xesma piştî Şêx Saîd

Qonaxên jiyana Cegerxwîn

1903; Li gundê Hesarê ji dayik bû.

1918-20; Bavê wî Hesên li bajarê Amûdê serê xwe danî û çû ser heqiya xwe. Piştî salekê diya wî jî çû ser heqiya xwe. Pêlekê li cem xwişk û birayê xwe ma.

1920 - 1927; Bû feqî û 7 salan li ser hev li Kurdistanê geriya û gihîşt Rojhilatê Kurdistanê.

1927; Vegeriya Tilşiyîrê û Kehla Selîm keça xalê xwe ji gundê Hesarê ji xwe re anî.

1928; Xwendina xwe temam kir û îcazeta meletiyê wergirt û bû melayê gundê Hazda Jorîn. Di wê salê de yekemîn dîwan nivîsî, ew dîwan hê jî çap nebûye.

1936; Cegerxwîn bi çend malên gundiyan ve du gund ava kirin. Navê gundan Çêlek û Cehenem e.

1937-1938; Cegerxwîn nadiyek li bajarê Amûdê ji xortên kurd re vekir.

1946; Cegerxwîn mala xwe anî Qamişloyê.

1946-2; Civata Azadî û Yekîtiya Kurd hat damezirandin û Cegerxwîn bû sekre-

terê wê.

1949; Cara yekemîn Cegerxwîn hat girtin.

1954; Cegerxwîn bû berbijêrê parlamenta Sûriyeyê.

1957; Cegerxwîn û hevalên xwe rêxistina Azadî saz kirin. Di wê salê de rêxistina xwe hilweşandin û tevli Partiya Demokrati Kurdî li Sûriyeyê bûn. Iraq

1959-62; Cegerxwîn reviya Iraqê û bû mamosteyê şêwezarê kurmancî li zanîngeha Bexdayê beşa kurdî de. Di sala 1962'yan de Iraqê Cegerxwîn der kir û vegeriya Sûriyeyê.

Sûriye 1962-63; Cegerxwîn cara duyemîn hat girtin û ket zindana Mezê. Paşê sirgunî Siweydayê bû û dûre hat berdan.

Şoreş 1969; Cegerxwîn çû Başûr tevli şoreşa kurdî bû û nêzî salekê li wir ma.

1970; Dîsa vegeriya Sûriyeyê.

Libnan 1973; Cegerxwîn direve Libnanê.

Sûriye 1976-79; Cegerxwîn vegeriya Sûriyeyê û heta 1979'an lê ma.

Swêd 1979; Cegerxwîn çû Swêdê û 5 salên xwe yên dawîn li wir derbas kirin.

22.10.1984; Li bajarê Stockholmê Cegerxwîn serê xwe danî û çû ser heqîya xwe.

30.10.1984; Girseyeke bêjimar Cegerxwîn li Qamişlo di hewşa wî de veşartin. Gora wî ziyaretgeha kurdan e.

Cihê çapê û navên pirtûkên Cegerxwîn ev in: Yên li Şamê çap bûne, diwana Pîrîsk û Pêtî, Cîm û Gulperî, diwana Sewra Azadî, Reşoyê Darê, Gotinên Pêşîyan.

Yên li Bexdayê çap bûne, Destûra Zîmanê Kurdî, Ferhenga Kurdî cild 1, du caran hatiye çapkirin.

Yên li Beyrûtê çap bûne, diwana Kîme

Ez, Salar û Mîdiya, Şerefnameya Menzûm.

Yên li Stokholmê çap bûne, diwanên Ronak, Zend Avista, Şefeq, Hêvî, Aşitî, Tarîxa Kurdistan cild 1, 2 û 3, Folklorê Kurdî, Jînenîgariya min û Li Ser Dîbaceya Ehmedê Xanî.

Hîna jî nivîsên wî yên neçapkirî hene. Mîna diwana ku di serdema feqetîya xwe de nivîsiye, ew diwan ne diyar e.

Hejmara helbestên Cegerxwîn³

1- Helbestên Cegerxwîn yên bûne stran: Yên ku me nas kirine 88 helbest in. 21 hunermendî ew strane. Hunermendên ku jimareke mezin ji helbestan strane, ev in: Ciwan Haco, Şîvan Perwer, Aram Dîkran, Masûm Şîkakî

2 -Jimara firdikên helbestên Cegerxwîn; Cegerxwîn zêdeyî 4500 rûpelî nivîsiye

Jimara Dîwanan 8 diwan

Jimara rûpelên diwanan 1478 rûpel

Jimara helbestên diwanan 1036 helbest

Jimara malikên diwanan 15113 malik, çarîn, pêncik,

Jimara Firdikên diwanan 33.443 firdikan malikên yekfirdik

Tevaya helbestên Cegerxwîn wê bibin zêdeyî 35 hezar firdikî.

¹ Bi navê Seyda tê nasîn. Peyva "Seyda" bûye navê malbatê jî.

² Xalid Begê Cibrî, rêberê serhildana 1925'an, lê wî serhildan nedit, ji ber ku waliyê Bedlisê ew di kelehê de bi xiyaret û xîzî kuşt.

Ev hejmarên 1 û 2, grupa lêkolînê ya KFZZK (Komîta Fêrbûna Zîmanê Kurdî) pê rabûye. Spas ji wan re.



Hevdîtina min û Cegerxwîn

Tê mûrê XELÎL

Sala 1982'yan meha îlonê bû. Wê çaxê ez berpîrsiyarê radyoya kurdî ya Yêrîvanê bûm. Serokatiya Radyoya Ermenistanê ez şandim Moskovayê bona çend mehan Enstîtuya bilindkirina kalîfikasyona xebatkarên radyoyê û tîlêvîzyonê de bixwînim. Li wir ez ji serokê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê Hanefî Çeleplî pê hesiyam, ku bi dawetkirina Serokê Para Kurdzaniyê ya Enstîtuya Rohilataniyê ya Akadêmiya Sovyêtistanê (Para Lêningradê) Qanatê Kurdo ew û helbestvanê mezin Cegerxwîn zûtîrekê wê ji Stockholmê bîn Lêningradê. Êdî min ê li ku û kîngê Cegerxwîn bidîta? Ez rabûm û çûm. Ji min re li hev hat ji wextê wî yê giranbûha sê saetan "biçopînim". Hevpeyvîna min bi wî re bi deng hat nivîsandin û ew ji min re bûye wek teberikekê. Min der heqê berhemên wî de kêmtîşt jê pîrsî, ji ber ku ewî bi çend dîwanên xwe ve di wê hêlê de êdî gelek tişt ji me re "gotibû". Ji min re hewaskar bû bizanibim ka Cegerxwîn wek mirov, welatparêz yekî

çawan e, yek ji çika çi berhemên wî yên neçapkirî hene, ew çiqasî hay ji pêşdeçûyîna edebiyat û çanda kurdên Ermenistanê heye, ew çawa qîmet dike?

Ez rastî wî mirovî hatim, ku der heqê wî de di dema xwe de gotibûn: "Gelê me helbestvanekî wek Cegerxwîn da, ji ber ku Kurdistan hewceyî dengê bilind bû û ew bû ew deng". Di berhemên wî de fîlosofiya "Dara azayê bi xwînê tê avdan", lîrika (nazîkayî) "Qelenê Kurdistanê yekîtiye", welatperwarî "Ev ne dîn e, ev dîntî ye, dîn serxwebûna millet e", evîndarî "Kurdistan bûka rû bi xêlî ye" hene.

Hevpeyvîna jêrê ji zarê Cegerxwîn çawa derketiye, wisa ji min nivîsiye, da ku em agahdarî zîmanê wî yê şîrîn û dewlemend bin.

Pîrs- Ji kerema xwe re behsa jiyana xwe ya ji dayikbûnê hetanî salên xortaniyê bike.

Bersiv- Ez sala 1903'yan, li Mêrdînê,



Em û ermenan xwe wek birayê hev dibînin, em du bira ne di Rohilata Navîn de, weke kurmanc dibêjin: "Em birîndarên şûrekî ne", ji ber vê derdê me û ermenan yek e

gundê Hesarê hatime dinyayê. Dê û bavê min karker, cotkar, perîşan û reben bûn. Sala 1918'an bavê min li gundê Amûdê (Cizîrê) çû ser dilovaniya xwe û diya min salekê piştî wî serê xwe danî. Ez perîşan û bindest, carna li bal xwîşka xwe dimam, carna jî diçûm bal birayê xwe. Û min bi vî rengî çend sal derbas kirin, perîşanî û rebenî dît, lê êdî min hew dikaribû îdare bikim, ji ber vê ez çûm xwendegha olperestî. Di wan çend salên xwendina xwe de min gelek bi xurtî dixwend û gavên xwe pêşde diavêtin. Paşê, gava êdî genc bûm, min sala 1927'an jin anî. Ew keça xalê min bû, ji gundê He-

gavê ronahî nedîtine. Û niha jî, ku emirê min digihîje 80 salan, ez ji gelek kovar û rojnameyan re dinivîsim, di civînên xort û cejnên Newrozê de diaxivim, di şevan de ji gelê xwe re dibêjim, ku li hember zor û setema dijminê xwe yek bin. Ez hêvîdar im, ku ew yekîti wê hêdî hêdî çêbibe. A niha pirîskên hêviyê bilind dibin, li gelek ciyan yekîtiya xwendevanên kurd çêdibe. Bêguman, yekîtiyeke xurt li Kurdistanê jî pêwîst e.

Pirs- Em dizanin, ku gelek berhemên te yên pêşîn salên siyî di kovara kurdî ya delal "Hawar"ê de çap bûne. Bîr û baweriyên te li ser wê kovarê çi ne?



sarê. Neh zarokên min çêbûn, du kur jê mirin, du kur û pênc keç man.

Pirs- Der heqê berhemên te de me pir, hindik bihîstine, xwendine. Lê ji me re he-waskar e, ku tu bi xwe der heqê wan de ji me re bibêji.

Bersiv- Hetanî niha heft diwanên min derketine. Ji bilî vana min çend serpêhatî jî nivîsîne, weka "Reşoyê Darê", "Cîm û Gulperî", "Medya û Salar". Hinek jî ji bo çapê amade ne, wek: çar perçe tarîxa kurd û Kurdistanê, sê perçe tarîxa jîndariya min, perçeyek folklora kurdî. Min kitabên kurdzan Minorskî, Xalfin û Nikîtîn ji erebî tercumeyî kurdî kirine. Lê heta vê

Bersiv- Kovara "Hawar"ê ez nikarim bibêjim, ku kovara kurdî ya pêşîn e, ku xizmeteke mezin ji bo gelê kurd kiriye. Lê ez dikarim bibêjim, ku ew ji wan kovarên hêja ye, ku karekî mezin ji gelê kurd re kiriye. Û xwediyê kovarê Celadet Bedirxan (Xwedê jê xweş be) dihat jimartin wek seydayekî torevan, seydayekî ristevan û xortekî nivîskar û aqilmendê çaxa xwe.

Pirs- Cara yekê ye, ku tu têyî Yekîtiya Sovyetê, lê te berê jî der heqê hal û demên me, kar û barên me de bihîstîye. Li ser vê meseleyê tu dikarî raya xwe bibêji?

Bersiv- Ez bi xwe, şexsen, ji Yekîtiya Sovyetê gelekî hez dikim. Ji ber ku doz û daxwazên gelê min cara pêşîn li vir pêk hatin. Ez bawer im, ku divê gelê kurd jî dost û heval û dilxwazê Sovyetistanê be. Ji ber ku welatê Sovyetê destûr daye rojnameya "Rya Teze" derxin û radyoya kurdî belav bikin. Û em kurdên derve jî gelek jê kar dikin. Em hêvî dikin, ku ew gavên, ku kurdên me di welatê Sovyetê de avêtine, hê firehtir û berepêş bavêjin. Bîrayê me yê mezin, Sovyetistan, rêzan û rêberê hemû gelê bindest e, hemû cotkar û karkerên cihanê ye. Em dostê Sovyetê

ne û xêrxwezê tevahiya partiyên cihanê yên pêşverû ne. Em her wiha dost û pişt-girê milletên bindest in, yên ku dixwezin xwe ji zor û setema dijminên xwe biparêzin, xwe gerdenazad bikin.

Pirs- Tu li ser pêşveçûna kurdên me çi dikarî bibêji û ew yek li Kurdistanê çawa tê qîmetkirin?

Bersiv- Em hêvî dikin, ku hûn gavên xwe bêtir pêşde bavêjin, xwe yek ji lawên Sovyetistanê bijmêrin. Eger Kurdistan azad bû, gihîşt doz û daxwazên xwe, wê demê pêşketina we wê kêrî me bê. Em ê ji Sovyetistanê hêvî bikin, ku çend kurdên jîr û zana bişîne welatê kal û bavan, ku alîkariya me bikin.

Pirs- Der heqê gelê ermen de çi dikarî bibêji?

Bersiv- Em û ermenan xwe wek birayê hev dibînin. Em du bira ne di Rohilata Navîn de. Tirkan, osmaniyan em gelek êşandine, weke kurmanç dibêjin: "Em birîndarên şûrekî ne". Ji ber vê derdê me û ermenan yek e. Em û ermenan em ê hela gelek caran kêrî hev bînin û divê kêrî hev bînin.

Pirs- Gelo tu yê carek ji caran bêtir Ermenistanê, mîvaniya me?

Bersiv- Wele, ez her gav dixwazim bîm Ermenistanê, ne tenê ji bo ziyaretiya birayên xwe yên kurd, lê ez her wiha dixwazim Ermenistanê jî bibînim, ji rewşa gelê kurd jî agahdar bibim, pêşketina birayên xwe yên ermenî jî pîroz bikim. Hema firsend çêbû, ez ê bîm.

Pirs- Belkî tu zanibî jî, li Yekîtiya Sovyetê, xasma li Ermenistanê, gelek ronakbîr, hunermend û nivîskarên me hene. Tu ji wana kesî nas dikî û dixwazî çi ji wan re bibêji?

Bersiv- Hozan û bîrewarên kurdên Ermenistanê li bal me payebilind in. Me navê wan gelek jê bihîstine, nivîstên wan xwendine. Mesela, navê Qanatê Kurdo, Heciyê Cindî, Erebe Şemo roja li

esmanan eşkere ye. Rehmata Xwedê li bavê te be jî. Ewî dengê kurdên Sovyetê gihand me. Radyoya kurdî li bal me pir qîmeta wê heye. Ez hêvî dikim ku xortên nuh radibin jî, şûna wan bigirin û gavên xwe ji wan bêtir bavêjin.

Pirs- Gelo qedera gelê me wê çawa be?

Bersiv- Gelê kurd gelekî serbilind e, tora wê ji tora bilind tê jimartin. Kurd ne paşdamayî ye, wek ku dijminên me dibêjin, ku kurd wehş in, hov in û li serê çiya dimînin. Lê em ne xelqê serê çiya tenê ne. Rast e, hinek millet ev qonax derbas kirine, me jî ew dewran derbas kiriye. Eger qonaxa me dirêjtir bûye ji ya tirk û ereb û ecem, ne sûc û gunehê me bûye. Wan nehiştine em bi pêş ve herin. Ji hêlekê ve zordestî li me kirine, ji aliyekî ve jî di xwendinê de em tengezar hiştine.

Pirs- Gelek sipas ji bo vê hevpeyvînê. Em ji te re jiyanekê dirêj dixwazin û bila qelema te bi adan be!

Bersiv- Ez sipas dikim ji van gotinên te re û dawiyê dixwazim bibêjim, ku di baweriya min de, weke ku zanyarî daye xuyakirin -jiyana wî mirovî, ku ji gelê xwe re bi paqîjî kar kiriye, dilpakî xebitiye, bîmire jî-sax e, bîmire jî nemirî ye. Weke soran dibêjin-"nemird e". Tê bîra min, gava hozanê mezin Bêkes miribû, bûrjûvazên kurdên Kurdistanê Îraqê pere li ser tîrba wî belav dikirin. Îcar, keçekê rahişt pereyên wan û qetand û got: "Bêkes sax bû, kesî jî we qurîşek nedayê, ji birçîna mir. Îro Bêkes miriye, ne muhtacê dinar û berhemên we ye! Bêkes niha di dilê jin û mêran de, xort û keçan de ciyekî bilind girtiye û hîç cara namir". Eger ez jî layîq bim, eger ez jî hêja bim weke Bêkes di dilê gelê xwe de bîmînim, ez tim jîndar im, ez bîmrim jî, ev hemû hestî û goşt û çerm herin jî, qîmeta wan tune, bila herin, lê ez ê di dilê milletê xwe de bîmînim.

Gelek sipas!

Jin li ba Cegerxwîn

Îkram BALEKANÎ

Cegerxwîn tu cudahiyê di navbera jin û mêran de nabîne, loma jî Cegerxwîn beşeke berfireh ji dîwanên xwe li ser rewşa jinê honandiye, ew di helbestên xwe de nîşan dide ku tenê naxwaze jin kebanî be, jin tenê dayik an xwişk be, ew dixwaze jin biryardêr û serwer be.

Cegerxwîn yek ji wan helbestvanên navdar e ku li Kurdistanê aliyên wî yên cur bi cur tînan nasîn û helbestên wî li ser zar û zimanê gel belav bûne.

Bi sedan helbestên wî bi dengê hunermendên kurd û bi tîla tembûrên wan hatine vegotin û bûne stran li ser zarên gel mane.

Aliyên wî yên humanîst, welatparêz, şoreşger û kurdistanî tînan zanîn. Lê nêrîna wî ya li ser jinan tu caran nayê nîqaşkirin û heta niha li ser vî aliyê Cegerxwîn kêmtîşt hatine vegotin.

Gava mirov bala xwe dide helbestên Cegerxwîn, cihê jinê jî di nava helbestên wî de baş xuya dike û ew girîngiyeke mezin dide rola jina kurd.

Di hin beşên helbestên xwe de ew di kesayetiya “Dayika Kurd” de rola jinê di siyaset, civak û jiyanê de radixe ber çavan. Bi gotina “Va ez diçim şer, va ez diçim ceng, ger bême kuştin, dayê tu negrî” rola dayika kurd di nava têkoşînê de nîşan dide ku çawa kevîrekî datînin ser hestên xwe yên dayikî û rê dide zarokên xwe ku tevî şoreşa gelê xwe bibin. Hin caran bi rêzîkên evînî jina kurd sembolîze dike. Lê ew girîngiyeke mezin dide pêşketina jina kurd.

Bêguman jin makeder û serekaniya jiyanê ye. Jin sembola aşî, dîlnîzmî û kaniya dîlovaniyê ye. Ew jêdera hezkirin û evînê ye. Jinan evîn li her derê belav kirine.

Cegerxwîn tu cudahiyê di navbera jin û mêran de nabîne û doza wekheviya jin

û mêran dike. Loma jî Cegerxwîn beşeke berfireh ji dîwanên xwe li ser rewşa jinê honandiye. Ew jî bo azadiya jina kurd têkoşîye. Ew di helbestên xwe de nîşan dide ku tenê naxwaze jin kebanî be. Jin tenê dayik an xwişk be. Ew dixwaze jin biryardêr û serwer be.

Ew jina kurd wekî dibistaneke mirovahiye û serçaviya perwerdehiyê dibîne. Cegerxwîn li ser vê baweriyê bûye ku ger jina kurd bi awayekî rast bê perwerdekirin, wê civak jî bi pêş bikeve û Kurdistanê bibê xwediyê civakeke çak û paqij.

Ji ber ku jin di perwerdekirina zarokan de roleke girîng heye û ew xwediyê rola sereke ye di perwerdekirina nifşên nû de. Loma jî dayik dikarin zarokan li gorî bîr û baweriyên welatperwerî, hestên kurdewar û têgihîştineke baş perwerde bikin. Ev yek jî tenê bi xwendina jinan pêk tê, loma Cegerxwîn bang li keçên kurd dike ku bixwînin û xwe bi pêş bixin da ku nifşekî paqij perwerde bikin. Dîsa ew li ser vê baweriyê ye ku tenê jin dikare bi xwendinê bigihîje azadiya xwe.

*Ey keçê rabe bixwîne da tu serbest her bijî
Zû jî xew tu ser hilîne bes bimîne bê mejî
Rencbera hundir tiwî tim rind û jîr û zane be
Bo te bêtir her divêtin xwendewarî paqijî
Wa hevalên te li her cî serbilind pêşve diçin
Rabe ser xwe ey keçê kurd serbilind bimre tu jî
Ger bixwînî dê bidî xwendin tu ê hundir teva
Ger nexwînî kes jî bo me êş û derda nakuji*

Cegerxwîn nav li jinan dide û bang li keçên kurd dike ku mil bi milê lawên kurd tevî şoreşê bibin û xizmeta netewe û welatê xwe bikin. Ew di kesayetiya dayika Rostem û Guhderz de careke din rola jina

kurd tîne bîra wan ku çawa piştawên xwe girtine û ew ber bi serfiraziyê ve han dane û teşwîq kirine. Loma jî bi marş û sirûdan hestên şoreşgerî yên keçên kurd jî hişyar dike û di sa rola xwendinê radixe ber çavan:

Ey keça kurd nû giha me tim dixwazim pêşveçûn

Doz û daxwaza me her dem tac û ala serxwebûn

*Tim divê ku em bixwînin da nemînin jar û dîl
Min nema êdî divêtin ev xeyal û qal û qîl
Paqijî karê me ye seydayê hundir her em in
Dayika Guhderz û Rostem kurdperest û dîlxem in*

Cegerxwîn ne tenê di helbestên xwe de cih daye rola jina kurd. Belkî wî bûyerên li cihanê qewimîne ji nêz ve şopandine. Bi rasthatina 8'ê Adarê, Cejna Jinên Kedkar ên Cihanê re Cegerxwîn jî dîlxweşiya xwe diyar dike, hestên xwe tevî hestên jinan dike. Ew behsa têkbirina sembolên kolektîyê, şikandina pûtan, qetandina zincîrên kolektîyê dike û dîlxweşiyê dide jinan. Ew jî wan dixwaze ku bi wêrekî bi serbilindî bijîn:

Heştê adarê roja me hilat cejna jina ye, jinên demokrat

Vê roja pir xweş, roja dîlşadî roja serbestî, gerdenazadî

Qeydê lingê me wê rojê şikand ew çarîka reş me girt û çirand

Em bûne wekhev tevde jin û mêr, li me zû derket ev roj û stêr

Cegerxwîn hin caran jî bihêztir bang li jinên kurd dike û jî wan dixwaze ku jî bo serfirazî û serkeftina welêt bikevin nava xebatê. Ew dixwaze ku jin mil bi milê mêran tevî şoreşê bibin û di avakirina civakeke azad de bixebitin. Cegerxwîn dixwaze jin di nava şoreşê de bigihîje azadiya xwe û bang li keçên kurd dike ku girêdayî doz û daxwazên gelê xwe bin û tevî şoreşê bibin:

Keçê rabe serî hilde, di vê çaxê weha



nabî

Binêr jin çûne ezmana, heta kengî di xew da bî

Bila gundî û rencher bî, welatparêz û perwer bî

Sipî bî yan tu esmer bî, wekî fanos û fînda bî

Erê şoxê erê şengê, bi hev re em herin cengê

Girêdayî heta kengî, bimînî dîl û wenda bî

Cegerxwîn baş dizane ku ger jin têbikoşê wê azad bibe û wê bikeve nava refên azadîxwazan. Loma jî jinan dixwaze ku ligel mêran dakevin qada têkoşînê:

Jinê rabe ser xwe, tu destan vemal

Tu rextan girêde li bejna delal

Di gel min were da bikin em xebat

Li ser min li ser te felata welat

Wekî min tu xweş dawer û bîrewer

Dixwazim bi hev re herin ceng û şer

Bi tektîk û bîr û bi can û bi dîl

Bi hev re herin pêş hemî mil bi mil

Bi van çend mînakên baş derdikeve holê ku Cegerxwîn gelek girîngî daye têkoşîna jina kurd û azadiya wê xwastiye. Armanca wî jineke bîrewer, azad, demokrat, pêşverû ye. Wî xwestiye bi vê yekê di Rojhilata Navîn de civakeke azad ava bike û wekî şaristaniyeke nûjen pêşkêşî Rojhilata Navîn bike.

Du halên helbesta Cegerxwîn*

Remezan ALAN

Di destê yekî wekî Cegerxwîn yê ku hem ji tradîsyonê sûd werdigirt û hem jî li ser erka şiyarkirinekê helbestek ava dikir, li şûna çareseriyekê sê çareserî hebûn: “Xwendin û zanîn”, “piştgiriya proleterî” û “serpola û gurçikhesiniya berê”!

Di serboriya helbestê de *dîrok*, bi qasî *zeman* bêjeyeke bextewar nîn e. Tê de rengên ezmûnên şexsî û ruhên hunerî nîn in. Heta mirov dikare bibêje *dîrok*, ne di nav tixûbên helbestê de ye. *Zeman* çiqas layîqê risteyan hatibe dîtin, *dîrok* jî ew qas di nav polê hevokan de hatiye lehîmkirin. Halbikî *zeman*, *cewherê dîrokê ye*, ew di hundirê *dîrokê de xwe vedike*.¹ *Dîrok*, ewra *zeman* e. Belkî jî ji ber vê yekê, di helbesta kurdî de *dîrok* û *zeman* du *hal* in. Lêbelê du halên dijî hev: *Duha xweş û îroya xirab*!

Bêguman di nav van her du halan de hiş, çiqas ber bi *dîrokeke* qedîm ve here dê ew çend *zemanekî yekpare* “keşif bike” û çiqas ber bi iro ve were jî dê qala *zemanekî parçebûyî* bike. Belkî jî lewma heta noqteyekê, çi civakî çi şexsî, “rêwîtiya ber bi hundir ve” dê teqabilî *serdemeke bextewar* (bihuşteke winda) bike. Û li ser jidestçûyîna vê “serdemê” dê guftûgoyeke îroyîn xwe bide dest. Ku di wê guftûgoyê de bi qewlê Edward W. Saîd, trajediyeye qismî ya rewşenbîr, helbestkar û pêşewayên berxwedanê hene. Ji ber ku ev kes, wek Saîd jî dibêje mecburî kar û emelekî ne ku li ser “bixebitin” û ji bo hevgirtiyeke berfireh, hesteke civakî ya hevpar biafrînin û li pey ol, leheng û mîtosên nû bikişvin.²

Lêbelê eyne, tenê vî dengê ku pariyek dîdaktîk û giştî ye nîşan nade. Bi gotineke din, di rûyê eyneyê de tenê dengê helbestkarên ku ji bo afirandina *dîrokeke* nû, barkirina saetêke nû gelê xwe (Selaheîn û Rustemên îroyîn) dawetî berxwe-

dan û cengê dikin, nîn in. Tê de rêçên rêwîtiyên şexsî jî hene ku neyekparebûna *zeman*, bi wan re hin maneyên din bi dest dixin.

Jixwe mebesta vê bendê jî ew e ku di derza eyna *dîrokê de destpêka* van her du *halan* destnîşan bike, qala serencam û rengên wê bike.

...

*Heyf e tu kurê Rustem û Guhderz û Silah î
Îro tu di gundê beg û axa de felah î*

Şert û mercên bindestiyê, perîşaniya ku jê diwêlîde û çareserîya wê, di Koyî de nûveyek e. Bo hemû tezaxûrên wê bindestiyê û çareserîya wê, lazim e mirov li benda Cegerxwîn be. Bi rastî jî ew yekemîn helbestkarê fikra *jî mêtinkariyê rizgarbûn* e³. Di wî de şertê îtifaqê, wek qonaxên tekamûleke şexsî, qulibiye ser şoreşeke çînî. Dîsa bi gotina Saîd ew e “axa xwe bi şûnde dixwaze” û “cardin dixwaze li ser axa xwe bi cî bibe”.⁴ Ji ber wê yekê jî serî heta dawiyê, di Cegerxwîn de navlêkirineke ku dinyayê dike du felq heye: Ew çima xwedî ne, em dergevan? Ew çima jê diçinin, em baxçevan? Ew çima şerîf û dewlemend, em xulam û bende? Ew çima nivîşkê teze dixwin, em rûnê genî?..⁵

Ev îstîareya ku dûvê wê bi her helbestê qiloqanî dibû, ne bê berdêl bû. Ev berdêl, dîdaktîzm bû. Di her beşên dîwanên ku Cegerxwîn navê “birê welatperwerî” lê kiribû de vê dîdaktîzmê serê xwe derdixist û silavek dida. Elbet bi vê merhebayê re, axa helbestê jî bi ser pexşanê ve dişemitî

û sînorên helbestê hinekî din teng dibûn. Lê Cegerxwîn ji vê rewşê hayedar bû. Wî qîma xwe bi vê realîteyê anîbû. Li gorî wî *zeman sed firsetên heja û belaş dabû şair û edîbên kurd, lê ew bi baskên şêr mijûl mabûn*,⁵ lewma wekî qederekê, jê re *cegerxwîniya nijadekî nezan, reben û xîzan ma(bû)*.⁶ Di helbesta “ji Xameya Min re” de ev erk gelek êşkere hatibû gotin: “*Bi te ez nijadê xwe hişyar bikim / Bi carek li cenga neyar kar bikim*”⁷

Ev ajotîbûn, ev mêla jidil, hebûna helbestê û erka sazkarê wê kir yek: *Şiyarkirin!* Lewma gelek helbestên wî, bi risteyên wek, “Werin dîsa ji xew zû hon şiyar bin”, “Heta kengî di xew da bî”, “Ey kurd ji xew rabe”, “Hey qehreman milletê kurd şerm e tu razî”, “Dixwazim te rakim ji xew ey xewar”, “Nezan bê çu nabê hişyar”, “Gazî dikim kurdên xewar”... dest pê kirin û sewteke bilind ji xwe re kirin dengê yeke-mîn.

Ev sewt, elbet di nav tîfinga rexneyê re qîloz bû. Hê di helbestên pêşîn de berê vê tîfingê dirêjî mêtinkaran û hevalbendên wan bû. Li gorî Cegerxwîn, beg û axa û şêxên *vî zemanî*, destê ku bi xwîna kurdan sor bûbû girtibûn û niha ji wan *her yekî bi hezar rengî dixwar vî milletê dîl*. Wezîfe ew bû ku mirov vê rewşê pêşberî bindestan bikira û di nav şerê çînî de ciyê xwe tayîn bikira!.. Wî ji bi riya helbestê wisan kir, lê di vê pêşkêşkirinê de helbesta wî rastî astengiyeke din hat: *Tekrar!* Ev tekrar, tekrareke wisan bû ku di diwanekê de hemû diwan vedigotin, di eyniya diwanekê de hemû portreyên helbestkar destnîşan dikir!.. Lê mifta sedema vê tekrarê ji dîsa wî dabû destê me:

“*Serî hişk e wek kevîr*

Divê bişkê bi bivîr

Divê gurzan deynim ser

Yan jî jê re bêjim her”

(*Şefaq*, r.22)

Cegerxwîn, *xwediyê ayetên kurdî*, bê rawestan û bê endîşeyên hunerî, hişyar-kirina milletê xwe ji xwe re kir armanc. Ji

bo kesekî ji vê helbestê hayedar, ev agahiyên jirêzê ne. Lê tiştê ku me eleqedar dike ev e: Cegerxwîn, vê rewşê, di nav perspektîfeke dîrokî de, di nav duh û îro de, pêşkêş dikir. Ev pêşkêşî ji bo nasnav û helwesta netewî, nuqteyêke hereketê dadimezirand, lê nakokiyek jî bexşî Cegerxwîn dikir. Ji ber ku mîr û beg û şêx û melayên duh *xurtemêr û canfida* bûn; û heman kes îro bûbûn *qelsemêr û xwînmij*.

Belê “îro”; tamsarî, perîşanî, nexweşî û zindaniya xwe, ji kar û barên van kûçikên aliyê guran digirt. Xelq, ji ber destê van îro *li ser şax û zinaran dijîn, kevîr ji wan re bûye balîf, qad ji bo wan bûye doşek, di nav kuştin, lêdan û talanan de li çolan wekî hacî leglegan dibezin*.⁸ Welatê şêran (ku helbesta *Welatê Çirto û Virto* alegoriya vê rewşê ye) *ketiye destê rovî (şêx û mela) û mişkan (beg û axa)*. Yanê *şer ketiye hindurîn*.⁹ Lê miqabilê wê, duh, xweş bû. Nexasim helbestên wek “*Şehname Şehîdan*”, “*Bêriya Welat*”⁸ û pirtûka *Şerefnameya Menzûm*, bi hemû leheng, mîr, bajar, sirûşt, jiyan, dilşadî û dewlemen-diya xwe ve yadkirina wan *xurtemêr û dîlbijiyî* wan serdeman bûn:

“*Ka Ferîdûn, ka Dîrefş, taca Keyan li kû ye,*
Ka Guhderz û ka Rîstem, ka ew meydan li kû ye?

...

Ka mîrekên li Baban, ka paşayê Rewandîz
Ka Cîzîr û kanî mîr, ka Bedîr-Xan li kû ye?

...

Ka ew deşt û ka çiya, ka ew av û ka giya
Ka ew kon û ka koçer, ka ew zozan li kû ye?

...

Ka ew ken û ka geşî, ka şadî û ka xweşî
Ka sersal û ka nûroj, ka mihrecan li kû ye?

...

Ka ew zîv û ka ew zêr, ka kaniyên gaz û qîr,

Ka ew terş û ka talan, ka ew dewran li kû ye?”

(*Agîr û Pirûsk*, r.36-37-38)

Belê, mêraniya berê, desthilatdariya serdemekê, jiyan û adetên wextekê, dîlşadî û dewlemendiya zemanekî, ji dest çûye. Û ji vê têkçûnê, tenê kul û keser dipengizin niha...

Ne tenê di *Agir û Pirûsk*, an *Şerefnameya Menzûm* de, di dîwanên wek *Ronak*, *Zend-Avista*, *Kî me Ez*¹⁰ û *Şefaq* de jî (ku vegotina wan a îdeolojîk ji yên din tîrtir e) xema vê têkçûnê domiya. Cegerxwîn çî wek kurderwer û çî jî wek sosyalistekî, di hundirê “duh”

de tenê lehengên mezin, mîr û begên canfida û însanên xîretkêş dît. Di nezera wî de gunehên duh –ku hebin eger!– piçûk û bêqîmet bûn. (Ku wek marksîstekî, hîdûdê nakokiya wî jî ji vir dest pê dîkir.) Duh, zemanê bav û kalan, zemanê kar û kesên qenc bû. Zemanê lehengên muhtêşem î wek Rustem, Guhderz, Behramê Çopîn, Deysem, Gorgîn, Selahedîn bû. Ji her tiştî wêdetir wek ku Koyî jî digot; zemanê mîrekiyên serbixwe bû...

Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku hêlengandina (nirxandina) rehma tiyê Ordixanê Celîl, yekalî ye. Çimkî wî di tevahiya xebateke xwe de digot ku Cegerxwîn dijmînê beg, axa û şêxan e,¹¹ lêbelê nedidît ku serê rima vê dijmînahiyê tenê li “îro” ye.

(Li vir divê em qala helbestekê –*Berê û Nuha*– helbesteke pêşwext bikin. Ku xwediyê wê Ekrem, di nav qiyaseke Koyîwarî de dibêje *berî hezar salan kurmanciyeke pur delal* hebû, *xortên wî* di nav *bêder û dîwanan* de dixebitîn, *mêr xweyî şûv û qesrên nav rezan* bûn, di *vî welatê gelek* *ava de mêr, axa, cotkar û təcîr tev bira* bûn û *jî ber çêyiya serekan Îranî û Tûranî* *jî ber wan datanîn*; lê her ku *xebatê bîr kirine*, *çêyiya serekan nemaye* û heman



serek di an eşîran de bûne nola gura, xwediyê vî zîmanî jî bûne *girtiyê destê xelqê* ku tew jê *xeman jî naxûn*.¹²)

Ji bo bindestî û perîşaniya îro, di destê Cegerxwîn de reçeteya çareseriyekê heye? Bêguman! Di destê yekî wekî wî yê ku hem jî tradîsyonê sûd werdigirt û hem jî li ser erka şiyarkirinekê helbestek ava dîkir, li şûna çareseriyekê sê çareserî hebûn: “Xwendin û zanîn”, “piştgiriya proleterî” û “serpola û gurçikhesiniya berê”!

Xwendin û zanîn (temaya jî Xanî û Koyî dihat), di dîwana yekan de bi heman bêjeyan hat binavkirin: *Dermanê me ye xwendin û zanîn*.¹³ Di dîwana duduyan de jî bi rengê risteyên wek *Du derdên me hebûn dijwar û xeddar / Xîzanî yek ew ê dî her nezanî*¹⁴ didomîya. Lê di heman dîwanê de, rengêkî din (ji “îtifaq”a Xanî û Koyî wêdetir) xwe da der: “Prolêtar”! Cegerxwîn di helbesta “Ey Kurd Ji Xew Rabe” de bi coş û eşq qala hêza “lehiya sor” kir ku wê lehiyê dê dijmîn û kedxwar bidana ber xwe û dawî li wan bîaniya; û dîwana *Kî me Ez* de vê carê bi navê “Lehiya Sor” rengê daxwaza xwe eşkere kir. Di dîwanên din de, îmkana van her du rêyan (xwendin û sosyalîzm), wek êwreke hişmendî û mixabin carna jî wek gunehêkî siyasî (bi pesnê Stalîn re) bû yek: *Me bêje tenê kurdewarî bes e / Ew ê ku li xêra me ye Markîs e / Bixwêne, bizane hela ka çî ye / Heçî tiştê gotî hemî qencî ye*.¹⁵

Lê rêya sisêyan (gurçikhesiniya berê), di hemû dem û dewrên Cegerxwîn de, wekî qiyas û tehndayînekê ma. Banga ku digot *ey zariwên Guhderz û Dara, ey Kurê Keyqubat û kurê Erdeşêr, ey kurê Rustem û Guhderz û Silah*; bi van dawî dibû: *Şerm*

e dijmin ji ber me bigrin vî warî, çi şerm e wilo ko te ser daye jêr, heyf e tu îro tu di gundê beg û axa de felah î...

Jixwe di vê heyamê de mirov dil dike bipirse: Gelo ev her sê çareserî, ku bi zimaneke demodîk (gelêrî) û didaktîk dihat vegotin, ne ji bo “xewna pêşerojê” bûn? Bêguman! Ji ber ku rexneya zemanê îroyîn, vî barê ha digire ser xwe: Pêşeroj mecbûr e ku azad û adil be! Ew şoreşa ku dê vê yekê pêk bîne, divê cehaletê, mêtinkariyê, bêitifaqiyê, ferqûmêliyê tune bike; wê “wekheviya destpêkê” dagerîne. *Ketin an têkçûn*, dê bi şoreşê ji holê rabe. Yanê di çerxa hişê Cegerxwîn de jî aqibeta dirokê ev bû: Roja serxwebûnê / roja paqijiyê / roja bêqusûr / bihara ebedî / Newroza duyemîn... dê miheqeq bê. Li dû *biyekbûnê* (zayîn / welat), *cihêbûn* (mirin / xurbet) bê jî, dê *cardin-biyekbûn* (vejîn / vegera welat) bi ser bikeve! Ji vî aliyê ve mirov dikare bibêje ku helbesta Cegerxwîn, digel baweriya xwe ya îdeolojîk, zemanekî mîtolojîk vedibêje:¹⁶ Bi têkbirina Îblîs / Dijminê Çînî / Mêtinkar re, dê kirêtbûn biqede û ew zemanê yekem, ew dema yekpare, ew ê ku însan tê de parçe û dubend nebûbû, dê dest pê bike:

*“Bi hev re xebat û bi hev re xelat
Ji bo me tevan kar û mal û xelat
Di nav me de mehêlin çi zor û setem
Ji xwe dûr bikin tev kul û derd û xem
Heçî dewlemend bin, hemî kar bikin
Hebûnê bi hev re li xwe par bikin
Mehêlin kesek parsek û bêqeram
Tu serbest here London û Misir û Şam
Çi ne gumrik û deskere, paseport
Bi serbest herin, bèn hemî qîz û xort
Bibin wek welatê te her qad û cî
Bere kes nebêjî bi kû ve diçî
...*

*Welatê me ye xweş gelek xweş dibî
Riwê her kesî dê bi wî geş dibî”*
(Zend-Avista, r.118-119)

Ger pêşbiniya Cegerxwîn ji aliyê dirokê

ve nehata pûçkirin û siya hin *gunehên siyastî*¹⁷ neketa ser helbesta wî, dê wek baweriyekê, fikra şoreşê tê de zindî bima. Lê digel şeweya wî ya muştaqê tradîsyonê, barê şiyarkirinê û tkrarên bêdawî, di nav xweliya “duha xweş” de ji bo “pêşeroja ronak” peloxeke wî heye. Ji ber ku dengê asî û gur ê Cegerxwîn, di nav rewşeke zindî de olan dide û ew deng wek serê ti-fîngekê dirêjî wan kesan dibe ku “îro”ya qewmekî lê kirine dojeh.

Hezîran 2008

^{*} *Ev nivîs, beşeke Em Di Eyna Dîrokê De ye ku temamê wê di xebata bi navê Bendname de, di nav weşanên Avestayê de di meha Gelawêjê derketiye.*

¹ Octavio Paz, Çamurdan Doğanlar, werger Kemal Atakay, Can, 1995, r.20.

² Edward Said, Kültür ve Emperyalizm, werger Necmiye Alpay, Hil, 1995. Binêrin beşa “Dîreniş Kültürünün İzlekleri” (Temayên Çanda Berxwedanê), r. 318-340

³ Vê tēgeha Edward W.Said, Necmiya Alpay ji bo tirkî wek “sömürgecilikten çıkış” wergerandiye.

⁴ Edward W. Said, h.b. r. 340.

⁵ Gerçî Koyî ji carna dūvê vî qiyasê digirt û digot, “Ewaney mulki xoyan kirde dewlet / Ême heqîr û bîrûmet”, “Sahîb kutub û peyam e her kes / Ême nebê bûyne qewmî çerkes”...

⁶ Cegerxwîn, Agir û Pirûsk, Avesta, 2003, r.29.

⁷ Cegerxwîn, h.b. r.81.

⁸ Cegerxwîn, h.b. r.70.

⁹ Cegerxwîn, h.b. r.28.

¹⁰ Cegerxwîn, Şefaq, r. 63.

¹¹ Nazîreya Herekol Ezîzan (Celadet Bedirxan) a bi navê “Bêriya Botan” jî, ku Cegerxwîn dengê jî xezeleke Koyî û Koyî jî ji mersîyeyeke Xanî wergirtibû, di nav heman hisreta demên têkçûyî de diaxive.

¹² Helbesta “Kî me Ez”, hem mîrxas û gemasiya zemanekî dibêje û li ser kokeke ripin a ku ji Kardox, Xaldêw, Mitan, Nayrî, Sobarî, Horî, Gûdî; kurmanç, kelhor, lor û goran şîn bûye cih dide xwe û hem jî bi domdarî bindestî û zigurdiya îro bi bîr tîne.

¹³ Ordîxanê Celîl, Cegerxwîn’in Yaşamı ve Şiir Anlayışı, Evrensel Basım Yayın, wergera tirkî Edîb Polat, 2004. Di qapaxa hundirîn de navê orijînal ya kitêba kurdî wek Poêziya Cegerxwîn e Bajarvaniyê derbas dibe.

¹⁴ Ji bo temamiya vî helbesta balkêş binêrin Rojî Kurd, Kovara Cemiyeta Hêvî, Sal 1913, Weşanên War, 2002, r.122.

¹⁵ Cegerxwîn, Agir û Pirûsk, r.121.

¹⁶ Cegerxwîn, Sewra Azadî, r.55.

¹⁷ Cegerxwîn, Zend-Avista, r.118.

¹⁸ Ji bo xwendineke wîsan binêrin Mircea Eliade, Le Mythe de l’éternel retour / Ebedî Dönüş Mitosu, wergera tirkî Ümit Altuğ, İmge, 1994, nexasim beşên wek “Zehmetiyên Dîroktîyê” û “Azadî û Dîrok”. Li gor Eliade, navbera zemanên mîtolojîk û zemanê wedkirtî yê şoreşan de tu fêr qî nîn e. Ji ber ku digot Eliade, di dawîya dîroka felsefeya marksîzmê de jî “dewra zêrîn” a eskatolojîyên qedîm hene. (r.143)

¹⁹ Gerçî ev *gunehên* ha ne tenê yên Cegerxwîn in; ku em li Octavio Paz binêrin em ê bibînin ku Neruda, Aragon û Eluard jî ketibûn *gunehê Stalînperweriyê*, ji ber ku Stalînperwerî îro, jî şaşıyekê bêtir bûye qisûrek. Ji bo van teferûatan binêrin Öteki Ses, Şiir ve Yüzyılın Sonu, (Dengê Dîn, Helbest û Dawîya Sedsalê) wergera tirkî Hüseyin Demirhan, Sutenî, 1995, r. 80.

Temaya helbestên Cegerxwîn*

Rezoyê OSÊ

Hestên azadîxwazî û serfiraziyê, di navbera Cegerxwîn û cengdarên cîhanî de, hevpar bûn û pêrgî hev dihatin, Pol Robson jî yek ji van stranbêjên şoreşger bû

1. Evîn:

Evîna Cegerxwîn evîneke sermedî ye, lewra mercên evînê li ba wî zor û giran in. Belê:

Hetta di îşqê wer nebî, dil wek biyokê zer nebî

Wek Mem evînperwer nebî, ma tê bi wê Zînê çikî

Cegerxwîn di evîna xwe de noq dibe, êdî amade ye can û dil jî di ber yara xwe de winda bike û xwe bike goriyê evîna xwe:

Ez ji xew rabûm, gulfiroşek dî

Pir gelek şa bûm, gul bi dil didî

Gul bi dil didî

Bazar me kir, go ser bi ser nadim

Ê gulperest bî, can û dil didî

can û dil didî

Erê, Cegerxwîn di evîna xwe de giha, lê yara xwe nehişt veşartî di dilê xwe de. Xwest yara xwe bi her kesî bide naskirin, loma ew bi nav û nîşan kir û rewşa wê jî diyar kir:

Ji bona her kesek yarek heyê min welat yar e

Belê çi bkim di destê dijminê xwînawar û xeddar e

Cegerxwîn rûmeta evîndariya xwe bi hebûn û geşbûna evîndara xwe dinase:

Ger ne bilbil dilbijokê sorgula rûgeş bitin

Rûmeta wî bilbilê bê sorgula rûgeş çi ye

Lewra Cegerxwîn dikeve pesnê sorgula xwe ya rûgeş, dibêje:

Welatê min tuwî bûka cîhan î

Hemî bax û bihişt û mêrg û kanî

Şepal û şeng û şox û naz û gewr î

Gelek şêrîn û rind û pir ciwan î

Wilo, ne tenha Cegerxwîn ket agirê evîna dil, da ji ber bike qîrîn û hawar, lê dilbera wî jî bi agirê wî hat sotin:

Dûr ketim nêzikî her dem min di dil danî welat

Nagirîm îdî nemaye dewrê giryanî welat

Pêtiyên agir ji hilma min gihan çerxa felek

Min Cegerxwîn bûye agir te li ser danî welat

2. Derd, êş û jan:

Ji derdê dûrketina yarê dilê Cegerxwîn ji derdan mişt dibe û dibe pengaveke ji ahînan:

Me dil pingave kûr û bê perave

Ji ahîna du dêmên wek nivîşke

Lê, ji ber bidestxistina yara xwe, Cegerxwîn dikeve kêferatê, dibe Zab û Ferat, dikele û dinale:

Wek Ferat û Zab û Dicle, dil dinalî roj û şev

Xum-xum û guv-guv dikim wek kerkeşa pîrê me ez

Dilbera Cegerxwîn guh nade êş û azariya wî, loma gazinan ji nazdar û şepala xwe dike:

Nazedarê nûbiharê sorgula ser şax û darê

Rû dibin çar û xumarê, dêmduz û ebrû keman

Dilber û şox û şepalê neynika, ewq û şemalê

Guh neda wê nalenalê fêde nakin sed eman

Cegerxwîn di rewşa dîlbera xwe de mijûl dibe, lê tu riyan jê dernaxe. Loma gazinên xwe digihîne Xwedayê jorîn, da berê xwe bide rewşa wî û wî ji bîr neke û daxwaza wî, di vê rê de, bi cih bîne:

Di tarîka şeva hicran çiraxek sîfet im ya reb

Ji ser heta piyan ar e, bi carek vêketim ya reb

Meger ez Rustemê Kurd im fîraqê ez nexweş kerdim

Cegerxwîn im siyahçerd im, di kunca xelwet im ya reb

Wilo, Cegerxwîn li ser rewşa civaka xwe dihêwire, li ser sedemên dûrketina ji dîlbera xwe radiweste. Piştî vê lêmijûliyê êşa xwe destnîşan dike û tiliha xwe datîne ser birînê:

Du derdên me hebûn dijwar û xeddar

Xizanî yek, ewê dî her nezanî

Weke şêr û pilingan em diçûn hev

Penîr rovi ji meydanê hilanî

3. Bandora sosyalîzmê:

Bandora sosyalîzmê, di hozanbêjiya seyda Cegerxwîn de, bi gelek awayan diyar dibe û ramyariya wî, di demeke dirêj de, dorpêç dike. Nemaze piştî biserketina şoreşa Oktoberê û serkêşê wê Lenîn û di pey wî re Stalîn:

Me ji Lenîn û Stalîn girtin ev rêçik û dîn

Ko tu seyda wilo erzan bikûzî

nîne rewşa

Seyda piştixwirtiyekek di hebûna Leşkerên Sor de didît. Vê baweriya wî bêhtir cih girt, nemaze piştî damezrandina Komara Mehabadê. Loma bawer bû, ku azadiya kurdan, bi hebûna vê sistemê ve, girêdayî ye:

Ey Kurd tu bizane ko cîhan her dem û dor e

Serbestî û azadî bizan kotek û zor e

Zincîrê ji gerden bişkîn zû were meydan

Îdî tu metirs pişt û bira leşkerê Sor e

Di bin siha vê bandorê de, Cegerxwîn xebata xwe berdewam kir û rewş û cenga welatê xwe bi ya navnetewî ve girêda, lê bi taybetî beşa sosyalîzmê. Bi asanî destê xwe dida destê hemû azadixwazên cîhanê yên li dijî emperyalîzm, kolonyalîzm û kevneperestiyê. Wilo, şerê dek û dolabên ku ne tenê di Rojhilata Navîn de dihatin danîn dikir, lê wilo jî şerê hemû peymanên leşkerî dikir. Li ser peymana Tirk û Pakistanê dibêje:

Peymana dîlî, gerdenşikestî

Tijî koletî, hemî bindestî

Zincîra dîlî giran û dugurd

Xiste gerdana Tirk û Laz û Kurd



Wilo jî peymana Bexdayê şermezar dike û tinazên xwe bi peymandarên wê dike û dibêje:

Destên Îsmet şikandin wa xistine ceb-sînê

Dijmin li Tirk siwar e, Beyar digre dez-gînê

Kurd bindest e li pey wan tenê dikî nîf-rînê

Diçin riya felaket qet guh nadin qêrînê
Bi miletên azadîxwaz re şahî dikir.
Lewra serketina miletê Vietnamê,

di şerê Diyan Biyan Fû de, pîroz dike û payebilind dibîne:

Diyan Biyan Fû, Diyan Biyan Fû

Lingê koledar ji ser te rabû

Kurên te gernas xwe dane kuştin

Navek pir bilind ji bo te hiştin

Hestên azadîxwazî û serfiraziyê, di navbera Cegerxwîn û cengdarên cihanî de, hevpar bûn û pêrgî hev dihatin... Pol Robson jî yek ji van stranbêjên şoreşgêr bû, yên ku Cegerxwîn gaziya xwe lê dike:

Dengê te ê xweş her kes dixwazî

Wî dengê şêrîn...

Bêje ey heval, hevalê delal

Bi saz bi qîrîn...

Bimre koledar, bimre koledar

Bijî azadî, bijî serbestî

Wilo jî dengê xwe digihîne hem û azadîxwazan, da destan, bo serxwebûna xwe bidin hev:

Hindî û Çînî, Erebb û Hebeş

Hemî bibin yek, çi gewr û çi reş

4. Ceng:

Seyda, di rêvebirina cenga xwe de li pîrsa xwe ya gelêrî dihêwîre û dipelîne, ku komeleyên navnetewî jî piştî xwe dane vê pîrsê. Lewra li wan dike hawar:

Komela heqê mirovan, heqê her kes daye wan

Dengê Kurd kes nabihîze sed hewar û sed eman

Wilo jî berê xwe dide birayên xwe yên misilman. Dide wan kesên, ku wekhevîyê, di mafên mirovanî de, di civakên xwe de dixwazin, lê rê nadin zimanê Kurdî ku bi rola xwe rabe:

Ev birayên me misilman dev ji me bernadin

Qey rast e em kole ne ew ji me re esyadin

Heqê jin û hiqûqê insan dixwazin

Lê destûra zimanê me ji me re qet nadin

Êdî Seyda, rêvebirina cenga xwe bi durustî dipelîne. Dibîne ku berî her tiştî guhertin di nava civaka wî de pêwîst in, lewre xwe jî vê cengê re diçikilîne û wê li sê zîlanên bingeîn dabeş dike: aborî, civakî û zanistî.

a. Di warê aborî de:

Seyda dibîne, ko rewşa aborî roleke mezin di warê pêşketin û xwenasînê de, di warê şiyarbûn û çavbelkirinê de dile-yîze:

Miletê reben qet nabî hişyar

Malê te dixwin bi zor û bi dar

Ji bo ku civaka Seyda, di warê aborî de, li ser piyên xwe raweste, gazî dike ku her kes berê xwe bide kar û ji keda xwe bijî. Nemaze ew beşa ku xwe dispêre pars û zekatê:

Ew dewr û dolabê dinê ma jê tu çi dibînî mela

Cotkar jî wek te ma reben, tê jê çi bistî mela

b. Di warê civakî de:

Ji bo Seyda hevalbendan di vî warî de li xwe bide hev, dijminê qada bindest pê dide nasîn:

Paşa û begler, axa û muxtar

Malê te dixwin bi zor û bi dar

Lê şêx û mela dixwin bi nivişt

Seyda vê beşa civakê di çav hevalbendan xwe de rûreş dike, dema wan dike dostên neyaran:

Axa li ser masa neyar kasê li kasa wî didî

Wilo jî wan bi zikreşî û xedarî berçav dike, dibêje:

Me dî şêxek bi şaş û cubbe derket

Wekî şahan ji bircê hate xware

Me dî çav û birû tev de dilîzin

Me zanî ev ne şêx e, koremar e

Seyda, di vê cengê de, destê xwe dide destê qada bindest. Dide karker, cotkar û belengazan. Da bi hev re şerê şêx, mela, beg, axa û hemî çinên serdest û ew kesên ku piştî xwe dane pirsî gel bikin. Lewre geh şîretan li vê beşê dike, geh jî li wê beşê dike. Berê xwe dide melan, ew birewerên civakê, gazî dike:

Mela rabe ji xew îro

Heta kengî mirîşo bî

Bi destê dijminê mîlet

Ne şerm e, ko tu kaşo bî

Wisa jî diyar dike, ku dinya çerx û felek e, dem û dewran e, ji kesekî re namîne û zordestî dom nake. Belê ev çerx nola gera ferên êş e:

Ger li aşî guh bidêrî çerxê gerdûn tête bîr

Ê nezan qet nabihîzî xeyrî deng û çeq-çeq e

c. Di warê zanîn û nasînê de:

Seyda êş û jana civaka xwe, berî her tiştî, di kewdeniya gel de didît. Hawar dîkir da ku nîfşê nû berê xwe bide xwendin û zanînê, dergêhê pêşketinê :

Xwendin nebî kes naçe pêş

Peyda dibin pîr derd û êş

Ji bo jina kurd jî, di vê civakê de hevpar û hevpişk be bi beşa mîr re, doza şî-

yarbûna wê jî dîkir. Doz dîkir ku girêben-dên civaka kevnar biqetîne. Yek ji van girêbendan jî serûk bû:

Sed tif li wê perda te bî

Ko daye ber xalên di qer

V. Dengdan:

Seyda kok û bingehe nav û dengê xwe xweş dizane. Wilo bi asanî û rewanbêjî ji yara xwe re dibêje:

Eger şox î, eger şeng î

Eger rind î, siptî-reng î

Li ser te min bi vî rengî

Di nav kurdan de deng daye

Dimîne, em di dawîya vê kurtexwendina xwe de bibêjin ku Sedsaliya Cegerxwîn birinên me ji nû ve vekirin. Erê Seyda bûye birîna hemû dilan, lê wilo jî bûye çiraya hemû malan û gula hemû zaran. Jêmayên wî bûne findeke veketî di jiyan û ramanên mîletê wî de.

Seyda, li gorî bilindbûna bejna toreyî xwe pîrs li dû xwe hiştin. Lê, em dibêjin:

Ev çi pîrs in...

Eger kî bû, welatî bû

Şivanê dîn û zana bû

Cegerxwîn bû, cegerda bû.

Peyva dawîn; piştî vê raxistinê dixwazim bibêjim, ew jî ew e ku divê heyberên evra, ango pîroz li ba xwîner nebin, lê dema mirov rexne bike divê neynika rexnegir berhem, dem, rewş û pileya rewşenbîriyê be.

** Beşeke ji lêkolîna Rezoyê Osê ya ji bo sedsaliya Cegerxwîn ku li Îzmîrê di 27.09.2003'yan de li dar ketiye.*

‘Ez dilgeşê can im’

Feratê DENGIZÎ

Ez bixwe tēnagihîjim ku pesnê Seyda bidim, di warê wêjeya me ya klasîk û hemdem û girêdana wan î bi hev, dîrok, rehên gelerî, banga bav û kalan, qîrîna bindestiyê û dengê belengaz û bindestan, baweriya mirov û mirovahiyê

Wexta bi wî dengê Şivan ê dilşewat ev deng ket kerika guhê min, hestên salane û giyana bi hezar salî vejiya di gurcika dilê min de. Mêjiyê min î ku pergalê şolî kiribû, hê nehatibû şuştin, ket ser rêya zelaliyê tevli destpêkirina xweşûştina ji bişavtin û xwebişavtina malkambax a bi darê zorê û di bin nîrê zorê de. Ez ne biyaniyê Seyda bûm; Cegerbixwînê dilbikûl wek bilbila dixwend li warê me, yê ku ew nas nekirina kêmbûn. Min pêşiyê navê wî ji kalikê xwe yê dengbêj bihîst bi rêzên; Naçim cineta bi minet / Serbest û azad diçim cehenem... Paşê dengê hozanê rêzdar ew kir haveynê giyana min / me.

Herê...

Agir û pêtî bi hinava bindestiyê ketibû. Terafa jiyanê min û nîfşê me li hev diket û çirûskên evîna welêt û welatparêziyê diçirîsîn. Ew sal salên tofanê bûn, tofana vejînê. Û ew stêrka geş bû ji rêya felatê re, bi dengê xwe yî Zardeştî, rihma dilê Manî bû.

Ez bixwe tēnagihîjim ku pesnê Seyda bidim, di warê wêjeya me ya klasîk û hemdem û girêdana wan î bi hev. Dîrok, rehên gelerî, banga bav û kalan, qîrîna bindestiyê û dengê belengaz û bindestan. Baweriya mirov û mirovahiyê. Ew ‘bilbilê dilşad’ î dilê me, evîna me bû û hê jî ew e...

Belkî hebekî dereng ma, nedît ku agirê dilê wî li Zagrosan, li warê wî yê kevnare bû efsaneyê şoreşa gelê wî, ya hemdem, a reben û perîşan û bêkesan; çi reşik, çi spî

û çi heftrengê mirovahiyê, mirovahiya cîhana qedîm û kevnare. Çirûskên felatî û wekheviyê dibarin bi xofa Ava Zê, bi dîlovanî û dilnermiya Avaşîn... Qebeqeba Zardeştê Kal e; “Ya qaweta bavê kal, Bê şirik û bêheval!” Ez bawer im niha bi dilşadî ji Qamişlokê li çiyayên efsûnî dinîhêre û helbestên bextewariyê dibarîne ji neviyên xwe yên reşqemer î rûmeta dilkeseran, ji zarokên agir û Rojê re.

Dixwazim vê helbesta wî bikim diyarî weke wergêra hestên dilê xwe;

Çavreşa Min

Şêrîn û çavreşa min, gelek delal e dilber,
Ya Reb çi şox û şeng e, ciwan û rind û nûber.

Narîn û bînxweş û geş, qibla me aşiqan e,
Letîf û zehre-sîma şepal e wek gula zer.

Sîne çi gewr û boz e berdane ser du fincan,
Sed heyf û sed mixabin destê çepel herin ser.

Çen gewher û diranzêr şekir ji dev dibarî,
Di guh de zerguhar im, gerden belor û mermer.

Çavên nekilkirî, reş xweya ye poz bilind e,
Rû pût û lat û mabût zîlfên siyah du ejder.

Weqş û qezeh du ebrû bisk û kezî ji maran,
Runiştî textê Dara taca keyan li ser ser.

Bi Ehreman nizanim, pesnê wê ez çi bêjim,
Pûtxane pû ji bo min, min ser keşî li hember.

Yarê te ez Cegerxwîn, bêdîn kirim, kirim dîn,
Miftî ez im di eşqê, rabe bikuj bi xençer.

Bi vê mebestê dixwazim bibêjim ku, gelek neheqî li Seyda û yên weke wî hatine kirin. “Na, wêjeya wî ne kûr e. Na, angajeyî bîrdoziyekê ye. Siyasetmedar nabe ku bibin wêjekar. Hunermendî û siyaset cuda ne. Endamtiya partiyekê asteng e bo hunermendî, şairî û nivîskarî” û hwd...

Pêşîn hostetiya vê helbestê tenê devê her kesî girêdide, raweya vê ne karê her kesî ye, ji xeynî giranbuhatiya xisûsiyetên wî yên wek; kesayet, têkoşîn, cewher, zaneyî, wêjekarî û hwd...

Dîsa dixwazim bînim ziman ku bingeha van rexneyan tevan, bi ya min ji derûniya pedegojiya bindestan tê. Sekin,

hizir û ramanên serdestan wiha em girêdane ku nayê gotin. Tiştên ku ji xelkê re adet in ji me re dibin qebhet. Ê de baş e: rewşa wan a politîk çi ji hunera Nazîm Hikmet û Yaşar Kemalî kêr dike? Bavê min ma Edward Seîd bi keviravêtina xwe ya tanqên Îsraîle ne rûmeta mirovahî û rewşenbîriyê ye? Di rêzê de J.Paul Sartre, Maksîm Gorkî, M.Şolohov, Jack London, ... hene. Tev xwedî bîrdozî û endamên partiyên siyasî bûn. Û hunera wan giranbuha û rûmeta mirovahiyê ye. Rast e, asta wêjeyê girîng e, tu dibê bila kî be û çi karî bike, hilbet kesayet û rewşen dişberî mirovahiyê netê ne, ne hewceyî gotîne ne...

Ê de baş e, ka em ji dilê xwe bipirsîn; jiyan û têkoşîna mirovên ku xwe ji bo civak û mirovahiyê fîda dikin wê kî binivîse? Ku ew binivîsin, “nabe angajeyê partî û bîrdoziyekê ne!” Hinekî din jî ji ber sedemên alîgirî, ewlehî, rîsk û hewd. nanivîsin!

Êêê, wê çawa be? Ê dilê me rihet be!

Ez Seydayê dilê xwe, Seydayê dilê me bi qîrîniyek dîlxweş û hestiyariya Şivanê wê hêngamê bi bîr tînim;

“Ez dilgêşê can im / Ji dozê re Şivan im / Dengbêj im tembûrvan im / Roja cengê şervan im.”

Tu her şad bî, rihê te şad be Seydayê min...

Aramê Tigran mêvanê te ye...

09.08.2009-Amed



Cegerxwîn û Qanatê Kurdo

Tosinê REŞÎD

Bê guman Cegerxwîn di nav kurdan de bêtir hatiye naskirin. Ji ber ku berhemen Qanatê Kurdo, yên zanistî bi zimanê rûsî çap bûne, piraniya kurdan hê jî wî tam nas nakin.

Cegerxwîn û Qanatê Kurdo, her du jî ji mezintirîn ronakbîrên kurd, ên sedsala XX'an bûn. Her duyan jî şopên xwe di dîroka ronakbîrya kurdî de hiştine û bêguman navên her duyan jî di wê dîrokê de wê bi tîpên zêrîn bên nivîsandin.

Her du jî di hejariyê de, bê dê û bav mezin bûn; Cegerxwîn li bal xwişka xwe, Qanatê Kurdo li bal pismamê xwe. Her duyan jî bēyî piştgirtina tu kesî, bi serê xwe ji xwe re rê vekirin. Her du jî ji destpêka salên siyî, yên sedsala XX'an, bi kar û xebata xwe hatin naskirin; Cegerxwîn çawan şair, Qanatê Kurdo çawan zimanzanê kurdnas. Lê ji ber kêmaniya kadroyan wan salan, her duyan jî ji bilî karê xwe yê sereke wisan jî bi pirsên wêje, dîrok ziman û çanda kurdî ve bûne giro. Cegerxwîn jî bilî berhemên wêjeyî (şîr, çîrok), ku karê wî yê sereke bû wisan jî berhemên li ser dîroka Kurdistanê, folklorê kurdî, zimanê kurdî li pey xwe hiştin. Qanatê Kurdo di rojhilatnasiyê de wek pisporê zimanê kurdî hatibû naskirin û gelek pirtûk û gotarên zanistî ser pirsên rêziman û ferhengên kurdî (bi zaravayên cihê ve) çap kirine, lê ew wisan jî xudanê berhemên hêja, yên li ser wêje, dîrok, netewenasî (etnografiya), folklor û ola kurdan bû.

Her du jî xwediyê zanebûnên gelek kûr û fireh bûn, ji ber vê jî destê xwe davêtin çî bi destê wan ve dihat.

Bê guman Cegerxwîn di nav kurdan de bêtir hatiye naskirin. Ji ber ku berhemen Qanatê Kurdo, yên zanistî bi zimanê rûsî çap bûne, piraniya kurdan hê jî wî tam nas nakin.

Him Cegerxwîn, him jî Qanatê Kurdo aligirê îdeolojiya çep bûn; Qanatê Kurdo

heta dawiya jiyana xwe komunîst bû, Cegerxwîn jî Partiya Komunîst a Sûriyeyê qetiya, ji ber ku wê partiyê mafên kurdan nas nedikir. Lê her duyan jî kurdîtiya xwe di ser çepîtiya xwe re digirtin, çawa xwediyê baweriyên çep bûn, wan berî gişkî ji bo parastina nasnameya kurdî, azadiya gelê kurd, yek ji bindestirîn gelên cihanê kar û xebat dikir.

Çawan mirov jî xeysetên wan nêzikî hev bûn; her du jî pir vekirî bûn, çî di dilê wan de bû, ew li ser zarê wan jî bû.

Qanatê Kurdo beriya her kesî bi rêya kovara "Hewar"ê bi berhemen Cegerxwîn re dibe nas, lê di nîveka salên 50'yî yên sedsala XX'an, bi rêya kurdnasê rûs Vladîmîr Mînorskî her du diwanên Cegerxwîn, ku hingê çap bûbûn, dikevin destê Qanatê Kurdo.

Sala 1955'an Qanatê Kurdo heft şîrên Cegerxwîn ên bi daktîloyê nivîsandî ji min re şandin û di wê hingê de helbesta Cegerxwîn bû pareke jiyana min jî.

Sala 1957'an pirtûka Qanatê Kurdo, ya akadêmîk "Rêzimana Zimanê Kurdî (kurmancî)" bi zimanê rûsî çap bû. Di wê pirtûka zaniyarî de Qanatê Kurdo çawan nimûneyên tekstên zimanê kurdî yazdeh şîrên Cegerxwîn çap kirin. Ew cara yekemîn bû, wekî li Yekîtiya Sovyetê berhemên Cegerxwîn çap dibûn.

Her sê mehên havîna sala 1960'î ez mêvanê Qanatê Kurdo bûm. Wan her sê mehan Qanatê Kurdo û pirtûkxaneyê wî, ya pir dewlemend, ji min re bûn zanîngeha kurdîtiyê û kurdnasiyê. Beriya her tiştî, bêguman, min her du diwanên Cegerxwîn xwendin, ne tenê xwendin lê



gelek şîr ji ber girtin û bi xwe re birin Yê-rîvanê.

Havîna sala 1963'an Yekîtiya Sovyetê bi awayekî aşkere piştgirtiya şoreşa Başûrê Kurdistanê kir. Ev yek ji me re bû helan û piştî em ji bînvedana havînê vegeriyan (ez hingê xwendkar bûm) me yekemîn komeleya kurdî, bi navê “Şêwra Xwendkarên Kurd”, bi nehênî ava kir (piştî çend heyvan bû ya êşkere). Yekemîn şeva me li ser jiyan û berhemên Cegerxwîn bû. Dûarojê gelek kesan ew şîr ji min xwestin û ji ber girtin. Di wê rojê de şîrên Cegerxwîn bûn çeka sereke di propogandaya me ya kurdayetiyê.

Beriya her tiştî bi saya serê Qanatê Kurdo dengê Cegerxwîn gihişt kurdên sovyetê.

Pêwendiyên Cegerxwîn û Qanatê Kurdo,

bi rêya nameyan, ji mêj ve hebûn, lê piştî Cegerxwîn çû Swêdê, pêwendiyên wan hê xurtir bûn. Di cotmeha sala 1982'yan de Cegerxwîn çû Lêningradê û bû mêvanê Qanatê Kurdo. Rasthatina her du ronakbîrên mezin bû cejneke çanda kurdî.

Rûmeta Cegerxwîn û berhemên wî li bal Qanatê Kurdo gelek bilind bû. Wî pêşgotineke gelekî hêja ji bo diwana Cegerxwîn a pêncemîn nivîsiye.

Gelek caran ez bi Qanatê Kurdo re li ser berhemên wî dipeyivim, car dibûn min rexne jî dikirin. Eger ez rast bûma dipejirand, eger ez şaş bûma bi bînfirêhî şirove dikir. Bi gilîkî, heta radeyekê te dikaribû ew rexne bikira, lê du kes hebûn, wekî wî tu caran ne dipejirand wekî rexne li wan bîn kirin: Ew kes Mistefa Barzanî û Cegerxwîn bûn.

Romansiyet di helbesta

Cegerxwîn de

Xalis MISEWER

Ji ber ku hin hêmanên romansiyetê jî ev in; evîn, jin, tevlihevbûna bi xweristê re, êş, bêzarî, welatparêzî, netewparêzî, ramanekê zîrekî, bêtirsî û hwd. tevî ku ev hemû hokarên romansiyetê ne û di helbestên Seyda de hatine ristin jî, lê; hê tu lêkolerên kurd helbestên wî bi romansiyetê nîşan nedane, ew bi tenê mîna helbestvanekî klasîk dane nasîn

Berîya her tiştî, divê em ji xwe pirs bikin: Cegerxwîn ew helbestvanê ku bi helbesta klasîk di nav kurdan de hatiye naskirin, gelo hesta wî li ber pêlên bayê romansiyetê nehatiye hejandin? Yan jî giyanê wî pê nehatiye sotin? Em van pirsan ji lêkolerên kurd dikin, ji ber ku heta niha me neditiye kesekî/ê ji van rewşenbîr û lêkolerên wêjeya kurdî, ev aliyê helbestî yê herî girîng jî xwe re kiriye kar û bar û lê geriyaye. Eger ku mirov li helbestên vî rîstevanê navdar bi çavekî rexneyî binihêre, dê mirov wê çaxê şopa romansiyeteke zelal di wan helbest û sirûdên bi stranî û muzîkî û bi evîn û nalenal hatine afirandin, xweş bibîne.

Ji ber ku hin hêmanên romansiyetê jî ev in; evîn, jin, tevlihevbûna bi xweristê re, êş, bêzarî, welatparêzî, netewparêzî, ramanekê zîrekî, bêtirsî û hwd.

Tevî ku ev hemû hokarên romansiyetê ne û di helbestên Seyda de hatine ristin jî, lê; mîna me gotibû, hê tu lêkolerên kurd helbestên wî bi romansiyetê nîşan nedane. Ew bi tenê mîna helbestvanekî klasîk dane nasîn! Ez guman dikim ev jî zordariyeke mezin e, di mafê Seydayê me de pêk hatiye. Ji ber wilo dixwazim di vê babetê de – li gorî zanebûna xwe– rastiyeke rexneyî li vir bidim xuyakirin û duristî û nêdirustiyê jî hev bidim alî, da ku hinek mafê Seyda li me hebe, em ê mafê wî – ta jî me bê– lê vegerînin û bigihîne ber destê wî.

Îcar ku em li helbesta wî baş binihêrin, em ê bibînin ku Seyda xwe baş berdaye hinav û rivîna giyanê romansiyetê û ew bûye bilbilê evînê û xwerista Kurdistanê xwerengîn, ev welatê ku mîna gulistan û bihuştên erdê dibîne û bi hezkirin û bi dilekî şewat wî dipesînine.

Helbesta romansî bi peyvên xwe yên nerm û kovan û bi muzîka xwe ya hêdî û zelal û bi rengê stranî jî hesta giyanê helbestvan der tê. Wiha xeyaleke fireh û hesteke bilind di wan peyvên ku ji hundirê dil û giyanê wî dertên de heye. Her dem helbestvanê romansî qafiyeya xwe ya helbestî, di sirûdekê de bi awayekî cuda û cur be cur organîze dike. Bêguman ev tişt jî li bal Seydayê Cegerxwîn xweş peyda dibin û li ser rûpelê dilê xwe yê kovan û birîndar kul û derdên xwe radixe holê û xewna xwe ya şêrîn wiha şîrove dikê: Welatekî serbixwe, bê axa û beg û jiyanekê serfiraz û bi ewle tê de rûdinê. Wiha jî Seyda bi asîmanê hezkirin û wekheviyê ve radipelike û ji hêviyeke mirovî û paşerojê xweş û geş, bi kêf û şahî di helbestên xwe de distrê.

Lê ez dibêjim ku Seydayê Cegerxwîn pirî caran di helbestên xwe de, klasîk, sembolar û romansiyetê jî bi hev re pêk tîne, ev jî hunereke bilind derdixe wê navê, ji ber wilo wêjevanê rûsî yê mezin Maksîm Gorkî û Komoco wêjevanê mezin jî Çînê dibêjin: “Wêjevanê mezin her dem di wêjeya xwe de, rastiya ku nêzî klasîkê

ye û romansiyetê tevlihev didêre” Ango li gor vê nihêrînê, tevlihevkirina van hokeran wate û wêneyên ristî yên xweşik û hêja têne afirandin. Wiha jî dibêjim; ku Seyda di piraniya helbestên xwe de, ji aliyê babet û wêjeyê ve jî, sê beşên wêjeyî -nemaze di warê helbestên siyasî demîna me gotibû tevlihev didêre, ew jî, klasîk, romansiyet û sembol e.

Ez guman dikim bi vî awayî, wê helbestvan helbesteke rewan û zîrek bide nasîn. Lê ew sembolên di helbesta xwe ya siyasî de pir bi kar tîne, ew jî dîlbera wî welatê wî ye, ango di gelek ciyan de dîlber û welatê wî dibin yek laş û bi vî awayî diçe pesnê xwerista welêt bi awayekî xweş û zelal dide.

Piştî vê pêşgotina kurt û zelal, em ê niha bên li Seydayê xwe guhdar bikin, bê ka romansiyet û klasîk û sembol, çawa di bin siya perdeya helbesta wî re tîne xuyakirin.

Di sirûdeke xwe de Seyda wiha dibêje:

*Li hawir gul û çiçek û geya
di ser me re pir bilind in çiya
Şîpên avê ne diçin ber bi jêr
Çuqlî dihejin sor û kesk û zer
Ez xweş dikişênim hilmê ji sorgul
Xweş tê guhê min awazê bilbil
Di nav avan de ordekan qaz in
Li ser latan xweş şahîn û baz in*

Tevlî ku di van malikên helbestî de, bi rengekî yekser û klasîk û bêtir xeyaleke fireh wêneyên xwe yên lêkdayî, mîna firçeya hunermend hin bi hin bi gotinên mîna gul, çiçek, geya, çiya, şîpên avê, çuqlî, sor û kesk û zer, awazê bilbil, ordekan, qaz, şahîn, ava berjêrbûyî, datîne, lê bi pêlwanî tabloya xwe ya romansî ji xwerista dora xwe re diafirîne. Xweşikbûna xwerista cih bi peyva “li hawîr” di van malikên bi stranî û awaz de, baş bi hev ve dihûne, nizim û bilind, bi hev ve girêdide û çiyayên bilind mîna xem û xeyalên xwe yên giran, li ser deşta bi av û gul û çiçekên sor û kesk û zer û bi payebilindî û hêlemêl, van çiyayan bi cih û war dike û wêneyekî romansî û bihareke

geş, ku bi rengên ala kurdistanê sor û kesk û zer hatiye xemilandin, xweş dide nasîn, ta li ber bedewbûn û xweşbûna vê bihuşta erdê, hesta mirov tev radibe û geşbûneke bêhemta di dilê mirov de tê çandin.

Ji aliyê derve de jî, ango ji aliyê kêş û qafiyeyê de, awazeke resen û muzîkeke pir zelal li ber guhê mirov dikeve. Seydayê helbestvan û evîndar, ji derve û ji hundir ve, di naverok û peyv û hevokên xwe de, bi awakî romansî û klasîk cawê helbesta xwe yê rengîn, ku mîna xwerista Kurdistanê ye, bi hev ve girêdide û li tevna xwe dixe.

Û dibêje:

*Şêrînkênê, lêvşekirê
Agir di nêva cîgerê
Ahî ji destê te evîn
Şekerkenê, lêv hingivê
Jehr û mirin bî, min divê
Ahî ji destê te evîn*

Li vir ev malikên hanê dişa bi şeweyekî romansî û bi helbesteke bi stranî û awaz hatine lidarxistin, lê bi peyv û hevokên lêkdayî û lasayî û klasîk hatine hûnandin, kesîtiya helbestvan jî tê de xweş cih digire, ji ber ku ew bi cînavê yekem hatine danîn, û ferhenga Seyda ya helbestî nemaze di warê xweristê û evînê de, bêhtir ji hevokên rewşane yên pir hêsan û zelal pêk tîne mîna - /şêrînkênê/ lêvşekirê/ şekir kenê/ lêvhingivê û tiştên nediyar ber bi çav û bi laş û gewde dike.

Em dinihêrin, bê çiqasî ev hevokên hêsan bi lêkdaneke klasîk hatine organîzekirin, lê bi xeyal û naverokeke romansî di vê helbesta xwe ya siyasî de pesnê yara xwe dide. Wiha jî di vir de tê xuyakirin, ku gelek caran peyva “şêrîn” di van malikan de pêk tê û dubare dibe, ew jî tê wê maneyê, ku ev helbest li ser meroq û hestên laş xwe ava dike û şêrînbûn cihekî bilind di van hestan de digire. Ez jî dibêjim: Ku ev tişt pêwendiya wê bi kelepûr û aborî û xwerista Kurdistanê re heye, ji ber ku Kurdistan, ji aliyekî ve bi şêraniya xwe pir navdar e mîna; tirih, mewij, bastêq,

dimis, qerqîtik, helaw, ji aliyê din ve jî milletê kurd mîna hemû milletên Rojhilata Navîn hev qas di bajarvaniyê de pêş ve neçûye û tê xuyakirin ku milletên vê navçeya dirokî, kêfa wan pir ji şêraniyê re tê. Ji ber wilo mirovê kurd yara xwe û welatê xwe her dem bi şekir û şêranî pesin dide û ta di metelokeke xwe de jî kurd dibêjin: “Şam şekir e, welat jê şêrintir e”.

Dîsa em karin bibêjin: Ku risteya “Ahî ji destê te evîn” di sirûdê de gelek caran dubare dibe û weke ku di warê rexneyê de tê zanîn, dubarekirina helbestvan jî eynên firêzan re, di yek sirûdê de, tê wê wateyê ku ew dixwaze ramanên di naveroka wan firêzan de teqez û misoger bike, xwendevanê xwe bi wan hayedar û mijûl bike û bala wî bikişîne. Ji ber wilo li vir dixwaze, ahîn û rivîna giyanê xwe û sotîn û kela hinava xwe, ji me re bi van firêzên evîndar bide xuyakirin.

Bêguman ev gotin jî ezmûnên helbestvan ên helbestî dertên, ev gotinên ku bi wateyeke romansî tîn xuyakirin, ew peyvên bi xaka Kurdistanê ve hatine strîn tîn bikaranîn. Wiha jî helbestvan yara xwe - ku ew jî ji xwerista Kurdistanê re nîşan û sembol e bi etmosfêreke romansî û bi bihareke rengîn dixemilîne.

Dîsa di vê babetê de, Seyda ji yara xwe re distrê û dibêje:

Dêmên digeş

Çavên direş

Xalên hebeş

Birhên biweş

Hilde ko her, roj bê derê

Di vir de dîsa bi van peyv û malikên dansikî û bi pesindarî wêneyekî pir xweşik pesnê yara xwe dide û her dem jî yara wî Kurdistanî rengîn e. Li vir pesnê ruwê wê yara bi xemil û xêz dide, ango vî tiştî bi mekanîzmaya hevokên pesindar pêk tîn, mîna; dêmî digeş/ çavên direş/ xalên hebeş/ birhên biweş.

Ev pesindan jî bêguman, ahînen kele-pûra kurdî û şewata giyanê helbestvan tevlihev dike, ku ev li ba kurdan ji dêmên

laşê pîrekê re pesnên pir xweşik û bedew in, û cihên rêz û pîroziyê ne, lê ev peyv û hevok û ristên ku bi wan pesinên rind û hêja ji yara xwe re daye pirên wan li bal kurdan pesnî folklorî ne û li bal hemû helbestvanan bi rengê lasayî bi kar tîn û dîsa ev malikên xwe bi kirasê klasîk û binkirasê romantîk pêk anîne, ango tabloyeke hevbeş ji (klasîkî - romansî) tevlihev ji yara xwe re diafirîne, nemaze di rêza dawîn de ku dibêje:

- hilde ko her, roj bê derê.

Ev rêza hanê bala mirov pir dikişîne! Ji ber ku di rengê wêneyekî helbesta romansî yê pir xweş de hatiye, ew çavên yara xwe dema birhû û mijangan ji ser dide alî, mîna roja dertê dipesinîne, ev wêneyê spehî û nûjen di helbesta kurdî de, ne rasterast kişandîye helbestvan xeyala xwe ya kûr û dûr avêtiye ser vî tabloya pir rind û bedew, ango rasterast negotiye – çavên te weke rojê ne – lê wî ji yara xwe xwestiye, di nav wê bihara rengîn de, ku li ser ruwê wê yê pesindar hatiye afirandin, mijangên xwe hilde, ta di nav wan re, çavên mîşînî mîna rojê, tîrêjên zêrîn bi şewq û şemal xwe bi ser dêmên wê bihara ruwî wê ve berde.

Ez guman dikim, ku ev wêneyê bi zîrekî hatiye afirandin, cara yekem di wêjeya kurdî de, ji çavê pîrekê re Seydayê zîrek bi kar aniye, kesî beriya wî wiha negotiye, ji ber ku kurd her dem çavan bi du tasan dipesinînin. Di vir de tê xuyakirin tevî ku pirên wateyên helbestvan bi hêsanî tîn lêkdan, lê bi awayekî rewan û bi kêş û qafiyeyeke xweş malikên xwe, di bihara helbesta xwe de war û bi cih dike. Dîsa em li vir tînin bîra xwe ku Seydayê me her sê şopan; klasîk, romans, sembol bi hev re li tevna xwe dixê û cawê xwe yê helbestî xweş pê dihûne û ev jî zîrekbûneke helbestî pir mezin dide xuyakirin, lê kesin lêkolîner û rexnevanê kurd mafê Seyda di vî warî de hê xweşik nedanê.

**Ev nivîs di Kovara Nûbûnê de di sala 2007'an de di hejmarê 93'yan de hatiye weşandin (Kovara W)*

Aramê Tîgran: ‘Muzîk giyanê min e

Azad ZAL

“Muzîk giyanê min e, stran û muzîk ji bo mirov vîtamîn in, ez niha 75 salî me, ji ber ku ez sazband im, muzîk emrê mirov dirêj dike, vîtamîna canê mirov e”

Di 3’yê tîrmeha 2009’an de em wek Enstîtuya Kurdî ya Amedê û Komeleya Nivîskarên Kurd çûn serdana mamosteyê hêja, Aramê Tîgran. Ew ji bo Newroza 2009’an hatibû Amedê û êdî li Amedê bi cî bûbû. Piştî ku ji nexweşxaneyê derketibû ji xwe re daîreyek standibû û li wê derê dima.

Ji Enstîtuya Kurdî ya Amedê û Komeleya Nivîskaran Feratê Dengizî, Îrfan Babaoğlu, Mehmet Devîren, Elixan Loran û Omer Fîdan em çûn serdana hunermendê xwe yê hêja.

Guftûgoya me bi pîrsa rewşa tendirustiya wî dest pê kir. Gelek baş û li ser xwe bû. Wê rojê bayekî tund dihat.

Me li hal û rewşa wî pirsî. Got; “Ez gelekî baş im, ji ber ku ez li Amedê me ez kêfxweş im. Ev der ji min re gelek baş e, ez li vî bajarî xwe bi hizûr hîs dikim.”

Sohbeta me hat ser strandin û muzîkê. Çima bi kurdî distrêyî? Ev dengê zela û xweş ji kîjan hest û ramanan dihat der?

Wî di nava sohbetê de got; “Ez kêfxweş û dîlşad im ku ez bi kurmançî distrêm.”

Strîn ji hestên dostanî û hevaltiya gelan tê. Strîna

bi gelek zimanan lê hest û ramanên strînê bi dilekî, bi armanc û xwestekê dibe. Ya hunermend û hozanê me Aramê Tîgran jî bi wî awayî bû. Hest û ramanên gelan, ên dostanî, hevaltî û yekçarenûsî ji rûyê wî dirîjiya û li Ameda me, li welatê bindest, li xerîbiya welatan direşiya û belav dibû.

Rûyê wî geş bû, dilê wî xweş bû. Ji ber ku ermen bû dilê wî geş bû, ji ber ku bi kurmançî distriya rûyê wî geş bû. Bi heft zimanan dizanibû, bi heft zimanan distriya û dilê xwe geş dikir pê re rûyê me tevan geş dikir.

Di guftûgoya me de bal kişand ser dostanî û hevaltiya gelê kurd û gelê ermen.



Got; “Di ziman de delîl hene ku ev her du gel dost û hevalên hev in. Mêze bikin, di kurdî de hûn dibêjin “çortan”. Ji dew çêdibe. Lê ev peyv bi eslê xwe peyveke ermenkî ye. “Çor” peyveke ermenkî ye û di kurmançî de di wateya “hişk” de ye; “tan” bi ermenkî ye û di wateya “dew” de ye. “Çortan” “dewê hişk” e. Binêrin di kurmançî de ev bi cî bûye. Gelek peyvên bi vî awayî ketine nava ziman. Di ermenkî de jî gelek peyvên kurdî hene. Gelek peyvên bi vî rengî hene û ev her du gel danûstandin bi hev re kirine. Ez jî ji aliyê muzîkê ve vê hevpariyê pêk tînim.”

Îcar berê xwe da strîna bi çend zimanan. Bi rûyê xwe yê geş, bi rûkeniya xwe got; “Ez bi ermenkî (ew zimanê dayika min e), ez bi kurdî (zimanê min ê ku dê û bavê min pê diaxivîn), bi erebî, bi tirkî distrêm. Ez bi van zimanan distrêm. Ez bi zimanê fransî, suryankî, yewnankî û zaravayê zazakî jî dizanim û diaxivim. Lê gava ku ez bi ermenkî distrêm qetlîam tê bîra min; gava ez bi kurdî distrêm diya min, bavê min, bav û kalên min tîna bîra min. Diya min û bavê min bi me re (bi zarokên xwe re) bi ermenkî lê di nav xwe de bi kurdî diaxivîn.”

“Ez bi piranî bi kurdî distrêm, min gelek kaset derxistin. Ji ber ku ez bi kurdî distrêm, hinek ermeniyên me aciz dibin. Ji bo ku ez kêfa wan binim ez di her kasetê xwe de bi ermenkî jî dibêjim.”

Dema ku behsa dê û bavê xwe kir hestewarî li ser rûyê wî diyar bû û hinekî sekinî, wekî ku hinek demên berê bîne bîra xwe û rûyê wî yê germ sor bû û ket nav xem û xeyalan. Bêhnê sekinî...

Şûnde di paceya odeyê re li derve mêze kir û berê xwe da me û got; “Kurd... Ez ji we re tiştekî bibêjim, hin kêmasiyên kurdan, ên misilmanan tev hene, ez vana naecibînim. Yek jê kurd qîza merivê xwe ji xwe re tînin, ev guneh e. Ya din bera jinên xwe didin, li wan xwedî dernayên, telaqên xwe diavêjin, ev tiştekî pir nebaş e. (Di wê navberê de xanima wî li metbexê bû, ew îşaret kir) Ez û xanimê em ê hev in. Em

carina şer dîkin, pevdîçin, lê demek şûnde em li hev tînin. Ez jê re dibêjim, “ez ji te hez dikim” (bi kenekî gelek watedar û xweş kenîya û dewam kir), jixwe ku mirov ji hev hez neke, mirov bi hev re şer jî nake, piştî wê xeyda me diqede. Ê kurdan wisa nîn e, jinê xwe berdidin, ev ne rast e, ez vê naecibînim. Tiştekî din jî qelen heye, qelen tiştekî pis e. Kurd ji bo jinan qelen distînin. Ka ev dibe? Ma qey malekî distînin ku qelen distînin!.. Tiştekî din jî kurd li jinên xwe dixin. Ka mirov li jinan dide. Ev tebîet ne baş e. Ev tebîet jî tirkî hattiye ketiye nava kurdan.”

Me sohbeta xwe dîsa qeliband ser muzîkê. Gelo ji bo Aramê Tigran “muzîk çi ye?”

“Muzîk giyanê min e, stran û muzîk jî bo mirov vîtamîn in. Ez niha 75 salî me, ji ber ku ez sazband im. Muzîk emrê mirov dirêj dike, vîtamîna canê mirov e. Piştî ku ez nexweş ketim, ez emeliyat bûm, dixor ji min re got; ‘şeş mehan nestrê, saza xwe negire destê xwe’, carina kurmê wê tê min, ez çawa bikim, ez ê di ber xwe bidim.”

Apê Aram bilêta xwe birîbû ew ê biçûya Yewnanistanê. Me jê re got çima tu diçî? Te li vir daîre jî stendiye, ji xwe re li vir bicî bibe, tu yê herî çi? Qey Amed jî bo te ne xweş e, qey tu li vir aciz î?

Got; “Na ez ne aciz im, ez kêfxweş im, ez li vî bajarî bihizûr im. Ez li vir xwe rihet hîs dikim. Hewaya Amedê jî min re pir baş e. Ez li vir nebûma ez ê wekî din bûma. Mala amediyan ava be, mala şaredariyê ava be, gelek baş bûn ji min re, bi dilxweşî ez hemêz kirim. Ez jî naxwazim herim, jixwe dilê min heye ez li vir bi cî bibim. Lê li Yewnanistanê mala min heye, demeke dirêj e ez neçûme. Gelek fatura li malê (li Yewnanistanê) kom bûne, gere ez herim wê derê hinekî tekûz bikim, meriv û eqrebayên min li wê derê ne, ez ê wan jî bibînim. Lê ev der di dilê min de ye, ez hêvî dikim û ez ê dîsa vegerim û her tim li vir bim.”

Çend name ji Mîlenayê re

Franz KAFKA

(*Wergera ji almanî: Munewer AZÎZOGU*)

[*Meran, nîsan/gulan 1920*]

Stî Milenaya Xoşevîst,

Destpêkê, berî ku hûn bêtî daxwaza min ji nameya min derxin: Hema bêje ji 14 rojan vir ve ye bîxewiyeke ku roj bi roj xwe zêdetir dike dikişînim. A rastî ez vê pir xirab nabînim. Demên wisa tînin û diçin û ji hewcedariyê zêdetir sedemên wê jî hene. (Gorî Bâdekerê bi awayekî pêkenî hewayê Meranê jî sedem e.) Her çiqas ev sedem pir kêr xuya bin jî, bi her awayî mirov wek gilare bîfêhm dikin û li kêleka wî wek sewaleke kûvî jî dîlnerihet dikin.

Lê kîfxweşiyeke min jî heye. Hûn bi aramî razane. Ligel duh çendî balkêş û rojeke ne li rê bû jî we karibûye bi aramî razên. Ger xew bişev di ber min re derbas bibe, ez rîya wê nas dikim û jê re stû xwar dikim. Jixwe li hember wê serîrakin dî kêmîqilî bûya. Xew tiştê herî bêtawan e û mirovê bîxew jî kesê herî tawanbar e.

Û hûn di nameya xwe ya dawîn de ji vî mirovî bîxew re sipas dikin. Ger biyaniyekî jî vê rewşê neagahdar vê nameyê bixwîne, wê bifikire bibêje ‘ev çi teba mirov e! Di vê rewşê de jî serketî ye.’ Bi ser de tu tişt nekiriye, pêçiyêke xwe (ji xeynî pêçiya ku pê dinivîse) neleqandiye. Bi şîr û tiştên baş xwe xwedî kiriye, ne ku tim (her çiqas tim ne wisa be jî) ‘çay û sêv’ li ber xwe dîtiye û wekî din her tişt bi awayê xwe hiştiye û çiya jî ji cihên wan neleqandiye. Hûn çiroka serketina destpêkê ya Dostoyevskî dizanin? Ev çirok gelek wateyan hildigire nava xwe û ez bi ser de tenê ji ber xweşiya navê mezin qala wî dikim, ji ber ku çirokeke wisa li derdora min, an jî gelek nêzî min biqewimiya wê heman wate bida. Ji hêla din ve çirok baş nayê bîra min, bi taybetî jî nav. Dostoyevskî dema çiroka xwe ya bi navê ‘mirovên reben’ dinivîse, bi hevalê xwe yê wêjevan Grigoriev re diji. Grigoriev pelên bi mehan e li ser maseyê ne dibîne, lê manuskriptê destpêkê piştî romanê xelas dibe digire destê xwe, dixwîne û jê re hejmetkar dimîne. Û beyî ku ji Dostoyevskî re tiştêkî bibêje, radike manuskriptê dibe dide rexnegir Nkrassow, ku wê demê gelek navdar e. Nivê şevê saet di duduyan de li deriyê Dostoyevskî dikeve. Yê hatine Grigoriev û Nkrassow in, dikevin hundir. Dostoyevskî hembêz dikin û wî maç dikin. Nkrassowê ku heta wê kêliyê Dostoyevskî nas nake wî bi ‘hêviya Rûsyayê’ bi nav dike. Du saetan bi hev re, bi taybetî jî der barê romanê de diaxivin. Nêzî sibehê xatir ji hev dixwazin. Dostoyevskî, ku dûre wê şevê tim wekî şeva herî dîlşad a jiyana xwe bi lêv dike, xwe dispêre pacê, li dû wan dinêre û xwe nagire, dest bi girînê dike. Êdî ez nizanim, nayê bîra min li ku nivîsandibû, lê hesta wî ya sereke ev bûye: ‘Ev mirovên tekûz! Çiqas baş û çiqas torin in! Û ligel vê ez çendî firûmaye me! Ger dilê min bibînin! Ger ez ji wan re nava dilê xwe vebêjim wê bawer nekin’ Her wekî din jî bo Dostoyevskî li ser-şopawan-meşandin danîna ber xwe, tenê gotineke bi şeml e, tenê gotineke dawîn e ku divê di ciwaniya tîkneçûyî de hebe û di vegotina min a ku dawîya wê hatiye de cihê wê nîn e. Stî Milena ya Xoşevîst, bala te dikişîne ku ev çirok çiqas nepenî û nefehmbar e? Ez bawer im, ev nepenî weha ye: Grigoriev û Nkrassow bi giştî mirov dikare bêje ku ji Dostoyevskî bêtir torin nîn in. Lê ger hûn vê nêrîna giştî ku wê şevê Dostoyevskî paş çav kiribû û di rewşên kitekit de ne bikêr in bihêlin û guh bidin Dostoyevskî, hûn ê jî bawer bikin ku Grigoriev û Nkrassow bi rastî mirovên tekûz in û Dostoyevskî jî firûmaye û remakiyek bêdawî ye, bi tu awayî jî dûr ve jî nikare bigihîje Grigoriev û Nkrassow û bi tu awayî nikare qala sendandina başiya wan a ku heq nekirine û ji wan re hatine bexşîkirin bike. Mirov bi awayekî teşeyî jî pacê li çûna wan binêre, dibîne ku ev tê wateya xwedûrxistinê û dûrîdest nîşandanê. Mixabin wateya çirokê jî ber navê Dostoyevskî yê mezin wenda dibe.

Bîxewiya min ez birim di ku de derxistim. Mîsogerî nabe ber bi derên niyetên nebaş ve.

Franz K. yê we

[Meran, Gulan 1920]

Stî Milena ya Xoşevîst, (rast e, ev sernav êdî acisker e. Lê li vê dinyaya bêewle her şax ji bo kesên nexweş xwepêgirtinek e. Lê ger ev şax ji wan re acisker bê, ev nabe berjenga baş-bûnê.) Ez tu carî di nava gelê Elman de nejiyam. Elmanî zimanê min ê dayikê ye, ji ber vê yekê ji min re xwezayî tê. Lê Çekî ji min re jidiltir e, ji ber vê yekê nameya we hin dudiliyan diherijîne. Ez we hîn diyar dibînim, tevgera gewdê, ya destan, wisa bi lez, wisa bi aramîdar; hema bêje em rastî hev hatine. Lê ya rastî ger bixwazim çavê xwe rakim û li rûyê we binêrim, di berdewama nameyê de agirek –ev tiştêkî çawa ye- xuya dike. Û ez ji bilî agir tu tiştî nabînim.

Ev jî dibe ku rêzika jiyana we ya ku we bi cih kiriye, bi mirov bide bawerkirin. Ji ber sedema rêzika ku hûn xwedêgiravî di bin de dijîn naxwazin li we piyarî bê kirin, xwezayî ye. Lewre bicihkirina vê rêzikê ji bilî quretiya xwerû û pozbilindiyê ne tiştêk e. (Já jsem ten ktery platí)¹ Ji bo ezmûnên ku hûn ji bo vê rêzikê didin, ne hewceyî axaftinê ne, mirov tenê dikare bi bédengî destê we maç bike. Ger ez li ser navê xwe bibêjim, baweriya min bi rêzika we heye. Tenê ya ez jê bawer nakim ev e; çawa dikare wisa birqok, erjeng û diyarker tim li ser jiyana we bandorker be. Çendî ev fehmbერიეკ e, lê tenê fehmbერიეке li ser rê û rê bêdawî ye.

Lê beyî bandora vê yekê ji bo hişê mirov, ku sînorên wî gerdûnî ne, we di nav tenûra sor-kirî ku hûn tê dijîn de dîtîn, tiştêkî erjeng e. Ez dixwazim carekê tenê derbarê xwe de biaxivim. Ger mirov wek spartekê li van hemûyan binihêta, li hemberî min dê sê dibetiyên we hebûna. Wekî minak bibêjim, dibû ku we ji min re qet qala xwe nekira, lê wê demê min ê derfeta naskirina we û ji vê firsendê mezintir min ê xwe ceribandina bi vê firsendê nedîta. Ji lewre nedibû ku hûn min ji vê dîlşadiyê bêpar bihêlin. Dûre we dikaribû hin tiştan ji min veşêrin an jî xweştirîn xuya bikin û hûn dikarin bikin jî, lê di rewşa niha de ger min ji we re negota jî min ê pê derxista û vê yekê wê ez zêdetir biêşandima. Nexwe divê hûn vê jî nekin. Dûre dimîne tenê dibetiya sisêyan: Hinekî xelasbûnê biceribînin. Dibetiyêke piçûk di nameyên we de xwe nîşan dide. Tim qala xweşî û qewîniyê dikin, bêşik demdemî qala tiştên din jî dikin û di dawiyê de ‘reelní hrûza’²

Tiştê ku hûn di derbarê tenduristiya xwe de (ya min baş e, tenê xewa min ji ber hewa çiyê nebaş e.) ji min re kêr xuya dikin. Nasîna bijîşk pirole guncan nabînim, pirtirîn ne guncan e, ne jî neguncan e. Tenê libata we dikare biryarê bide, mirov dê kîjan wateyê bidê. Bêguman bijîşk xêvik in. An jî ya rastî ji mirovên din xêviktir nîn in, lê angaştên wan pêşkenî ne, divê mirov tim bihesibîne ku dema mirov bi wan re rû bi rû dimîne xêvikiya wan tim mezin dibe. Tiştê ku bijîşk niha ji we dixwaze ne xêvoke ye, ne jî negengaz e. A rastî ya negengaz nexweşketina we ye û divê ev negengazî weha bimîne. Ji dema ku hûn bi bijîşk re axivîne vir ve di jiyana we de çi guherî? Pirsê resen ev e.

Dûre ger hûn destûrê bidin min çend pirsên min ên talî jî hene: Çima û ji çi demê vir ve ye hûn bê pere ne? Têkiliyên we bi mirovên we re hene? (Ez bawer im danûstendina we heye, lewre we navnîşaneke ku we jê bi sistem zerfêk distend dabû min. Ev têkili qut bû?) Çima wekî we (berê) nivîsibû, berê li Wienê bi pir kesan re danûstendinên we hebûn. Lê niha bi tu kesî re nîn e?

Hûn naxwazin rêzenivîsên xwe ji min re bişînin. Nexwe baweriya we bi min nîn e ku ez ê van rêzenivîsan di wêneya ku min di nava xwe de çêkiriye de bi awayekî rastî bi cih bikim. Baş e, wê demê di vê xalê de ez ji we xeyidîme. Lê ev ne bextreşî ye, ji lewre di qunca dîl de kedîkirina dilmayîne ji bo berceste kirina te baş e.

Franz K.yê we

¹ Yê cirmê dikişîne ez im² Veciniqîna rastî

Xewzê m

Elîxan LORAN

*“Esohî! Esohî! Lama Sabakhtanî”
Ji Adaptasyona Încîlê, Markos 15:34*

Li me diariya xewa stranên takekesî
Û îskeîskên me yên çil û çar esrînî ye bîska din
Dizika diêşim, kes bi xulqê asîmanan nizane
Qira qirdê me tîne, şop û aşop her tenêtî ye
Belam zane û kare ye, banû û bane ye

Kevan kevaniyên vegotinê
(Veder, derbikdêr û destêwer e.
Heke simbil li ber bê bireqisin, dadixwe ji vegotinê)

Xwedê hêlîna teyrê kor hildiweşand
Di biharên kamilbûyî de ligel hewiya daran
Evîn azîneya herî zînde
Tu yê hîn bikî teyro, koro

Devê min no, diranên min ko
Tu û eş litûfên Xwedê ne, pelê te vê yekê li xwe danaynin

Li beriyê deşîfre bûye gerîlayeke ziravstûr
Dê bişibe dilê me, li ku razê dê li wir bizê
Dûre fermana HESTÛyê me radibe
Çûyîn jî ditewe bi fer-manê re

Dilê min zebeşê kêrê
-ev jî kurdbesqûe ye; alima zilmê, zalim!-

Pelpelûk...

Racêr Dîn KAYZÊR

(Wergera ji farisî: Dêrsim OREMAR)

Di sêwîxaneyê de weke her roj, sibê zû radibûm, min nivînên xwe weke serbazekî biçûk rêk dixistin û tevî bîst, sih hevjûrên xwe, ji bo xwarina nanê sibê ber bi xwaringehê ve bi rê diketim

Demekê di jiyana min de, ta radeyeke berçav, bedewî wateyeke taybet ji bo min hebû. Ger ne şaş bim wê demê heft, heşt salî bûm. Yek an du hefte, an jî mehek beriya ku sêwîxane min radestî kalemêrekî bike.

Di sêwîxaneyê de weke her roj, sibê zû radibûm, min nivînên xwe weke serbazekî biçûk rêk dixistin û tevî bîst, sih hevjûrên xwe, ji bo xwarina nanê sibê ber bi xwaringehê ve bi rê diketim.

Spêdeya rojeke şembiyê piştî xwarina nanê sibê, di dema vegera ji bo cihê benderdanê, min dît berpîrsê sêwîxaneyê li pey pelpelûkên ku li dora gulên di baxçeyê sêwîxaneyê de kom bûbûn digere. Min bi baldarî li karên wî dinêrî, wî ew giyandarên xweşik yek bi yek bi torê digirtin û bi sincaqekê ku ji ser û perên wan derbaz dikir bi parçeyek kaxez ve girêdand. Çiqas kuştina wan giyandarên xweşik bêrehmane bû.

Ez çendîn caran çûbûm nava baxçe û pelpelûk li ser rû û destên min rûniştibûn û min karibû ji nêz ve li wan binêrim.

Dengê telefonê hat. Berpîrsê sêwîxaneyê kaxezê ku pelpelûk pê ve zeliqandî bûn li ser pêlekên salonê hişt û ji bo bersivdayîna telefonê ket hundir. Ber bi kaxez ve çûm û bi baldarî li yek ji pelpelûkên ku bi sincaqê bi kaxez ve hatibû zeliqandin nihêrî, ew hê sax bû û dilivîya.



Min bi perên wê girt û sincaq jê derxist, perên xwe li hev xistin û xwest bifire, lê perê din hê sincaqkirî bû. Di encamê de perê wê jê bû û ket xwarê û lerizî, min perê wê rakir û xwest bi ava devê xwe cardin bi laşê pelpelûkê ve bizeliqînim, da ku beriya hatina berpîrsê sêwîxaneyê pelpelûkê bifirînim û rizgar bikim. Lê min kir nekir perê wê çênebû!

Piştî demeke pir kurt berpîrs, ji deriyê pişt ve hat beramberî min û dest bi hawarkirina li ser serê min kir, çiqas min got:

Min karek nekiriye, ji min bawer nekir. Kaxezê mezin rakir û bi tundî li serê min xist. Parçeyên laşê pelpelûkan li her derê belav bûn, wî kaxez avêt xwarê û destûr da ku helgirim û bavêjim nav zibildana pişt sêwîxaneyê û çû.

Li wê derê, li bin wê dara mezin û pîr, li erdê rûniştim û heta demekê bi laşê wan ên rengîn ve mijûl bûm, da ku bikaribim parçeyên laşên wan rêk bixim, lê ew karekî pir zehmet bû... Min ji bo wan dua kir, piştî tev avêtin nava qutiyeke betal a pêlavan û li binî wê darê çal kirin. Her sal dema pelpelûk vedigerin sêwîxaneyê û li dora gulan difirin, hewl didim wan dîr bixim. Ji ber ku ew nizanin, sêwîxane cihekî xirab ji bo jiyane û cihekî xirabtir ji bo mirinê bû...

Mirina dayikê

Elî DEŞTÎ

(Wergera ji farisî: Cewad PALE)

Naskiriyeke jinikê ku rewşa wê baş zanibû bi şaşwazî îtiraz kir û got, vê jî nika reben ji nêza xwe kuşt. S bersiv da û got: Ji bo em şerefa malbata xwe biparêzin em mecbûr man ku vî tiştî bibêjin. Erê ev e adeta mirovahiyê.

Ey heywanên dupê, ey afirîndeyên tiral, ji ber ku zimanê we heye, hûn xwe ji hemû afirîndeyan mezintir dibînin, ger zimanên gurên ku li zinaran dijîn hebûya, wê ji we re bigotina ku di dinyayê de hûn afirîndeyên herî bêar in û deftera jiyana we ji ber lekeyên sûc û gunehan tarî bûye.

Heyf e! Ger Mihemmed û Îsa ji mar û pilingan re hatibûna şandin peyamên wan ên pîroz wê encameke baştir bidana. Ji xeynî xweecibandinê, xwehezkirinê û ji xeynî sûcên şermî di civata we de çi heye?

Eger ev peyvên bêwate û ev hevokên pûç û derew ku hûn wan wek delîlê şerefa xwe nişan didin, ji ser rûyê dinyayê rabe rastiya we wê ji dîmena marmarokên bijehr û ji dîmena heywanên goştخور tarîtir û xerabtir bibe.

Li tu dereke dinyayê, di kûrahiya tu deryayê de jîndareke/î ku ji birçînan bimirê tune ye. Lê di civata we ya tarî û fesad de, li hember çavên we yên bêhis û biqeswet, di hembêza jiyana we ya bimirê de bi hezaran kesên bextreş di nav êşkenceya birçîtiyê de bi hesreta gezek nan, bi devên şewat qedeha mirinê vedixwin.

Ji bo dîtina van felaket û bêbextiyan ne hewce ye em herin Amerîka û Afrîkayê. Di vê Tehrana aram û kêfxweş de, di van rojên em dijîn de, faciayên wiha pir zehf in.

Niyeta min tune ye ku ji we re romaneke an jî çîrokeke binivîsim. Na, ev bûyer duh li Tehranê li ber çavên her kesî/ê pek hat. Lê xweecibandina wan kesên ku sedema vî tiştî ne, perdeyek kişand ser rûyê vê bûyerê û nehişt ku kesên din vê bûyerê bibînin. Bi tesadûfî hevalekî min ji vê bûyerê xebardar bû û ez mecbûr kirim ku bi

hezaran hêstirên bextreşiyê ku her kêliyê ji çavên mirovatîyê ber bi sifreya axa bi xwîn diherike, nişanî we bidim.

Ey jinên ku li mafê xwe digerin û dixwazin di nav civakê de ji xwe re cî bibînin. Niha guh bidin çîroka xwişkeke xwe ya bextreş, guh bidin, bizanin çawa zilamekî egoîst, bêhis û bêînsaf piştî ku ciwanî û dewlemendiya jinekê jê distîne û barê çend zaroyan jî diavêje ser milên wê û jina reben datîne ber lepên sermayaya mirineke bêmerhemet.

Hûn dayikno; ji bo vê pîreka ku ji ber bêteleqedariya we, ji ber hêrsa we ya ji bo dewlemendiye û ji ber egoîstiya we çû ser dilovaniya xwe, hêstiran birijînin, herin hêstiran birijînin ser gora wê.

Ev bûyer di şeveke serma ya meha berfanbarê de pêk hat. Ber bi dawîya kolana Çerax Berqê, berî ku bigihîje çaryana Emîn Hizurê kolanek heye. Xaniyekî Siphehsalaran jî li wir heye. Heta beriya çend rojan jinikek û çend zaroyên wê di vî xaniyî de dijîyan.

Berê li vî xaniyî çiqas firaq hebûn, çiqas firaq ji wan re hewce bûn nizamim. Lê di şeveke tarî û serma de ku jineke reben bi kul û derdan hatibû dorpêçkirin di vî xaniyî de bê firaq mabû. Di odayên vî xaniyî de ji tariya şevê û ji bayê zivistana sar pê ve tu tişt tune bû. Heta di metbexê de dû, xwelî û agir jî nebû. Xanî hemû bi tarîtiya şevê hatibû vegirtin. Tenê odayek bi çirayeke ku ronîyeke qels dide ronî dibû. Nivê wê odayê ku mirovên wê malê lê rûdiniştin bi merşeke kevn hatibû raxistin û li odayê kursiyekî biçûk jî hebû. Li rexekî kursî, çend zarok di xew re çûne, li rexê din ê kursî jinek runiştî bû. Bihesret

û biêş li rûyê zarokên xwe yên bêguneh dinihêrî. Piştî wekî ku nikare xwe bigire rabû û rûyê zarokên xwe yek bi yek maç kir. Ji dil keserek kişand. Rûyê xwe ku wekî agir dişewitî danî ber porên zarokên xwe. Piştî ji odeyê derket, li ezman û stêrkan nihêrî û vegehrî. Di odeyê de geriya zarokên xwe careke din maç kirin û derket derve. Li baxçe li koşeyekî tarî sekinî. Wê



gavê çokên wê dilerizîn û kûr kûr fikirî. Di navbera qelsbûna nefsa wê û gumana wê de têkoşînekê dest pê kir, tiştin got û dîsa vegehrîya odeyê.

Wê şevê ev çûn û hatin çend caran dubare bû, nizanîm. Lê pîra ku li rexê din ê kursî radîza bi wan dangan şiyar bû. Bi tirs û fikar ji xanima xwe pirsî ku çî bû ye jê. Xanima ciwan ku nedikarî êş û hêrsa xwe veşêre, bersiv da: Tişteke tune ye! Tenê ditirsîm ku zarokan careke din nebînim.

Çima?

- Edî taqeta min ji bo jiyane nemaye. Tu zanî ku berê çiqas kamran bûm. Tu zanî heştê tûmenê ku birêz S her meh ji neviyên xwe re dişand ev sê sal in nayê. Di nav van sê salan de bi firotina firaqên malê, bi firotina cil û micewherên xwe min ev zarok anîn vî emrî. Êdî ji vî kirasê qeti-yayî yê li ser min pê ve tişteki ku ez bifiroşim nemaye. Li mal jî tişteki hejayî firotinê nemaye. Ji bo ji neviyên wî tiştina bixwazim, iro ez çûme mala birêz S lê ji kufri û heqaretan pê ve tişteke neket destê min. Di dawiyê de tiştî ku karibim bifiro-

şim ev pêlawa nû bû. Min ew jî duh firot û min ev pêlawa kevn kirî. Bi pereyên ku ji ber man jî min ji bo şivê û ji bo taştêya sibê tiştin kirin. Sibê piştî ku zarok taştêya xwe bixwin, ez nikarim wan tîr bikim û ez nikarim zarokên xwe birçî bibînim. Lê eger ez bimirim belkî bapîrê wan fedî bike û ji bo rûmeta xwe biparêze li neviyên xwe binihêre. Ji bo ku dil û canê min

bijî, ez pê qayil im ku xwe bikujim ji ber ku Xweda zane ku ez nikarim birçibûna lawên xwe bibînim, ez nikarim nalî-nên wan ên ji nêza his bikim.

Pîreka pîr bi newêrekî û wekî dayikeke ku şîret bide got: Tişteki wisa xerab nefikirî. Tu hê ciwan î, dayîka sê lawan î û mîrekî te yê ciwan û dewle-mend heye. Malbateke wek malbata S jî li pişt te ye.

Pîreka ciwan bi dilşewatî kenîya. Ji bo jiyana min û lawên min tu feydeya van tiştan tune ye. Ev çend sal in ku

mêrê min li pey kêfa xwe ye. Wexta ku tî Tehranê jî hatin û çûyina wî ya vir dibe yek. Qet li zarokên xwe nafikire. Tu zanî ku bi firotina firaqên malê, bi firotina micewherên xwe û bi firotina tiştên ku ji bavê min mabûn min ev zarok anîn vî emrî. Birayê min jî ji vî rewşa min a xerab bêxeber e. Ji dêvla ku jiyana xwe, ya zarokên xwe li ser milên birayê xwe bikim bar ez bimirim baştir e. Pereyên ku ji bapîrê zarokan dihat jî, ev sê sal in nayê. Bapîrê zarokan duh çawa kufri min kir. Tu cihê ku ez xwe biparêzim nemaye. Tu çareya min nemaye.

Jina pîr: Dîsa jî Xwedê mezin e. Wekî din xwekustîn yek ji gunehên herî mezin e. Jina ciwan fêhm kir ne hewce ye bi vî pîrê re biaxive, her çiqas biaxive jî pîrê wê tiştên olî bibêjê. Ji ber vî yekê jî pîrê re tişteke negot. Rabû çû ser cihê xwe û raza. Pîrê jî got qey tiştên ku min gotin li ser wê tîsîr kirin û pîreka ciwan dev ji wan fikran berda. Pîrê jî xwe bawer, çû ser cihê xwe û ew jî raza.

Lê çî heyf! Saetek şûnde wexta ku her

kes di xew de bû, lempeya odeyê hemma vekirî bû, dayik hêdika ji cihê xwe rabû, maçên xatirxwestinê li eniyên zarokên xwe da û ji odeyê derket. Çû rexê tarî yê baxçe. Li wir destê xwe ber bi ezman ve rakir û got: Ey Xwedayê ku dibêjin adil e û bi merhamet e, tu yê min efû bikî, tu zanî qeweta min ji bo jiyanê nemaye, ez êdî hew karim bijim. Te em afirandin û em evdalên te yên xwedî nefis û namusê ji bo gezek nan, li hember wan kesên ku dîsa te afirandin, ew ên ku xwedî hêrs û şehwet in, tu nehêle ku em nefis û namûsa xwe li hember wan xera bikin. Edalet û merhameta te ew qas zehf e ku tu yê daxwaza vê jina kambax û reben qebûl bikî. Ji vê qulûbeyê biçûk a fesad ku te afirandiye dir-evim ber bi aramiya te tîm. Ey Xweda: Tu dayik ji zarokên xwe yên biçûk û bêguneh durketî, nikare bijî. Lê şewata janên min, dilê min şewitand kir xwelî, şapeya janên min bi ser min û hemû hisên min de çûn. Hemû viyanên dilê min mirin, dinya ji bo min cihek tarî û bê jîn e. Dinya ji bo wan kesên ku kezebên xwe ji êşkenceya birçîbûnê parastine xweş e. Lê tu heviyên min ji jiyanê nemane. Hemû rê li ber min hatine girtin. Êdî li vê dinyayê tu hêviyên min nemane. Ey Ew ê ku dinya afirandiye ber bi te tîm. Min red neke. Çimkî ji ba te pê ve, tu cihê ku ez herimê tune ye. Li pişt min dinyayeke tarî, bêmerhemet, zehmet û zor pê ve tu tişt tune ye. Ey Xwedayê mezin vê jina neçar ku ji milkê te, tenê xwedî tariyeke biçûk e û tenê xwedî der-yayeke serma ye, qebûl bike aramiya xwe.

Piştî vê nalîna kurt, hêstirên xwe yên germ paqij kir, mantoyê li ser xwe ji milê xwe avêt, şekalên xwe ji piyê xwe derxist û bi gavên hişk di deriyekî biçûk re ket hundir û kêliyêk şûnde dengê ava ku li tiştêkî giran bikeve hat û careke din bêdengiyê dest pê kir. Piştî çirpîneke ku du saetan dom kir û piştî ku dengê pêldana avê ya di bîrê de bêdengiya mirinê dest pê kir. Ava cemidî ya di tariya bîrê de pêlên ku ji lîrîna dest û piyên wê çêbûbûn ew kurpandî û avê jinik hembêz kir. Beriya çendekî dengê dilê wê jinikê dihat, çavên wê şil bûn û levên wê ji bo zarokên xwe maç

bike dilerizîn.

Rebenî xilas bû. Ji çavên jiyanê ber bi dawiya tarîtiya deryayekê dilopek hêstir nîqutî. Stêrkan wekî her carê li vî tiştî lome dikirin û ev bûyer a bi keser temaşe dikirin. Ezmanê bi nexşê bi heybet qet nedilebitî û siya xwe dabû ser erda biguneh. Roj ronî dibû, asoya Çiyayê Elbrûzê ya bi berf, wekî eniya keçikeke bêmîrad ku ji nav kafen xuya dikir bû.

Bû sibeh, rojê deşta Tehranê ronî kir. Zarok ji xewê şiyar bûn û li dayika xwe geryan lê ev ger beyhûde bû. Êdî rûyê diya xwe yê bieşq û dilovan tenê di xewê de karibûn bibînin.

Xizmetkara malê bi tirs li wan deran digeriya. Beyhûde li odeyan digeriya. Bi carekê re li koşeyê baxçe, çav li manto û şekalên xanima xwe ket. Çokên wê lerizîn û ber bi wir ve çû. Bi zingezingê her derê laşê wê dilerizî berê xwe da bîrê, bi awirên şaş çav li ava bilind a nav bîrê gerand. Lê di tariyê de tiştêkî xuya nedikir... Çima? Li rexê ronî yê avê baqek por bi avê re dileyist û piştî eniyeke rengê wê pir spî ku hê şopa kul û êşên wê jê neçûye, cotek çavên werimî, werimî lê heta mirinê girtî û lîvên reş û şîn xuya dikirin.

Ew keça paşayan bû û di xweşî û fîrehiyê de mezin bûbû... Gîlanî bû navê wî zîlamê ku dibin hîmayeya bîrêz S de hemû pereyên ku ji bavê wê mabûn xwaribû û ev pîreka ku bi zarokên xwe û bi xizmetkareke xwe re di odeyeke kevn û xerabe de, bi şerefa xwe dijî, di dawiyê de xwe kuşt.

Tiştê herî dilşewat jî ev bû ku çend roj piştî mirina wê jinikê, xizmetkarên bîrêz S gotibûn ku jina neçar dîn bûbû. Duh qutiyên wê yên micewher û firaqan me mor kir û girtin.

Naskiriyeke jinikê ku rewşa wê baş zanibû bi şaşwazî îtiraz kir û got: Vê jinika reben ji nêza xwe kuşt. Çîroka qutiyên micewheran ji ku derket? S bersiv da û got: Ji bo em şerefa malbata xwe biparêzin em mecbûr man ku vî tiştî bibêjin.

Erê ev e adeta mirovahiyê.

Şerbeta ji êgir

Berken BEREH

I.
li bêndera emrekî li botanê
ji berfê pê ve
çi dikeve para me?
ew şerbeta ji êgir

II.
ji rengê baranê ye heyat
nehêniyan vedirêse
hêviyê dimeyîne
her fecar

III.
dayikên botî;
ew kubar esmerên
dişibin azadiyê
û zarokên wan ên
ji pişta kêrê

IV.
gewrxewnek e heyat
rengîn û bi lez e li vir
das û dar û bivir
ez im pêxwarina xwe

V
li vir
wek pêşmergeyekê ye heyat
bi her têkçûnê
ji nû ve hiltê

Li şiveriyên çiyayekî...

Arjen ARÎ

li hezê digirim, bi dilekî mişthez
nebînim, bi ser ve nebim jî ez
ez ê jî dû venegerim...

li hezê digirim, hezeke wisa:
safî, sebil...ne miqabilî tişteki...
û henûn henûn, mîna ya mindalekî:
dibînim heza berxikê li dû makê ...
dinêrim li çivîkê hêlîn li ber helakê!

ez ê bi ser ve bim, nizamim...
ya ku zanim; hez nebe, heyat gûzeke pûç e.
hez nebe; jiyan goka li ber devê qalûç e:
aware aware, derbeder
li ser kevîrê xwelîser jî qalûç re qûç e!

li hezê digirim
di dilê welatekî de li vî diyarî
min jî welatekî hez kir, hinekî jî vî bajarî
û paşê dîsa jî welatekî: Mîna nanekî çarparî!...

-taviî welatekî ku ev çend min jê hez kir; jî êşa pir, giriye
pir, mirinên pir...hezê li şuntaziyekê ew terk kir û wê jî hez
bi gorî xwe kir bi yek carî-!

li hezê digirim, niha

dizanim; dengê xwezayê ye hez:

herikîna avê, guvîna bê, xûşîna spîndarê...
min xezalek wenda kir li vê beriyê
dildarên xakê nebedî bûn
di şiveriyên çiyayekî de vê berêvarê!

19/04/09

Du helbest

Çiya Mazî

NA

Nayek min heye
ji te vedişêrim
Sozek min heye
ji her kesî vedişêrim
Hezkirinek min heye
Ditirsim
Ji xwe jî vedişêrim
Payîz 2008

ZOZANO

Bila ez tenê bim di gora xwe de
Li geliyên te ey zozan
Şîp û lehiyên te
Di ser min re derbas bin bê navber
Û bi hespên xwe mirovên te
Bila mişk û mar mêvanê min bin
Her tim
Û bi min vedin dûvpişkên te
Talan bikin bedena min
Lê di dextlê te de me zozano
Di tu deman de
Bila silavan li min nekin derewîn
7. 2008

Mirêk

Sylvia PLATH

(Wergera ji inglîzî: Lenya Dila)

Ez ji zîv im, bêqisûr im, tune ne pêşdarazên min
Her hûn çi dibînin zûzûka dadîqurtînim
Weke xwe, ne bi hezê ne bi nefretê dipêçim.
Ne xedar im, tenê ji dil û can im
Çavê Xwedayekî biçûk im, çargoşe me
Pîrî caran diponijim li ser dîwarê hemberî xwe
Dîwar helesor û deqdeqok e, ev demeke dirêj e lê dinêrim
Ez dibêjim qey ew pariyek ji dilê min e. Lê ew dilerize .
Rûyên mirovan û tarîti car li ser carê me ji hev diqetînin

A niha ez golek im . Jinek xwe xwar dike li ser min,
Bi dû menzîlên min dikeve ji bo ku bibîne ka ew bi rastî kê ye.
Dawiyê li wan derewkeran vedigere, vedigere mûmikan û heyvê
Ez piştê wê dibînim, şewqa wê didim bi dil û can.
Min xelat dike bi hêsi û destên lerizî.
Ez ji bo wê pir biqîmet im. Ew tê û diçe
Her sibeh rûyê wê dikeve şûna tariya şevê.
Keçeke ciwan xeniqand di hundirê min de û di hundirê min de jineke pîr
Weke masiyekî berbat roj bi roj hiltê di aliye wê de



Ahmet